



**ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

TEZA **CIWANKARÎ DI PEND Û GOTINÊN PÊŞÎYAN DE**
LÎNSANSA **BI MÎNAKÊN 'PENDÎ PÊŞÎNAN' A ŞÊX MIHEMEDÊ**
BILIND **XAL**

OMED HUSSEIN ALI ALI

ŞAXA MAKEZANISTA
ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

RÊBANDAN – 2017

K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZÎMAN û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind



**CIWANKARÎ DI PEND Û GOTINÊN PÊŞÎYAN DE BI
MÎNAKÊN “PENDÎ PÊŞÎNAN” A ŞÊX MIHEMEDÊ XAL**

Omed Hussein Ali ALI

14950001071

Şewirmend

Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ

WAN– 2017

T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi



**'KÜRTÇE ATASÖZLERİ VE ÖZDEYİŞLERDE BEDİİ' ŞEYH
MUHAMMED HAL'IN "PEND- İ PEŞİNAN" ADLI ESERİNDEN
ÖRNEKLENDİRMELERLE**

Omed Hussein Ali ALI

14950001071

Danışman

Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ

VAN – 2017

ETİK BEYAN SAYFASI

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada “*Ciwankarî di Pend û Gotinên Pêşîyan de bi mînakên ‘Pendî Pêşînan’*”

Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi.

Tüm bilgi belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun olarak sunduğumumu.

Tez çalışmada yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi.

Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı.

Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak hayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

Naverok	Rupel
KURTE.....	viii
ÖZET	ix
ABSTRACT.....	x
PÊŞGOTIN	xi
KUTEBÊJE.....	xv
KURTE JÎYANA ŞÊX MIHEMEDÊ XAL (1904 - 1989).....	xvi
DESTPÊK	1
1.Pênaseya Pend û Gotinên Pêşîyan* :.....	1
2.Di derbarê pirtûka “Pendî Pêşînan” ê Xal de:	3
3.Zanîsta Ciwankarî:	14
3.1.Ciwankarî di aliyê Ziman de:.....	14
3.2.Ciwankarî di aliyê zarevayî de:.....	15
Beşên Ciwankarî.....	16
3.3.Ciwankariya Peyvî:.....	16
3.4.Ciwankariya Wateyî:	16
BEŞA YEKEM.....	17
1.HUNERA CIWANKARÎYA PEYVAN.....	17
1.1. Hevbêjî “Cînas” :	17
1.2. Serwadar “Secî” :	25
1.3. Patkirin:.....	34
1.4. Zivirandin “Gêranewe” :	38
1.5. Anîn “Tesdîr” :	46
1.6. Jê girtin “îqtîbas” :	50
1.7. Îktîfa:.....	52
1.8. Hebûna Pêwîstîyê, “Pêwîstbûn bi Pêwîst” :	53
1.9. Paşxistin:.....	55
1.10. Îzdiwac:.....	56
1.11. Pêkve guncan “Li hev hatin” :.....	57
1.12. Paşserwa “redîf” :.....	58
1.13. Hevbirî “Hevbîrî” :.....	59

BEŞA DUYEM.....	62
2.HUNERA CIWANKARÎYA WATEYAN:.....	62
2.1- Dijyek “Tîbaq” :.....	62
2.2. Beramberî:.....	68
2.3. Pêçe û pexşe “Lef û neşir” :.....	70
2.4.Çavliyek“Mura'atînezîr” :.....	71
2.5. Ciwanîya Hokar – sedem “Ciwanî bayis” :.....	72
2.6. Tilnîşan “Telmîh” :.....	73
2.7. Cihguherkê, “cihguherîn” :.....	77
2.8. Arasteyî- “Tewcihe”.....	80
2.9. Pirwateyîtî “fireh wateyî” :.....	81
2.10. Xwe lomekirin.....	82
2.11. Wesifkirin- Pesnkirin “Medih” :.....	82
2.12. Lomekirin “zemkirin” :.....	83
2.13. Lome Di berga Pesn de:.....	84
2.14. Ekîtkirina “Misoger” a lome wekû wesf “Ekîtkirina zemî li pesn ê de”.....	84
2.15. Rû vegeran- Têlnîga “Îltîfat” :.....	85
2.16. Rû li ew kirin:.....	86
2.17. Deranîn:.....	86
2.18. Komkirin:.....	87
2.19. Ji Hevdukirin “Tefrîq” :.....	88
2.20. Çotbûn “Mizawîce” :.....	89
2.21. Pasaw anîn “hêcet- bihane anîn” :.....	90
2.22. Zêderewî “Mubalexe” :.....	90
2.23. Kom pend:.....	91
2.24. Hevahengîya ciwan:.....	92
2.25. Zivirandina Got û bêj:.....	94
2.26. Pêkve Guncawbûna Peyv û Wate:.....	94
2.27. Ravekirin, “tefsîr” :.....	95
2.28. Bedîkirin, çaverêkirin “Îrsad” :.....	96
2.29. Şêwazî Danayî “Îslubî hekîm” :.....	97
2.30. Dahênan “Îbdai” :.....	98

ENCAM.....	100
ÇAVKANÎ.....	102



KURTE

Navnîşana me “*Ciwankarî di Pend û Gotinên Pêşîyan de bi mînakên “Pendî Pêşînan”*” a Şêx Mihemedê Hal. Hewildanek û nasandineke jibo derxistina beşek giring û serekî ya hunera rawanbêjî yê ye. Di pend û gotinên pêşîyan a kurdî de. Ev lêkolîne kar li ser beşên ciwankarîya di nava zanîsta rawanbêjî yê dike. Di navde wan hunerên cûr bi cûr yên ciwankarîyê nîşan dide ku ji mînakên “Pendî Pêşînan” de reng vedaye. Ev lêkolîne pêkhatîye ji: Kurte jîyana Xal û destpêk û du beş, digel encam û listeya çavkanîya. Di destpêkê de qala kurte jîyan û berhemên girîng yê zanayê kurd Şêx Mihemedê Xal hatîye qal kirin, ku di destpêka wê jî sê mijaran di nav xwe de digire. Mijara yekem di çend alîyan de qala pênaseya pendên pêşîyan dike. Di mijara duyem de jî qala kurteyek ya vê hewildanê û berhemên hatîye kirin. Di derbarê komkirina vê jenerê daye, ku pêş komkirina pirtûka Xal, çî ji alîyê folklornasên kurd be çî jî ji alîyên kurdnasên biyanî be hatîye komkirin. Piştî bi nirxandinekî bilez babetên vê pirtûkê vekirîye û sud û girîngîya vê di wêjeya folklorî de daye destnîşankirin. Li gel vê jî amaje bi kêmasîyên vê pirtûkê jî hatîye kirin. Di mijara dawî de di alîyê zimanî û zaraveyî de qala pênaseyên hunera ciwankarîyê hatîye kirin. Wekî beşekî serekî ya rawanbêjîyê ye. Piştî jî qala pênaseyên her du cûrên ciwankarîya peyvî û ciwankarîya wateyî hatîye kirin. Di beşê yekem de: Hunera ciwankarîya peyvî digire dest tê de li gorî hebuna mînakên “Pendê pêşîyan” yê Xal “13” cûrên serekî serbixwe jê der anîye. Hunera vêbeşê jî kar li ser ciwankirina ru û sîmaya peyv û pekhatîyên ji derveyî pend û gotinan dike. Beşa duyem jî taybete bi ciwankarîya wateyî. Bi hebuna mînakan re qala “30” cûrên serekî hatîye kirin. Ev jî peywendî bi wateya peyv û hevok û kurte hevokên yên pend û gotinan ve heye. Di rêya komek hunerên cûr bi cûrên serbixwe erkên ciwankarîya watayî dibînin. Di dawîya de jî encama tezê di çend xalan de hatîye dîyarkirin. Piştî listeya çavkanîya hatîye nivîsandin ev jî ji bo tezê sud jê wergirtîye. Peyvên serekî: Rawanbêjî, Ciwankarî, Pendî Pêşînan, Şêx Mihemedê Xal.

ÖZET

Şeyh Muhammedi Hal'ın Atasözleri ve Öğütleri Örnekleriyle Kürt Atasözleri ve Öğütlerinde Estetizm adlı bu çalışmamız retorik sanatında kürt atasözlerinin tanıtımı ve meydana çıkması için önemli ve başlı başına bir uğraştır. Bu araştırmamızda da olduğu gibi böyle çalışmalar retorik biliminde estetizm bölümü üstüne yapılan araştırmalardır, içeriğinde estetizm sanatının Atasözleri Kitabı'ndan örneklerinin yer aldığı estetiğin türlü türlü bölümlerini barındırmaktadır. Bu çalışmamız Şeyh Muhammedi'nin hayatının bir özeti, giriş, sonuç, kaynakçalar olmak üzere iki bölümden oluşmaktadır. Çalışmamızın başında Kürt bilgini Şeyh Muhammedi Xal'ın hayatı ile önemli eserleri hakkında bilgiler verilmiştir, giriş bölümü de üç başlık altında toplanmaktadır. 1- Birkaç Yönüyle Öğüt ve Atasözlerinin Tanımı.2- Burada Muhammedi'nin kitabından önce kürt folkloristleri veya yabancı kürt bilimciler tarafından yapılmış ve toparlanmış öğüt ile atasözleri eserlerinin geçmişi hakkında kısa bilgiler verilmektedir. Ayrıca Muhammedi'nin kitabının değerlendirilmesi ile kürt folkloru için yararları ve önemi hakkında bilgiler verilip bazı eksikliklerine gönderme yapılmıştır.3- Son konuda da dil bilimsel ile terimsel olarak retorik sanatının ana dallarından biri olan estetizmin tanımları yer almaktadır. Sonra da estetizmin türlerinden Sözcüksel Estetizm ile Anlamsal Estetizm'in tanımları hakkında bilgiler yer almaktadır. Birinci Bölüm; Sözcüksel Estetizm Sanatını içermektedir ve Muhammedi'nin atasözleri örneklerinden oluşan "13" ana başlık hakkında bilgiler yer almaktadır. Burdaki sanatlar öğüt ve atasözleri sözcüklerinin biçim, yüzeysel anlam, öğeler ve dışsallığı üzerine yoğunlaşmaktadırlar. İkinci Bölüm; Anlamsal Estetizm Sanatını içermektedir, örnekler ile beraber "30" ana başlık hakkında bilgiler yer almaktadır. Bunların da öğüt ve atasözleri metinlerindeki sözcük ile sözcük gruplarının anlamları ile ilişkileri bulunmaktadır ki türlü türlü ana retorik sanatı ile anlamların estetiklerinde rol almaktadırlar. En sonda da araştırmamızın sonucunu birkaç şıkta belirtip çalışmamızda yararlandığımız kaynakça listesini eklemiştir bulunuyoruz. Anahtar kelimeler: Belağat, Estetizm-Bedii, Atasözleri,Şeyh Muhammed Hal.

ABSTRACT

Choosing this title, “Enhancement in Adage and Proverb in Kurdish language with examples of Sheikh Mohammed Khal's proverbs.” is an attempt to introduce and expose one of the major and important aspects of Rhetoric in Kurdish idioms. This thesis, by working on the aesthetics aspects of Rhetoric in Shekh Muhammadi Khal’s “Kurdish proverbs, ” shows the aesthetic examples in author’s book. The thesis consists of the following parts: Author’s life, a preface, two chapters, results, and work citations. In the first part, the author’s life and his writing are shown.

The preface contains three parts: In the first part, I introduce those definitions that have been given to the Kurdish idioms. In the second part, I give a brief history of those attempts that has been done on this genre before Khal’s book, “The Kurdish proverbs, ” by both the Kurdish folklorists and orientalist. In the third part, I give a quick evaluation of this book, explaining the importance of this book in the Kurdish folklore art. And also, I have touched those weak points in the book that have been talked about. In the last part, Aesthetics has been defined linguistically.

The first content chapter discusses all the aesthetic aspects of words that can be found in Khal’s book, which includes 13 aspects. The aspects are based on working on the aesthetic part of the appearance of the words. The second content chapter discusses the aesthetic aspects of meaning. According to the examples, there are 30 of them.

Finally, the thesis concludes with a summary of points. Then, the work citations are listed.

Key words: Rhetoric, Enhancement, Proverb, Sheikh Mohammed Khal.

PÊŞGOTIN

Yek ji janrên zindîya folklorîye di heman demê de ji bo demê pêwîstî û bi hêzkirina gotin û axaftinan beşdarî dike, pend û gotinên pêşîyane. Sedemekî serekî zindîti û bi hêze û bandorbuna pend û gotinan di zivire ji bo hebuna berjengê taybetîya zimanî a vê janerê. Wisankirîye ku şêwzekî taybet hebin û cûdabin ji axaftinên hêsanî. Xasyeta vê Janerê jî di kurt û pir wateyîyê de derdikeve holê. Ev ji ezmûna jîyana rojane hatîye girtin. Xala serekî û bi hêza cîyawazîya vê janerê li gel gotinên hêsanî ji bo hebûna şêwazê rawanbêjî di zivire. Di nav de hunera rawanbêjî bi her sê beşên xwe ve: “Rûnbêjî, Ciwankarî, Watanasî” xasyetekî taybet bi naveroka wan di bexşîne. Dema bi şêweyekî beşdarîyê tê de dikin ku hiç mînakê nîne di pend û gotinan de hunerekî di nav de nebe.

Ciwankarî jî yek ji beşên herî berfireh yê rawanbêjîyê ye. Erekekî mezin digire ji bo dayîna şêwazekî rawanbêjî ji bo ciwankirin û xemilandina vê janerê. Ev lêkolîne nêzîkirina du bebetên cuda yê wêjeyîne. Ya yekem pend û gotinên pêşîyane. Ev jî diçe xaneyê folklorî. Ya duyem jî “ciwankarî” ye ev jî beşekî zanîsta rawanbêjîyê. Diçe xaneyê rexneyê wêjeyî. Ji bo ya yekem janera serekî ya folklore, mînak jî me ji “Pendê pêşîyan” ê Xal girtîye. Me bi vê pirtûkê û mînakên wê hunera ciwankarî yê daye destnîşankirin. Ya duwem jî hunera ciwankarî ye ku ev jî di du alîyan de erkê ciwankarîyê dibîne. Ev her du alî jî “Ciwankarîya peyvan û ciwankarîya wateya” wane. Hunera ciwankarîya peyvan jî peywendî bi alîyê ji derveyî mijar û pend û gotinan ve heye. Kar li ser ciwankirina sîma û rûxsara gotina wan dike. Ku hevşêweyî, serwadarî, awaz, muzîk, wezinparêzî û gelek hunerên cûr bi cûr yê din. Hunera ciwankarîya wateyî jî peywendî bi alîyê navîn ango “Naveroka” mijara pend û goitinan ve heye. Ev jî bi sedema komek huner re kar li ser ciwankirina wateya tekst de dike.

Sedemê hîlbijartina vê babetê jî wekî navnîşanekî ji bo tezê di zivire ku ji bo heger çî be jî ev janera folklorî hemu tejiye ji hunera rawanbêjî bi taybet hunerên ciwankarîyê. Lê belê heya niha tezekî taybet bi vî awayî li ser vê

babetê ne hatîye amadekirin. Têde bi dirêjî qala hunera ciwankarî kirî be. Armanca me a nivîsîna vê tezê ewe ku ji bo xizmetkirina wêje û folklorê kurdîye bi taybet jî giringî dayîna rawanbêjî û pend û gotinên pêşîyane. Sinorê teza me jî hunera ciwankarîya “peyv û wate” û li gel mînakên pirtûka “Pendî Pêşînan” ê Xal digire nava xwe. Ew rêbaza ku me di nivîsîna tezê de bikaranîye rêbaza “Wesfî û şîrovekirin” ye. Di destpêkê de me pênaseya teorîya hunerê kirîye û piştî jî me bi mînakên pendan qala pîraktîkîya wê jî kirîye. Ji bo her cihekî pêwîst be me mînak şîrove kirîye.

Pêkhatiya tezê jî pêktê ji kurteyek jîyana Xal di gele destpêk û du beş û encam û listeya çavkanîyan: Kurteya di derbarê jîyana Xal kirîye. Têde bi kurtî qala binemala Xal û ji dayîkbûna wî, xwendina wî û ji alîyê hukmetê ve damezirandina wî ya fermanberîyê. Di nav de amaje kirîye li ser sê berhemên bi nav û deng ê Xal.

Ev destpêk jî ji sê mijaran pêkhatîye:

Mijara Yekem: Qala çend pênaseyên cûr bi cûr yê pend û goitinên pêşîyan kirîye.

Mijara Duyem: Nirxandin û çend nerînekî kurtde di derbarê “Pendî Pêşînan” yê Xal de. Di destpêkê de kurteyek ji wê hewldana dîrokî yan jî amaje bi wan hewildanê dîrokî ku ji bo komkirina pendên pêşîyan ê kurdî ji derveyî başûrê Kurdistanê kirîye. Piştî jî amaje bi wan hewildanên dîrokî jî, ku di nava başûrê Kurdistanê de pêşîya berhema Xal kirîye. Piştî jî qala pirtûka “Pendî Pêşînan” ya Xal jî kirîye û nirxandinekî bilez ya vê berhemê jî kirîye û giringîya vê berhem di wêjeya folklorî de nîşan daye. Piştî jî ew a ku me bi xeltî zanîye me nivîsîye.

Mijara Sêyem: Di vir de jî qala pênaseyên zanîsta ciwankarî di alîyê ziman û zarava de hatîye kirin. Piştî jî pênaseya her du cûran; “Ciwankarîya peyv û Ciwankarîya wateyî” kirîye.

Beşa Yekem: Ciwankarîya peyv an digire nava xwe. Têde hunera ciwankarîyê bi mînakên “Pendî Pêşinan” derxistîye ku “13” cûrên serekîn destxistine. Beşek ji van huneran çend cûrek din jî jê bûye, evin: “Hevbêjî- Cînas”, “Serwadar- Secî” Ev jî çar cûrên serekî û serbixwe jê ve dibe: Serwadarîya: “Hevrû- Mtewazî, Hevwezî- Mtewazî, Hevser- Mutrîf, Tersî”, “Patkrin”, “Zivirandin”, “Anîn- Tesdîr”, “Jê girtin- îqtûbas”, îktîfa, “Bûna Pêwîst- Pêwîstbûn bi pêwîst”, “Piştixistin”, “îzdîwac”, “Pêkve guncan”, “Paş serwa- Redîf”, “Hevberî, Mwarede” .

Beşa Duyem: Ciwankarîya wateyî di nava xwe digire. Di vê beşê de jî hunera ciwankarîya wateyî bi derxistina mînak re ku jimara wan “30” cûrên cûr bi cûrin. Ew jî evin: “Dijyek- Tîbaq”, “Beramberî- Muqabele”, “Pêçe û pexşe- Lef û neşir”, “Çavliyek- Mura'atînezîr”, “Ciwaniya Hukar- sedem, Ciwanî bayis”, “Tilnîşan - Telmîh”, “Cihguherkê- cihguherîn”, “Arasteyî- Tewcihe”, “Pirwateyî- fireh wateyî”, “Xwe lomekirin”, “Wesifkirin- Stayîşkirin- Medih”, “Lomekirin- zemkirin”, “Lome Di berga Stayîşî de”, “Ekîtkirina lome wekî wesf - destnîşankirina zemî li stayîşê de”, “Rû vegehan- Têlnîga”, “Rû li ew kirin”, “Deranîn”, “Komkirin”, “Ji Hevdukirin- Tefrîq”, “Çotbûn - Mizawîce”, “Pasaw anîn - hêcet- bihane anîn”, “Zêderewî- Mubalexe”, “Kom pend”, “Hevahengîya ciwan”, “Zivirandina - Got û bêj”, “Pêkve Guncawbûna Peyv û Wate”, “Ravekirin- tefsîr”, “Bedîkirin, çaverêkirin - Îrsad”, “Şêwaza Danayî - Îslubî hekîm”, “Dahênan- Îbdai” .

Hunera ciwankarî di her du beşan de bi vî awayî qalkirîyê: Di destpêkê de her hunerekê bi şêweyekî serbixwe pênaseya teorî wê hatîye kirin. Piştî jî piraktîkîya wan jî li ser mînakên pend û gotina hatîne kirin yan jî şîrovekirin. Di nivîsîna tezê de me hewil daye em xwe ji zêde şîrovê re bi parêzin. Armanç û xwesteka xwe bi şêweyekî kurt û eşkere me xwestîye em rabigihînin.

Dawîya tezê de jî bi çend encamekî zanîstî me anîye ku ji nivîsandina vê bebetê me bi destxistîye.

Di dawîyê de pêwîste amaje bi wê bidem nivîsîna her babetekî lêkolînîya zanîsta giring. Bi xwe hêsanî nabe, belku destxistina zanyarîyan ji bo nivîsînê bi şêweyekî zanîstîyane û serkeftî pêwîstîya wê bi westîyanekî heye. Bê guman bi pirs û giftugoyên zanistî û li gel kesên zana re berhem bi dest dikeve. Di vir de ez dixwazim supasîya wan kesan bikim ku ji bo vê berhema min bûne alîkar. Destpêkê de supasîya xwedê yê mezim û dilovan dikim ku çavkanîya hemû zanîn û alîkarîyek ji wî hatiye. Supasîya şêwirmend “Dor.Dr. Vechî Sönmez” dikim. Herwiha spasîyek bê hempa ji bo “Prof. Dr. Ebdulla Xidir Mewlud” dikim. Her wiha dîsan supasîya serok beşê zimanê kurdî ya zanîngeha Silahedîn “Dr. Idrîs Ebdulla” jî dikim. Dîsan rêz û spasîya “m. Serdar” dikim ku ji bo wergeran û bi destxistina çavkanîya re bûye alîkar. Spasîya wan hemu hevalan dikim ku serkeftina min dixwazin.

KUTEBÊJE

c.: cild “miceled- berg”

cz.: ciz “cuzî- beş”

ç.: çap

b.: berg

b. n. b. – h. b.: berhemê nav borî – heman berhem

dr.: doctor

het.: hetawî

h.: hicrî “koçî”

h. n. : heman nivîskar

hwd. :her wekî din

j.: jimare

ku.: kurdî

m.: mîladî

r.: rûpel

ş.: şerh “şirove”

s. a. s.: sele ullah û eleyhî we selem

t.: tebi’ “çap”

teh.: tehqîq “vekolîn”

wer.: werger

z.: zayinî

KURTE JÎYANA ŞÊX MIHEMEDÊ XAL (1904 - 1989)

Xal yek ji zana û nivîskarê kurd yê sedsala borîye. Ew zana jî di malbatekî olperest û ayîn dost de hatiye dinya yê. “Navê wî ê rastî “Şêx Mihemedê kurê Şêx Elî yê kurê Hacî Şêx Emînê kurê Şêx Mihemedê Xale” . Xal bi 5 babgan re digihe “Mela Mistefayê Miftî” . Di wî demî de miftî yên “baban” bûye. Beşdarî avakirina bajarê Silêmanîyê jî kirîye. Piştî hatina Mîrnişîna Baban ji “Qelaçolan” ê çûye Silêmanîyê. Di sala 1784 z. de hatîne silêmanîyê. Bingeha Xal di gihe zanayê binav û dengê îslamî “Ebubekir Musenîf” . Şêx Mihemedê Xal ji vê binemala olperest bû di sala 1904 de li bajarê Silêmanîyê ji dayîk bûye. Di sala 1914 de Xal hîna di temenê 9- 10 salî de bû babê wî çûye ber dilovanîya xwedê. Piştî mirina babê wî bapîrê wî “Şêx Emîn ê Xal” wî digire cem xwe û dide xwendin. Bapîrê wî melayek xudanas û dîyar bû. Kesekî destpak û xwedê perest bû, ji malê dunyayê dur bu, bi awayekî wisa ku muçeyek ji xelafetên Osmanî wernedigirt”¹.

“Xal di destpêkê de Qurana Pîroz, hinek pirtûkên farisî û 'erebî li cem bapîrê xwe xwendîye. Piştî di wî serdemî de xwendina xwe a mezin li cem zanayê mezin Şêx Celalê Qeredaxî, Şêx Omer Qeredaxî û Mela Husênî Piskendî xwendîye. Di dawîyê de li cem Şêx Omerê Qeredaxî destura Melatîyê sitandîye”². “Di sala 1931 an de bapîrê wî jî diçe ber dilovanîya xwedê. Her di wê salê de li cihê bapîrê xwe di mizgefta Hacî Şêx Emînê xal de bi fermanekî resmî dibe îmam û Muderîs. Di dawîya sala 1931 ande heya dawîya sala 1938 an Şêxê xal wane daye. Digel wê jî pireojeya Ferhenga Xal jî danîye û Rêzimana Kurdî û çend pirtûkên ayînî yên wekî Felsefeya Ayîna îslamê û jiyana Pêxember “s.a.s.” re xerîk dibe. Di vî demî de du Pirtûk daye çapkirin, her wiha karîye zanîsta ayînî bi çend kesan jî bide temamkirin”³. “Piştî di sala 1939 de bibe Qazîyê dadgehê. Li ser vê armancê jî li gelek cihan digere. Mînak bajarê wekî: Silêmanî, Helebçe, Çemçemal, Musil, Bexda, û Kerekuk. Vî

¹ Xal, Xalîd Muhemed *Jiyannamey Şêx Muhemedî Xal û Bîrewerî*, Govarî Gelawêjî Nwê, j.29, Silêmanî , 2002.r.219

² Aras Muhemed Salih, *Şêx Muhemedî Xal Pêşengî Biwarî Çaksazî û Nwêkirdinewey bîrî Ayînî*, Govarî Raman, j.197, Hewlêr, 2013.r.52

³ Xal, Xalîd Muhemed, b. n. b. , r.221

karê xwe berdewam dike heya sala 1967 an. Piştê bi temamî xwe ji karê resmî ve dikişîne û dest bi karê nivîsînê dike”¹. Di vî demî de Şêxê Xal ji bilî dadgehê û qazîtîyê, wekî nivîskarekî çalak û karker derketîye holê. “*Di sala 1953- 54 de wekî duyemîn kurd bûye endamê di Korî Zanyarîya 'êraqê. Piştê di sala 1970- 72 an de jî bûye cêgirê serokê korî zanyarîya Kurdî li bexda. Di heman sal de jî dibe serokê liqê Yekêtîya Nivîskarên Kurd li Silêmanîyê. Di sala 1973 de dibe cêgrê duyem yê serokê korî zanyarîyên 'êraqê. Di sala 1980 an de jî dibe endamê korî zimanê 'erebîya Ordinê. Xal di rewşenbîrî û nivîsandina pirtûkan û lêkolînên zanîstî de berdewam dibe heye dawîya temenê xwe. Heya di roja 15/7/1989 an de çuye ber dilovanîya yezdan. Li goristanê Seywan li bajarê Silêmanîyê hatîye veşartin*”². Şêxê Xal yek ji rewşenbîr û nivîskarê bi nav û deng yê serdema xwe bû. Gelek zêde hest bi valahî û kêmanîya nebûna berhemên pirtûkên kurdî kirîye. Bitaybet jî di derbarên: olî, Tefsîra Qurana Pîroz, Ferheng ku taybet bi zimanê kurdî, netewayetî, nîştîmanî, dîrokî, wêjeyî, zindî kirina berhemên kevin yên wêjeya kurdî, folklorî kurdî bi taybet pendên pêşîyan..gelekdin jî. Ji ber vê jî xwe wekî berpirsyarek yê vê derbarê didît. Di encama vê de dibe sedemê ku bi dehan pirtûk û berhemên giring bi destxistîye. Heya niha wekî berhemekî pile bilind a kurdî tê zanîn.

Sê ji van berhemên ku Xal pê tê naskirin pêktên ji “Tefsîra Xal, Ferhenga Xal, Pendên Pêşîyan” - Giringîya tefsîra Xal di wê daye ku pêşîya şêxê Xal hewlek bivî awayî li zimanê kurdî ne bûye.. Her ev jî bûye sedemek ku Xal dest bi vî karî bike. Wekî bi xwe jî dibêje: “*Gelê kurd gelekî misilmane ji 25 milyon kesan pêktê li cem min eyb û qisûrî ye ku di pirtûkxaneyan de Tefsîra Qurana pîroz bi zimanê xwe nebe*”³. Ew a ku giringîya vê tefsîrê jî jiyên din cûda dike, ew e ku Xal tefsîra xwe li gorî rêbaza “Reforim- Nûsazîya îslamî” çêkirîye. Li çend pirtûkan de tefsîra beşekî yê Sureta qurana pîroz danîye. Ev jî ji şêwazê tefsîra kevin hatîye ji derve, hewila nukirina gotara

¹ Aras Muhemed Salih, b. n. b. , r.53

² H. b. , r.53

³ Muhemed Salh Mela Hesên, *Mamosta Xal û Diwa Çawpêkewtin*, Rovar, j.29, Silêmanî, 2004. r. 73

ayîni daye. “Şêx Mihemedê Xal” yekem kese ku di salê Sihande ya sedsala borî de li navçeya Silêmanîyê û kurdistana başur de ketîye hewilidana belavkirina hizrên nû yê gotarên ayîni. Ev jî çavkanî û rêbaza waneyên Seyîd Cemaledînê Afxanî, Şêx Mihemedê 'Ebde û Şêx Mihemedê Reşîd Reza bû”¹. Ev hemu damezrênerên medreseya “Refurma îslamî” bûn.

- Yekdin ji berhemên mezin yê Şêxê Xal Ferhenga Xal e. Giringîya vê berhemê di wê deye pêşîya vê ferhengê pirtûkxaneya kurdî çol bû di ferhengê bi vî awayî de. Xal yekem kesê kurde ku Ferhengê “Kurdî- Kurdî” nivîsiye. Têde şîroveya bi hezaran peyvên kurdî kirîye. Ferhenga wî nêzikî 40 hezar peyvane. Hemu zar û zaraveyên ciyawaz yê zimanê kurdî tê heye. Di sê bergên mezin de cih kirîye. Ev karê Xal heya niha jî wekî berhemekî mezin û bilind di zimanê kurdî de tê danîn. Xizmetekî bê endaze bi vî zimanî kirîye.

- Pendên pêşîyan jî ew berhema giringî bi nirexe ku di derbarê folklorê de nivîsiye. Pirtûkxaneya kurdî bi vê dewlemend kirîye. Giringîya wê di wê deye zêdetirîn hejmara pendê pêşîyan bi xwe girtîye.

Xal li pişt xwe nêzikê 40 berhemên cûr bi cûr bi cih hiştîye yê herî giring jî evên li jêr me daye dîyarkirine.

“1- Ferhenga Xal, bi sê bergan daye çapkirin: Berga yekem- 1960, berga duyem- 1964, berga sêyem jî - 1976

2- Pendên Pêşîyan.

3- Tefsîra Sureta Fatiha, 1932

4- Tefsîra Xal: Çend cizmeke her cizmek jî di salekê de çap kirîye. Cizma Yekem- 1969, Ya duyem - 1972, Ya sêyem- 1979, Ya bîst û heştêm- 1981, ya çarem- 1984, ya bîst û heftem- 1990, Ya bist û nehem “Tebarek” - 1986.

5- Felsefeya Ayîna îslamê, 1938

¹ Aras Muhemed Salih, b. n. b. , r.57

- 6- Sozî Mînber 1997
- 7- Perwedeyî Ayînî, 1975
- 8- Ayîn û Rewîşt û Ciwankirin, 1949
- 9- Miftî Zehawî, 1953
- 10- Mewludnamey neweser, 1937
- 11- Mela mihemedê xakî, 1978
- 12- Babe Tahirê Hemedanî meşhûr be 'Uryanî, 1977
- 13- Naley derûn, sê berg: Bergê yekem, 1984 duyem- 1985, sêyem- ?
- 14- Pêşgir û Paşgir, 1974
- 15- Rêzimanî Kurdî, 1960

Herwiha pirtûkên wî yên herî giring ê Erebî jî evin:

- 1- Teirîx El - Efrasyabîye ew heleqe mefqude mîn teirîx el- besre, 1987
- 2- Şêx Meruf El- Nudêhî el- berzincî, 1961
- 3 Kenz El- lîsn, 1980
- 4- Muqedîme fî el- muenesat el- semaîye, 1967''¹.

¹ Xal, Xalîd Muhemed, b. n. b. , r.232

DESTPÊK

1. Pênaseya Pend û Gotinên Pêşîyan *

Di derbarê folklorê bi giştî û pendên pêşîyan bi taybetî, Maksîm Gorgî dibêje: “*Em nikarin dîroka rastîya gel û qewmekî bizanin, eger em wan berhemana nezanîn dem bi demê re hatîne girtin*”¹. Di vî alî de yek ji janerên vî beşî zindî ya folklorê ku berdewame di zivirandin û nûbûnê deye pendên pêşîyan ne. Ev jî bi hinek xasyetan şewazê taybet yê xwe digire û cuda dibe ji gotinên asayî yên rojane. Evî zanayî jî bi çend şeweyan pênaseya wan kirîye. Li jêr de emê hinek ji van pênaseyan bi din destnîşan kirin.

Pend û Gotinên Pêşîyan: “*Hevok û gotinek kurte wateyek berfireh û kûr têdeye*”². Yan jî “*Ew gotina kurte ku hizrekî xwedî armançdar tê deye*”³. Li gorî van nasandina pend û gotinên pêşîyan şewazên taybet ji wê werdigire ku di rûxsarê “form” de kurt bin di naverokê de jî ji bo armançekê bin wateya wan fireh bi bexşîne. Ev jî ji wan xasyetane ku ji gotinên asayî cuda dike. Têbînîya me ji bo van pênaseyan ew ku di pênasekirina vê janerê de pêwîste amaje bi wê bike ku ev berhemên ezmuna xelkêne dem bi dem hatîne zivirand. Ji bo hemu alîyên jîyanê wekî aborî, civakî...hwd gotîne. Ev jî jibo ku pênase taybetîyê bide ji bo ku ev janer nebe nasandina hemu gotinên kurtê bilind yê wêjeyî.

* Ev beşa giring û serekîya folklore, bi çend navên cuda hatîye ku di çavkanîyan de ji alîyê kurdên navçeyên cuda de jî hatîye. Mînak : Jêre gotîye (pendê pîran), (gotina pêşîyan), (pendî kurdî), (meseley kurdewarî), { (bêj û pend), (qisey pêşîyan), (pend û qisey nesteq), (pendî pêşînan), (qisey bavan), (mesele û Metelok), (gepîdê Bavan)...}. wekî ku em dibînîn her çiqas navên wan cudane lêbelê naveroka hemuyan di çê ser yek armançê. Ji bo zanyarîyên hin zêdetir temaşeyî: Dr.Şukirye Resul, *Edebî Folklorî Kurdî*, Beşî dûyem, Çapxaney Zankoy Selahedîn, Hewlêr, 1984. r.5

¹Şukirye Resul, *Pendî Pêşînan û Qisey Nesteqî Kurdî*, wer: Dr.Şukirye Resul û Celal Teqî, Hewlêr, 1984. r.70

² Îzedîn Mustefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, ç.3, Dezgay Aras, Hewlêr, 2010. r.87

³ Komellêk Mamosta, *Serincêk le derwazey Folklorî Kurdewey*, ç.2, Dezgay Aras, Hewlêr, 2009. r.31

Hinek din ji wan pênaseyan taybet bi pend û gotinên pêşîyan yê kurdî kirîne. Dibêjin “*Pêktê ji hevokê kurt sade yan jî li hevadyî ya ser ser bi zarê xelkê ye. Yan jî pexşanekî xemilandî yek yan du malikin ku wateyekî mezin didin bi dest. Li qalibekî ciwan yê kurdî de çêbûne. Pirsgirêkek nazik û endîşeya bab û bapîrane. Di encama ezmunekî dur û dirêja wan rojan de hatîye. Çawenîya borandina jîyana wan di aliyê aborî de û serpêhatiyên wan yên civakî dibêjin*”¹. Her diderbarê pend û gotinên kurdî gotîne: “*îbaretin di çend gotinên kurt yên kurdî bi hev re zeliqîne, wateyekî bilind tê deye. Ji zimanekî gelek kevin ketîye ser zimanê kurdî. Çawenîya jîyana wan reftarê wan û bwerîya wan... dide nîşandan*”². Yan jî hatî ye gotin: “*Pendên pêşîyên me komek gotar amojgarîyên bi bandorên rêk û pêkên bi nirxin. Bab û bapîrên me di demê kevin de gotîne wekî kevnarekî ji mere hiştîne. Wekî belgeyekî rênîşandan di jîyana rojane û gotinên me de em bikartînin. Em gelek fayde ji wan werdigirin*”³.

Li gorî van pênaseyan jî pend û gotin, berhemên hizrên bab û bapîrên me ne. Di ezmûna jîyana wan a di aliyê aborî û civakî de hatîne gotin. Serpêhatî û buyer bi kesayeta wan ve girêdayî pend û gotin jî ji wan hatîye girtin. Yan jî çêbuye. Bi formekî wisan ku parêzgerî li mayîna wan bike.

Hinek din ji van pênaseyan hesaba aliyê hunera rawanbêjî kirîne. Ev jî xalekî serekî xasyetekî dîyarîya vê janerê ye. Ji bo vê armancê jî gotîye. Pend û gotinên pêşîyan: “*Hevokê kurt a watedare, pîranî wezin û serwadare. Di aliyê zêde watyê û zêde bi karanînê de hêzekî zêde ji bo xemilandina qise heye*”⁴. Pend û gotin ji bilî ji bo xwe di aliyê rûxsarê de şêwazekî ciwan ya hunera rawanbêjî yê ye. Her wiha erkê xemilandina gotinên rojane jî di demê karanînê de wer digire. Her di vê derbarê de gotara pend û gotinên pêşîyan: “*Cûreke ji wêjeyê û bi peyvên kurt û watedarê ciwan ya rawanbêjî ji axaftinên*

¹ Deştakî, Umer Şêxella, *Pendî kurdî*, b.1, ç.1, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr, 2672 ku. -1972 z. r.4

² Secadî, 'Elaedîn, *Mêjûy Edebî Kurdî*, ç.1, Bilawkirawey Kurdistan, Sine, 1391 het. R.139

³ Şarezûrî, Elî Me'ruf, *Pendî Pêşînanî Kurdî*, ç.2, kitêbxaney Şêx Rezay Tallabanî, Silêmanî, 2010.r.9

⁴ Şukirye Resul, *Pendî Pêşînan û Qisey Nesteqî Kurdî*, r.9

asayî cuda dike”¹. Yan jî bi şêweyekî ber firehtir gotîye pend û gotin: “*Felsefeya jîyan û dengê ezmana cihan û berhemê rawanbêjîya rawanbêjane. Bab û bapîrên me ji ber î hezaran salan ji mere wekî mîrasekî bi cih hiştine*”².

Bê guman alîyên rawanbêjî dewrekî serekî dibînin di pêkanîna form û rûxsarê vî jenerî de. Ji ber ku “*Ew di qalibdanû kurt birîya yan aheng û ritim û serwadarîyê de meseleyên wan hene. hemu jî ji bo xizmeta ji ber kirinê*”³.

Komentek giştî ya me ji bo hemû wan pênaseyên me di serî de kirî, ewe kune merce pend û gotin taybet û destnîşankirîbe ji bo tenê ji jîyana serdema pêşîyan yê kevinê bapîran bin. Belku ev hemû tişteki zindîne berdewamin li gele dîyardeyên ciyawaz ê gohrtina şaristanî û buyerên nû jî ji dayîk dibin.

2.Di derbarê pirtûka “Pendî Pêşînan” ê Xal de:

Ji berîya em bî ser behsa vî berhemê, pêwîste em bi kurtî çavek li alîyê dîroka vî hewlê bidin. Pêşî ku em bî ser vî berhemê ew hewlên ku Di nav û ji derveyî başurê Kurdistanê hatî dayîn pêşîya berhem Xale. Di derbarê komkirina pend û gotinên pêşîyên kurdî de.

A- Ew Hewildanên Ku Ji Derveyî Başurê Kurdistanê Hatîne Kirin:

Destpêkê de ew hewildane ji derve dayîne derbarê komkirina vî babeta folklorîya kurdî. Ev jî di wê serdemê de bû ku hîna çap û çapxane wekî niha nebû. Ew babetên di wî demî de dihatin nivîsîne her bi destnivîsê bû. “*Yekemîn destnivîsa pendê pêşîyana kurdî heya niha jî ew destnivîseye ku di sala 1711 de hatîye nivîsandine. “Matînederanî Ermenîya Sovyetî” bi navnîşana “Mîsrob Maştose” ev destnivîse jî bi dehan pend û pêşînanî kurdî tê deye bi tîpên ermenî û bi zarê kesekî ne nasyar nivîsîye... Duyem ew destnivîse di navîna Sedsala 19 de ji alîyê zanayê kurd Mela Mehmudê Bayezîdî ve nivîsîye. Ev destnivîse li pirtûkxaneya “Lînîngrad” di zanîsgeha*

¹ Şukirye Resul, *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, Çapxaney Xwêndinî balla, Hewlêr, 1410 h.-1989 z. , r.174

² Xal, Şêx Muhemedî, *Pendî Pêşînan*, ç.5, Çapxaney Şivan, 2014. r.8

³ Muhemed Kerîm Şerîf û Ebdulla Xidir Mewlûd, *Meselekanî Kurdewarî*, ç.1, Çapxaney Minare, Hewlêr, 2005.r.6-7

*rojhelata yekêtîya sovyet de bi navê “Wegêrana Pendên Pêşîyanê Qiseyê Nesteqî ji bo ser zimanê kurdî” hatîye parastin”*¹. Piştê ev hewildane berdewam buye herî zêde ji alîyê kurdnasên bîyanî ve. Ewan jî ji wan berhem û pirtûkên ku di derbarê edet û reftarê jîyana kurdewarî didan nivîsandin. Têde amaje bi çend pend û gotinên pêşîyan dikin û tumar dikin. Mînak: hinek kurdnasên dîyar jî evin:

- *“Yegîzarev, di sala 1878 z. de pirtûkek bi navê “Serpêhatîya Entografîya Kurdî” di derbarê kurdên navçeya Êrîvanê çap kirîye Bergê duyem jî di sala 1891 de çap kirîye “Têksta Folklor” ê belav kirîye. Têde bi dehan pend û gotinên pêşîyan yên kurdî di nav daye.*

- *Serkîs Aykonî “1838- 1908 z.” pirtûkek nivîsîye ku ji çend beşan pêkhatîye. Beşa pêncem hemu ji bo folklorê kurdî danîye. Di beşê şeşemde jî Efsene û pendê pêşîyên kurdî belvakirîye.*

- *Fon Likok, di sala 1901 an de di navçeya “Zencîrlî” jî bakurê kurdistanê jimarek pendên pêşîyan û gotinên kurdî û Nubihara Ehmedê Xanê û mewluda Pêximber “s. a. s.” komkirîye. Piştê bi sê bergan bi tîpên erebî û latînî wergerandîye ser zimanê Elmanî û çap kirîye”.*

- *Hogo Mekes di sala “1926” an de berhemek çapkirîye ku ji çîrok, destna û pendên pêşîyên navçeyên Mardîn pêkhatîye ku li ser şeweyê kurmançîya jorîne”*².

Ji bilî pirtûk û pirtûkokên hatî çapkirin, hinek ji van kurdnasan beşek ji gotarên xwe jî ji bo vê babetê ve qetandîne. Yekek din ji wan hewlên bîyanî ji bo komkirina pend û gotinên pêşîyên kurdan: *“Karê “M.Pîro Rondo” ye di sala 1933 an de berhemek di derbarê “Komkirin û lêkolîna pend û gotinên pêşîyan yê kurdî” bi zimanê firansî nivîsîye”*³. Her wiha ev hewildane berdewam bûye di alîyê kurdên me ve jî. *“Hecî Cindî û Emîn Evdal, di sala 1936 an de pirtûkek folklorî li Êrîvanê derxistin, bi navê “Folklor*

¹ Şukirye Resul, *Pendî Pêşînan û Qisey Nesteqî Kurdî*, r.19

² H. b., r.20-21

³ H. b., r.25

*Kurmanca'' tê de gelek gotinên netewî û pendên pêşîyan û gotinên pêşîyan û metelok hebu û hatîye çapkirin''*¹. Hinek hewil û berhemên hevbeş jî derdiketin dinavbera zanayên kurd û bîyanîyan de. Mînak: *''Zanayê Kurd Kamuran Alî Bedirxanî û nivîskarê firansî Pol Margrît di sala 1937 an de li Parîsê pirtûkek hevbeş derxistin bi navê ''Pendên Kurdî''*. Her di heman salê de *''Roje Lîsko''* yê Firansî pirtûka bi navê *''Pend û Metel''* derxist. Nêzîkî 280 mînak tê de heye li gel wergeran ser zîmanê feransî''². Di heman demê de ew rojname û govarên ku derdiketin li her navçeyekî kurdistanê yan jî li parçeyekî kurdistanê de goşeyek ji bo vê janera folklorî ve diqetandin. Her wiha bi zarê kurmançîya jorîn *''Cegerxwîn ê helbestvan jî di sala 1957 an de komek pend û gotin bi tîpên latînî di jêr navê 'Gotina Pêşîyan' de li şamê çap kir''*³.

B- Ew Hewildanên Di Pêşîya Xal de Li Kurdistana Başur Hatîn Dayîn:

Yekem pirtûka kurdî a di derbarê pend û gotinên pêşîyan yê kurdî de derketî, pirtûka *''Qisey pêşînan- Gostawlobon''* ya *''Îsmail heqî Şawês''*e. Di sala 1933 de li çapxaneyê eytam li bexda bo Cara yekem çapkirin ku 613 pend bû. Cara duyem jî bi navê *''Hezar bêj û pend''* ji alîyê Maruf Ciyawig'' ve hatîye komkirin. Di sala 1938 de li çapxaneyê Necah hat çapkirin. Ev jî ji hezar pendan pêk tê''⁴. Her wiha rojname û govarên wî demî jî rolekî giring hebûn di belavkirina vê babeta folklorî de. *''Ya herî giring jî govara ''Gelawêj'' bû ku 392 pend daye çapkirin... Her wiha Pîremêrd, ''1867-1950'' nêzîkî 6448 pend heryek bi helbestekê li rojnama jîn û Jiyan belav kir''*⁵. Lê belê pendên Pîremêrd jî bilî ser bi wêjeya millî *''gelerî''* bû ne jî folklorî. Her wiha bi şeweyê pirtûk ne dabû çapkirin. Li Piştî van jî wekî pirtûk *''Pendî Pêşînan''* ê Xal di rêza sêyem deye. Bi awayekî rêk û babetî danîbe. Piştî her du berhemên wî *''Îsmail Şawês û Maruf Ciyawig''* tê. Her wekî Eladîn Secadî

¹ H. b., r.26

² H. b., r.27

³ Îzedîn Mustefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, ç.3, Dezgay Aras, Hewlêr, 2010.r.85

⁴ Secadî, Elaedîn, *Mêjûy Edebî Kurdî*, ç.1, Bilawkirawey Kurdistan, Sine, 1391 het .r.141

⁵ H. b., r.141

di derbarê dîroka komkirina Pendên Pêşînanên kurdî li piştî van her du pirtûkên pêşî dinivîse: “*Sêyem car di jêr navê "Pendî Pêşînan" ji alîyê Şêx Mihemed Xal ve di sala 1957 an de li çapxana Me'arîf ji bo cara yekem hate çapkirin. Ev jî ji 1308 pendan pêktê*”¹. Eger em temaşeyî van berhemên bikî ku di dîrokê de komkirina pend û gotinên pêşîyên kurdan nivîsîne, ev jî ji me re eşkere dibe ku "Pendî Pêşînan" ê Xal di serdemekî firehtir de bu di alîyê hejmara pendan û naveroka firehîya babetên wî, bi corekê bû. Di serdema niha de giringîya xwe her maye. Pêşengîya wan hewildana dike ku di vê derbarê dene û heta niha çavkanîyek serekîye ji bo lêkolînavana.

Ev berheme çend caran hatîye çapkirin:

Destpêka çapa yekem di sala 1957 de bû ku jimara pendê wê 1308 bû. Çapa duyem jî bi zêdetir di sala 1971 derket û jimara pend û gotinê wê gehişt 3893 yan. Çapa sêyem* jî dîsan çend mînakêndin jî ji bo wê zêde kirin di sala ku 2000 de derketîye. Di dawîyê de jimara pend û gotinan gehişt 4499 an. Piştî du cardin hat çapkirin di sala 2007 de çapa çarem û di sala 2014 de Çapa pêncem jî derket di vê çapê de ji ber hinek sedeman jî sê pend jê kembûn û bûye 4496 pend û gotin. Rênivîsa hemû çapan jî bi alfebeya 'erebî û zarê kurmançîya naverast “sorani” hatîye nivîsandin. Mînakên wê jî li gorî tîpên Ebcedî hatîye rêzkirin. Bi vî şeweyî ji her tîpê re komek pend jêre anîye ku destpêka wan bi vê tîpê destpê dike. Hemû mînakên pend û gotina vî pirtûkê

“4496” e ku ev jî bi ser 26 tîpan de dabeşkirîye. Bi vî awayî:

Navê tîpê	Hejmara pendan
A - ئه‌لف “-”	563
پ”	
B - ب	486

¹ H. b., heman rûpel.

* Ev çape li piştî mirina Xal derketîye, ew pend û gotinên ku ji bo wê hatîne zêdekirin herî zêde yên navçeya hewlêrêne ku Şêxê Xal di pêşîyê de komkiri bû.

C - پ	145
T - ت	187
C - ج	49
Ç - چ	80
'H - ح	49
X - خ	173
D - د	395
R - ر	93
Z - ز	69
J - ژ	35
S - س	212
Ş - ش	128
'E - ع	22
'X - غ	2
F - ف	24
Q - ق	112
K - ك	348
G - گ	173
L - ل	267
M - م	291
N - ن	180
W - و	102
H - ه	273

Y - 6	38
Kombûna giştî	“4496” pend

Di vir de tê xwestin ku em hinek nerînên folklor nasan yên kurd di derbarê giringîya pirtûka “Pendî Pêşînan” a Xal de bidin dîyarkirin.

Îzedîn Mustefa Resûl di derbarê vê berhemê û berhema pêşîya vê de dibêje: “*Ji vana ya herî berfirehtir û hevrengtir grupa Şêx Mihemedê Xale. Ev komkirine jî bi tîpên ebcedî hatîye rêzkirin. Lê belê di berfirehîyê de di keve pêşîya grupên din*”¹.

Her wiha Şukrîye Resûl jî teza xwe a Dokuratîyê li Rusya nivîsîye ku li ser pend û gotinên pêşîyan ê kurdîye. Di derbarê vê de jî nivîsîye. “*Pirtûka Xal heya niha paktirîn karê komkirina pendên pêşîyane di kurdistanê de. Herî zêde berhem di ya wî de hatîye komkirin*”². Her wiha zanyar “Dr. Erdoxanê Celîl û Celîlê Celîl” jî di derbarê vê pirtûkê de gotîne: “*Di sala 1957 an de pirtûkek din binavê ‘Pendên Pêşîyan’ li bexdayê hat çapkirin. Zanayê kurd ku xwedîyê ferhenga Kurdî ye Şêx Mihemedê Xal nivîsîye. Xal di pirtûka xwe de nêzîkî 1319 pend û gotinên pêşîyan ê kurdistanê Êraqê komkirîye ku ewên bi zimanê kurmançîya jêrîn ‘Sorani’ di axîfîn. Hinek pend û gotinên pêşîyan yên wan kurdan jî tê de heye û yên kurdên Surîye û Turkîye û Yekitîya sovyetê jî tê de hebûn*”³.

Pêkhateya naveroka pirtûka “Pendî Pêşînan” jî destpêk û çend mînakên pendan pêktê. Xal di destpêka pirtûkê de pênaseya cûr bi cûr yên pendên pêşîya daya dîyarkirin. Piştî di alîyê rûxsaryê jî qalkirîye û qala çend şeweyên pendên pêşîyan jî kirîye. Weku dibêje: “*Pendên pêşîyan hinek ji wan wekî helbestan rêku pêkin û beramberin. Yan jî hinek ji wan di şeweyê pirs û bersivê dane. Hinek jî di perdeya amojgarîyan de ye. Hinek jî wan qala wan tiştan dike*

¹ Îzedîn Mustefa Resul, b. n. b. , r.85

² Şukirîye Resul, *Pendî Pêşînan û Qisey Nesteqî Kurdî*, r.40

³ H. b. , r.40

ku di şêweyê dijonan û paldarê dane yan di perdeya şibandinê de ye yan jî di şêweyê metelokan daye”¹. Piştî destpêkê jî mînakên pendan anîye daye nivîsandin. Her pendek ji van jî hejmarek taybet a xwe heye. Her rûpelek jî dabeşî du beşan kirîye.

Di beşê serî de jî mînakên pendan nivîsiye di beşê jêr “xwarê” de jî şîrove û armanca pendan daye nivîsandin. Bi hêza xwe hewildaye ji bo hinekan jî çîroka pendan binivîse.

Giringîya naveroka wê di vê deye mînakên pendan berfireh û hev alîne ji bo alîyên jîyanê jî hatîne gotin. Mînak naveroka wekî: “Olî, Aborî wek: “Nan, Dirav, karkirin, bêkarî û qerkirin, ... hwd”, amojgarî, dîrokî, rastî û civakî. Ev jî bi dehan edet û heyîn berjeng û kesayetî...hwd jî hinekê digire nava xwe mînak wekî.Rezîl, destbilav, merdî, namerdî, mêvanperwerî, xizmayetî, hevaltî, biratî, zilamtî, çîneyetî, jin anîn, dostatî, dijminatî, û kesayetên wekî jin “dayîk, xwîşk, jin, keç” kesayetîyên wekî bav, bira, kurmam, xal jî. Her wiha peywendîyên civakî û bi dehan tiştên din jî di nava xwe de digire.

Heya niha jî ev pirtûk di pêşengîyê de ye û qet ji giringîya xwe jî ne ketîye. Ji ber ku karekî mirovatîye û bê xeletî û kêma jî nîn. Li jêr emê bi kurtî lewazîya wan bidin destnîşan kirin.

Bê guman ciyawazîya serekî ya pendekê di gel penda din di wateya wê deye. Zimanê kurd jî ji çend zar û şêwezaran pêkhatîye. Goherîna tîpekê dengê yan jî zêdekirina amrazekê yan tîpekê yan jî paş û pêşxistana peyv û hevokan yan jî hinek goherînên din di formê de ku ji zarekê bu zarekî din yek ziman, yan jî ji şêwezarek yan jî bin zarek ji bo şêwezar û zarekî din yek zar, nabin binema ji bo ku pend bi ciyawaz danin. Mezintîrîn xala lewaz a pirtûka xal di vê deye ku çend mînakek ji wan pend û gotinan bi cuda rêzkirîne her yek tiştin. Li jêr hinek ji wan emê bînin ku ev rewş bi eşkere tê de heye.

Di rûpela “57” de penda jimara “469” nivîsiye.

¹ Xal, Şêx Muhemedî, b. n. b. , r.9

Ewey lay bende xeyale, Lay xwa betale.

Dîsan di rûpela “61” de penda jimara “507” nivîsîye.

Ewî lay bende xeyale, Lay xwa betale.

Herwiha di rûpela “28” de penda jimara “169” nivîsîye.

Eger to nebit be yarim, xwa esazênê karim.

Dîsan di rûpela “141” de penda jimara “154” nivîsîye.

Toş nebî be yarim. xwa esazênê karim.

Herwiha di rûpela “31” de penda jimara “169” nivîsîye.

Eger zîman bîyelê ser rehetê.

Dîsan di rûpela “228” de penda jimara “20” nivîsîye.

Ziban biwestê ser rehetê.

Herwiha di rûpela “266” de penda jimara “55” nivîsîye.

Şeq ezanê qonax le kwêye.

Dîsan di rûpela “318” de penda jimara “274” nivîsîye.

Kutek ezanê qonax lekwêye.

Herwiha di rûpela “77” de penda jimara “113” nivîsîye.

Be destêk du kalek helnagîrê.

Dîsan di rûpela “212” de penda jimara “336” nivîsîye.

Du kalek be destê helnagîrê.

Herwiha di rûpela “131” de penda jimara “38” nivîsîye.

Ta mal westabê, mizgewt herame.

Dîsan di rûpela “428” de penda jimara “30” nivîsîye.

Heta mal westa bê, mizgewit herame.

Herwiha di rûpela “427” de penda jimara “24” nivîsîye.

Heta gindor bû qewm û qîleman zor bû, ke gindor be ser çû qewm û qîleş beser çû.

Dîsan di heman rûpelê de penda jimara “25” nivîsîye.

Heta gindor gindor bû, qewm û qîleman zor bû, gindor hate biranê, xizim hatine qiranê.

Herwiha di rûpela “128” de penda jimara “18” nivîsîye.

Ta xawen mal dizî girt, diz xawen malî girt.

Dîsan di rûpela “428” de penda jimara “31” nivîsîye.

Heta malxo dizî girt diz malxoy girt.

Herwiha di rûpela “151” de penda jimara “3” nivîsîye.

Çi bilêy hesen keçel, çi bilêy keçel hesen.

Dîsan di rûpela “310” de penda jimara “189” nivîsîye.

keçel hesen, hesen keçel.

Herwiha di rûpela “78” de penda jimara “114” nivîsîye.

Be destêk çeple lê nadrêt.

Dîsan di rûpela “154” de penda jimara “36” nivîsîye.

Çeple be destêk lê nadrêt.

Herwiha Di rûpela “129” de penda jimara “24” nivîsîye.

Ta şu ekey mîrît. Ke şût kird gizîrî. ke sikêkit kird pîrî.

Dîsan di rûpela “130” de penda jimara “33” nivîsîye.

Ta kiçî mîrî, ke şût kird gizîrî, ke sikêkt kird pîrî.

Ji bilî van çend mînakek din jî di nav de hene zêde wekî yên netewekdine. Ji ber ku tam û bêhna pendên kurdî jê nayên.

“Eger zemanê hênatîye pê kenîn satêk, wiryabe net girênê salêk₁” * r. 31

“Bextewarî topêke be diwaya raekeyt, ke eşwestê, şeqî têheledeyt” r. 88

Yek ji wan pêwîstî û mercan divê di komkirina teksta folklorî de dibe ku hebe. Ew jî ewe ku ew teksta folklorî ser bi her navçeyek yan jî şêwezarekê be. Çawe hati be gotin pêwîste wisan jî bê nivîsandin bêyî ku dest karî lê bê kirin. Destgirtima yek zar ji zaran di nivîsîna tumarkî de di be sedemê tevlîhevî û kêmasîyan. Ev rewş jî şêxê Xal di çend pend û gotinan de heye. Bi taybet ew pendên ku ji navçeyên hewlêrê girtîne. Mînak:

“Lo xoman nabête nan, Lo xelqî ebête naskenan” r. 366

Ev mînak ji şêwezarê hewlêrî hatîye girtin. Lê belê di hinek cihan de guhertin çêbûye. Ji ber ku xelkên vê navçeyê tam bi vî awayî na axivin. Belku dibêjin: “Lo xoman nabîte “nabte” nan, Lo xerkî debîte “debte” naskenan” . Di vê mînakê de jî dinivîse.

“Dakî xom kabane, têr exom kiftane” r.184

Ev mînak jî ji şêwezarên navçeyên hewlêrê hatîye girtin. Lê belê ev şêwezar jî morfêma rêzimanî a “de” ku firmana demê neburîye û firmana bûrîyê berdewam jî çê dîke. Ne morfîma “e” her çiqas şêxê Xal ji bilîku vê binivîse: “..... Têr dexom kiftane” nivîsîye “....Têr exom kiftane” . Di vê mînakê de:

* Ji vir û pêve me bi pêwîst ne zanîye ku ji bo hemu mînakan di jêrenotan de amaje bi navê çavkanîyan dubare bikîn. Ji ber ku karê lêkolîna me tenê li ser pirtûka (Pendî Pêşînan)a Şêx Mihemedî Xalê ji ber wê jî ne pêwîstbu ku em hemu caran binivîsîn belkû li cem her mînanekê tenê me amaje bi jimara rupela pirtûkê kirîye.

“Mal lo mêrdane 'ezab lo jinane” r.372 yan “Mal lo keyfîye yan lo heyfîye” r.372

Ev jî wekî mînakên pêşî ji şêwezarê hewlêrî hatîye girtin. Xelkên vê navçeyê cudane ji hemû navçeyên din ku ji bilî “Mal” re dibêjin “mar” . Her çiqas Şêxê Xal li cihê vê binivîsîya “Mar lo mêrdane...” yan “Mar lo keyfîye” lê wî wiha nivîsîye “Mal lo mêrdane” “Mal lo keyfîye” . Bi hêsan hest bi van tiştan tê kirin ji ber ku tîpa “L” ya qelew û “L” ya sivik şêwazê gotina her duyan bi hev re gelek girane. Ev jî li gelxasyeta gotinên pêşîyan nayê guncandin. Ji ber ku gotinên pêşîyan bi sivikî û rawanî bê erk hatîne gotin.

Mînak:

“Dakit kurd û babit kurd, em 'înwanet le kê girt” r.184

Ev jî ji şêwezarê navçeyên hewlêrî hatîye girtin. Lê belê vî şêwezarî her du berjengê nîşandanê a nêzîk û dur “Em...e” û “ew...e” hene. tenê berjenga nîşandanê a dur ya “ew...e” bi kartînin. Şêxê Xal bi vî awayî nivîsîye “Em 'înwanet le kê girt”, ya rast pêwîste wiha be “Ew 'înwanet le kê girt” . Ji bilî vê mînakên wisan jî di kevin pêş çavê me ku zêde wekî gotinên asayîne ne pendû gotinên pêşîyane.

“Seyî sadîq to eykeyt be gîskêk xase, erna hacî 'ewla xul edem eyka we dîzeyî danûle” r.252

3.Zanîsta Ciwankarî:

Ciwankarî yek ji van e ku di rêbazê de zanîste û di karanînê yan jî di “Piraktîkî” de hunere. Ev beş jî hevîmilê zanîstên din ê rewanbêjîyê ne, ew jî “Rûnbêjî û Watanasî” ye. Ku erkên rewanbêjîyê bi cihtîne. Di dayînekî taybet bi axaftinê ye. Di sedema komek hunerên cîyawaz de ji rewşa asayî derbasî ya hunera bilind dibe. Pênaseya ciwankarîyê jî em di karin di çend alîyan de bidîn nasandin.

3.1.Ciwankarî di alîyê Ziman de:

Di vî alîde peyva ciwankarî ji peyva “بدیع - Bedî” ya 'erebî hatîye girtin. Peyva “Bedî” jî di ferhenga 'erebî de bi vê wateyê hatîye: Pêktê ji “*Danîna Tiştan*”¹. yan jî tişteke “*Ji bo yekem carê danîbe*”². Di Qurana pîroz de jî her bi vê wateyê hatîye. Wekî ku di vê ayetê de di fermîne: “بدیع السموات والارض ”³. Wate: xwedê aferînerê asiman û erdêye bi ciwantişî awayî. Demak ku biryara her tiştêkî bide, tenê ew bese ku fermane, yan jî pêşîya hatinê bide êdî zutir ew tişt dibe, yan jî ew kar çê dibe. Di cihek dinde her bi wateya afirandina nu di qurana pîroz de hatîye. “قل ما كنت بدعا من ”⁴. Wate: Ey Muhemed bêje: Ez ne kesê nu hatîme, belku di pêşîya min de pêximberên din jî hatîne. Her wiha ev di fermana pêximberde jî bi heman wateya nu hatîye: “كل بدعة ضلالة”⁵. Wate: Hemu tiştêk di alîyê “Şeri' û perstîş” de xepînokî ye. “Peyva ‘Bedî’ di ziman de bi wateya tiştên nu û nu peydabûye yan nu hatîye tê”⁶. Ciwankarî di ferhenga kurdî de jî bi van wateyan hatîye.

“Xemilandin, bukciwankirin. Yan: dest rengîn, Bi huner”⁷.

¹ İbin Menzur, Cemaleddîn Ebî Fezîl *Lîsan El-'Ereb*, cz.1, Dar El-Hedîs, Qahîre - Mîsir, 1423 h. – 2003 m, r.352

² H. b. , r.352

³ *Qurana Pîroz*, sureta El-Beqere, ayeta (117)

⁴ *Qurana Pîroz*, sureta Ehqaf, ayeta (9)

⁵ *Sehîha Muslîm* , j.1435.

⁶ Hûmayî, Celaledîn, *Finûn Belaxet we Sîna'at Edebî*, ç.26, Neşir Huma, Tehran, 1386 het, r.8

⁷ Hejar, *Hembane Borîne*, Ferheng (Kurdî-Farsî), ç.9, Întîşarat Siruş, Tehran, 1292 het. r.185

Peyva ciwankarî bi xwe navekî watayîye. Di alîyê pêkhateya morfolojî de Pêkhatîye ji berjenga kirekî a hevdayîye “Ciwankar” ligel “î” paşgira navê wateyîye. Bi vî awayî peyva “Ciwankarî” çêdibe. Bi wateya xemilandinê jî tê.

3.2. Ciwankarî di alîyê zarevayî de:

Di vî alî de jî ciwankarî wekî zaraveyekî wêjeyî di çend şeweyan de hatîye pênasekirin:

Ciwankarî: “*Zanîsteke şewaza gotinê lêkolîn dike, peyv û wateyan ciwan dike*”¹. Ciwankarî bi xwe jî xwe xerîkî alîyê sîmayê naveroka wan peyv û axaftinên ku bi şî dizanin ji bo ciwankirinê. Bi wateyek din ciwankarî: “*Ew ruyên taybete ku bi kartên ji bo ciwankarina gotinan*”². Ev jî di rêya hunerên ciyawaz de dibe, ku bi zagonên rêzimanî re derdikeve. Ne ji xwêre û bê armanc Bi kurtî ciwankarî wekî zaraveyekî ji zanîsta rewanbêjîyê ye: “*Pêktê ji xemilandin û ciwankirina gotinan, ku di alîyê rêzimanî ‘Sintaksî’ de tamam be û xeletî tê de nebe, di dem û cihê wê yê dîyar bê gotin, bandorîya wê li ser guhdarvan yan xwêner hebe*”³. Ev ciwankarîye her du alîyên rûxsar û naverokê di gire.

Cihê amajêye ew beşê rewanbêjî wekî du beşên din, rewanbêjên kurd her di destpêkê de di wêje ji rewanbêjên ereb wergirtîye. Têde ev hunera ciwankarî ku li gel taybetmendîyên zimanê kurdî di guncê dipexşan û malikên wêjeya kurdî de jî heye. Derxistine û qalkirîne. Destpêka nasandina vê zanîstê jî ji dîroka 'ereban tê ku di sala sêyema hicrî de “Ebdullayê kurê Mu'tez - 296 h. de mirîye” cara destpêkê bi şeweyekî zanîstî destur û zagonên vê zanîstê nivîsîye. Di pirtûka xwe a bi navê “Kîtab Elbedî'e” qala çend hunerên ciwankarîye dike.

¹ Xetîb El-Qezwînî, Celaledîn Muhemed bin 'Ebdulrehman, *El-Eyzah fî 'Ilûm El-Belaxe (El-Me'anî Wel-Beyan Wel-Bedî)*, t.1, Dar El-Keteb El-Îlmîye, Beyrut – Lubnan, 1424 h. – 2003 m., r.5

² Sekakî, Ebî Ye'qub, *Mîftah El-'Ilûm*, teh: Dr.'Ebdulhemîd Hîndawî, t.2, Dar Elketeb El-Îlmîye, Beyrut – Lubnan, 2011.r.532

³ Celaledîn Hûmayî, b. n. b. , r.8-9

Beşên Ciwankarî: Ciwankarî bi giştî dibe du beş:

3.3.Ciwankarîya Peyvî:

“*Divirde ciwanîya wê ji bo peyv û gotina wê tê girtin*”¹. Wate ciwankirina wê taybete di alîyê ji derve yê rûxsara gotinê. Xwe bi wate û naverokê ve xerîk nake. “*Ew ê ku taybetin ji bo ciwankarîya peyvan, herî zêde peywendîya wan bi çarçuveya axaftin û dengê peyvan ve heye. Bi şêwazekê ku eger wateya peyva wekî xwe bihêle û tenê şêweyê wê bi goherîn. Ev huner jî ji nav diçin*”². Ev cûr jî çend huneran dinav xwe de digire. Hinek ji wan jî çend cûrek din jê dibe. Ew a ku di şêweyekî dîyar û berçav di pirtûka “*Pendî Pêşînan*” ya Şêx Mihemedê Xal de reng dayîye. Jimara wan “13” hunere, Ev ji bilî hunera “*Serwadarî*” yê ku çar cûrên din ê serekî jê dibe û dikare bi şêweyekî serbixwe jî bin. Bi vî awayî komkirina hunera wan bûye “17”.

3.4.Ciwankarîya Wateyî:

“*Di vir de ciwanîya wê ji bo wateyê tê girtin*”³. Ciwankarîya wê taybete bi alîyê nava naverok û wateya peyvan. Xwe bi rûxsarê gotinê ve xerîk nake tenê bi wateya peyvan ve xerîk dibe. wate ciwanîya gotina wê bi wateyê ve girêdayî ye. Bi cûrekê “*Eger em goherîne di peyvan de bikin ji ber rastîya watan, qet goherînek di ciwanî ya mijarê de çênabe*”⁴. Ev jî hejmara hunera wan rêjeyekî zêde û ber fireh heye. Ew a ku me di “*Pendî pêşînan*” de destnîşan kirî jimara “30” ya hunerê ye.

¹ Fezil Hesên'Ebas, *El-Belaxe Finunuha We-Efnanuha ('Îlim El-Beyan Wel-Bedî')*, t.10, Dar El-Furqan Lineşir wetewzî', Êman - Erden,1426 h.-2005 m. r.276

² Muhemedî, Muhemed Husên, *Belaxet-Me'anî Beyan we Bdî'*, ç.2, Întîşarat Zovar, Tehran,1387 het. r.134

³ Fezil Hesên'Ebas, b. n. b. , r.276

⁴ Hûmayî, Celaledîn, b. n. b. , r.38

BEŞA YEKEM

1.HUNERA CIWANKARÎYA PEYVAN

1.1. Hevbêjî “Cînas”:

Yekeke ji hunera berfireh a serekîya ciwankarîye. Li ser bingeha wekhevî ya du peyvên û du hevokan çê dibe. Cîyawazîya wate jî mercekê serekîya çêbûna wêye, ji ber vê jî jêre dibêjin Havbêjî: “*Ji du peyvên di dema gotinê de wek hev û di wateya xwede jî ne wek hev pêktê*”¹. Yan jî bi awayekî hurtir havbêjî: “*Çend peyvekin di şekilde, ‘Wate di cur û jimare û rêza tîpan de’ wek hevbin yan jî nêzîkî yekbin, ku tenê yek mercên wan cuda be lê belê her yekê wateyek serbixwe hebe. Eger peyvên wan wateyên wek yekbin havbêjî çênabe*”².

Hevbêjî dibe du cûr: Tam û Ne tam

1.1.1. Hevbêjîya Tam: “*Ewe ku peyvên wan kitû mit şeklê wan wek yek bin. Wate: ‘Cur û jimare û rêza tîpan’ heman be. Lêbelê wateya wan cuda û serbixwe be*”³. Havbêjîya temam jî dibe çend curek wekî “Havbêjîya Havresen, Sade, lihevkirin Sawête, Muktenîf, Hevgirtîya belav, hevgirtîya merfîy a belav...” Ev cûrane jî rengvedana wan di pend û gotinên pêşîyan de kême. Tenê çend corek jê kême dibe. Temaşekirina me a di “Pendî pêşînan” ya Şêxê xal li gorî hebuna mînaka pendan ev corên he dikeve ber çavê me:

1.1.1.1. Hevbêjîya Temama Havresen: “*Peyvên hevbêjîyê pêwîste ji yek refêbin. Yan jî ser bi yek refa axaftinê bin. Wekî: Nav, Berjeng, Kar...hwd*”

⁴. Mînak:

¹- Elî Carim û Mustefa Emîn, *El-Belaxe El-Wazîhe (El-Beyan Wel-Me'anî Wel-Bedî)*, dar Tîba, dune sene el-tebi'.r.348

²- Gerdî, Ezîz, *Rewanbêjî (Rûnbêjî – Ciwankarî – Watanasî)*, Çapxaney Wezareti Perwerde, Hewlêr, 2002.r.82

³ H.b. , r.82

⁴ Dizeyî, Ebdulwahîd Mişîr, *Piragmatîk û Rewanbêjî*, ç.1, Nawendî Awêr bo çap û bilawkirdinewe , Hewlêr, 2015. r.134

“Pêş ewey biçîte naw bîr, bîr le hatnede rwet bike” r. 123

Di vê pendê de em dibînîn peyva “Bîr” du caran hatîye, her carê jî bi wateyekê. Di ya yekem de armanc wê lêdana bîrekê ye ev ê bîrê jî mirov ji bo pêwîstîyên xwe yê li ser xwezayê bi kartîne. Di vir de navê “Bîr” kınaye ye ji bo destpêkirina her karê ku mirov bi xwaze bike bi kartîne. Di ya duwem de jî “Bîr” Navekî wateyîye li ser armanca “Hizirkirinê ye” herdu peyv jî ser bi beşên axaftina navin.

1.1.1.2. Hevbêjîya Tam a Lihevkinê “Rêk”:

*“Peyvên vê hevbêjîyê ne ji yek refêne, her yek ji refên cudane”*¹. Bi wate jî ew e her yek ji peyvek û ji beşek ê axaftinê cudane. Weku yek “nav” be ewa din jî “Kar” be. Yan jî ji her beşên din yê axaftinê be.. Mînak:

“Qisey rast berde, rastgobe diro berde” r. 289

Di vê pendê de peyva “Berd” du caran hatîye. Di ya yekem de her bi wateya ew î “berdî” di siriştê de jî heye. Navekî berdeste, li gel “e” karê ne tamam demê niha pêk hatîye. Navê kevir jî demê bêye. “Berde” Firmana daxwazîye ji bo kesê duyemê kite. Ji koka çawîga “Berdan” û “e” cînavkê kesê duyemê kit çêdibe. Bi wateya dev jê berde hatîye.

1.1.1.3. Hevbêjîya Tam a Sade:

*“Ev curê havbêjîyê du peyvin, herdu jî sadebin û çî pêşgir û paşgîrek ne bin dinav de, rêgeza peyvên wan jî her çibe dibe”*².

“Daykî diz ya sing exwa, ya sing ekutê” r.187

Navê sing di vê pendê de, bi du wateyên cuda hatîye. Di ya yekme de bi wateye xwarina goştê singê balindeya tê. Di ya duyem de jî bi wateya singê mirov tê. Ku di dema şînê de bi taybet jin li singê xwe didin. Bi vî awayî havbêjîya sade a navê “sing” derketîye holê.

¹ H.b. , r.134

² Îdrîs 'Ebdulla, *Layene Rewanbêjîyekan le Şî'irî Klasîkî Kurdî da be Nimûney Hemdî û Hacı Qadirî Koyî*, Ekdîmyay Kurdî , Hewlêr, 2011. r.229

1.1.2. Hevbêjîya Ne tam:

Ev cûr jî di çarçûveya rêjeya zêde ya pend û gotinan daye. “*Peyvên wê kit û mit şêweyê wan ne wek hevbin. Ji sê mercên havbêjîya tamam: cûr û jimareya wan û rêza tîpên wan, yek jî yekê kêmtir be. Wate yan jî cûrên tîpên wan cudabin yan jimareya wan ne wek hevbin. Yan jî di rêzbûnêde cûda dibin*”¹. Ev cûr jî bi dayîna alîyekê a van mercan re dibe çend corek din. Em jî li gorî mînakên di “*Pendên pêşîyan*” ê Xal qala van cûran kirîye.

1.1.2.1. Hevbêjîya Netam a Zêde:

Ev jî du peyve tenê “*Di alîyê jimareya tîpênan de wek yek nebin, tîpek yan du tîp ji ewa din zêdetir be*”². Herwiha li gorî hinek Rawanbêjîyan a li ber çav kêbûna yek tîpêye. Bi havbêjîya “*Kêm*” ji hatîye bi navkirin. Ev cor jî bi hatîna tîpa destpêk navîn û dawîde ji peyvê çend corek cudabûye.

1.1.2.1.1. Hevbêjîya Netam a Zêdeya Mutrîf:

“*Ewe ku du peyv, tîpek yan jî du tîpên destpêkê ji peyva din zêdetir be*”³. Ev jî di alîyê zêdebûna tîpa destpêkê a peyvê de ji bo yek tîp du tîp û sê tîp dabeş dibe.

Yektîpî: “*Adare meşke le dare*” r.14:

Peyva “*Adar*” tîpa “*a*” ji peyva “*dar*” zêdetire. Ya zêdejî ketîye destpêka peyvê. Bi vî awayî jî hevbêjîya ne tam a zêdeya mutrîf pêkhatîye.

Du tîpî: “*Nexoşe şekir û şîrî pê xoşe*” r.410

Di vê pendê de peyva “*nexoş*” du tîpên destpêka “*n, e*” ji peyva “*xoşe*” zêdetire. Bi vî şêweyî hevbêjîya ne tamam zêde a mutrîf pêkhatîye.

Sê tîpî: “*Ewî helgirt şîmşêr, nabê giwê bidate şêr*” r.63.

¹ Gerdî, Ezîz, *Rewanbêjî (Rûnbêjî – Ciwankarî – Watanasî)*, r.83

² H. n. , *Rewanbêjî le Edebî Kurdî da (Ciwankarî)*, b.2, Çapxaney Şarewanî, Hewlêr, 1975. r.16

³ Îdrîs 'Ebdulla, *Layene Rewanbêjîyekan le Şî'irî Klasîkî Kurdî da*, r.235

Di vê pendê de jî peyva “Şimşêr” sê tîp “Ş, i, m” ji peyva “şêr” zêdetire. Ya zêde jî ketîye destpêka peyvê. Bi vî awayî jî hevbêjîya ne tam a zêdeya muterîf pêkhatîye.

1.1.2.1.2. Hevbêjîya Netam a Zêde ya Muktenîf:

“*Ewe ku du peyv bi tîpek yan du tîp ji navîna a din zêdetir be*”¹. Mînak:

“*Dar û dîwar giwêy heye*” r.182

Peyvên “dar û dîwar” havbêjî lê ketîye. Peyva duyem du tîpên “î, w” zêdetire ji peyva yekem. Ya zêdejî ketîye navîna peyvê. Bi vî awayî jî hevbêjîya ne temama zêde a muktenîf pêkhatîye.

“*Salê mal û salê minal*” r.239

Peyva “Minal” ku di dawîya gotinê de hatîye. Du tîpên “n, i” zêdetire jipeyva “Mal”. Ya zêde jî ketîya navîna peyvê. Bi vî awayî hevbêjîya ne tam a zêde ya muktenîf pêkhatîye.

1.1.2.1.3. Hevbêjîya Netam a Zêde ya Pêvekdar:

“*Ewe ku du peyvin havbêjîya wan jê dikevin. Ji wan yek tîpek yan du tîp ji ya din zêdetire. Hinek caran jî di dawîya peyvê de havbêjîya wan sê tîpan jî zêde dibe*”². Mînak jî li ser bi vî awayîye ku dibêje:

“*Şê base, şêteza xirape*” r.270

Di vir de havbêjî di navbera peyva “Şê û şêteza” de çêbûye. Peyva “Şêteza” sê tîpên dawî ji peyva “şê” zêdetire. Bi vî awayî hevbêjîya ne temama zêde a piştevan çêbûye. Herwiha di vê mînakê de:

“*Nimek exwa û nimekdan edrênê*” r. 413

¹ H. b. , r.236

² Merîwan Husên Ferhan, *Ciwankarî le Şî'irî Wefayî da*, Tezê Master, Zankoy Silêmanî, Fakultî Zanîste Mirovayetîyekan, Sikûlî Ziman, Beşî Kurdî, 2015. r.49-50

Di vê pendê de peyva “Nîmekdan” sê tîpan ji peyva “Nimek” zêdetire. Ya zêde jî li dawîya peyvê hatîye. Bi vî awayî hevbêjîya ne temama piştevan di vê pendê de çêbûye. Di vê pendê de peyva “Nimekdan” sê peyvan ji peyva “Nimek” zêdetire. Ya zêdejî li dawîya peyvê hatîye. Bi vî awayî havbêjîya Pêvekdar di vê pendê de çêbûye.

1.1.2.2. Havbêjîya Ne Tam a Cuda:

Ev havbêjîye jî peyva “*Ji yek cudane tîpek yan du tîp Lêbelê cihê gotina wan a di devde nêzîkî heve*”¹. wekî tîpên: “/P/- /B/- /M/..., /Ş /- /J/... /Ç/- /C/, ...hwd.Mînak jî wekî van pendan û gotinane.

“*Heta hete, 'alem birate'*” r.428

Havbêjîya netemama cuda di peyvên “heta, hete” pêkhatîye. Cîyawazîya wan di tîpa dengdar deye. A yekem dengdara dirêje “a” ya duwem jî dengdara kurte “e”. Cihê gotina wan nêzîkî yeke lê wateya wan cudaye.

“*Adar narwa bebê do, nîsan narwa bebê co*” r.13

Di vir de hevbêjî ji her du peyvên “do, co” ketîye. cîyawazîya wan jî di tîpa destpêkê deye. /d/, /c/.Ev her du peyv jî di cihê gotinê de nêzîkî hevin. Ji ber vê jî hevbêjîya ne tam a cuda pêkhatîye.

1.1.2.3. Hevbêjîya Lahîq:

Peyvên vê cora hevbêjîyê jî “*Ciyawazîya wan heye di wekhevîya tîpan de.Lê belê cihê gotina wan ya di dev ne nêzîkî yekin*”². wekî: Tîpên “/d/- /x/..., /b/- /h/..., /p/- /q/...” cihê tîpên wan jî di kare li her cihekî ya peyvê bin.

“*Gewre delên le xana, giçke degêrnewe le banan*” r.332

Peyvên “Xana, Bana” havbêjî jê ketîye di cora lahîq de. Ev jî di destpêka tîpa serî deye. “x” di yekem de “b” di duyem de çêbûye.Cihê gotina

¹ Sekakî,Ebî Ye'qub, b. n. b. , r.539

² H. b. , r.540

her du peyv an jî di dev de ji yek dure. Ya yekem dengekî xişika nerme nêzîkî qirikê ye. Ya duyem jî dengekî lêvîye.

“Eger merim ne dîtîbê le herêza, pişqilim dîwe le perêza” r.34

Hevbêjî di peyva “herêza, perêza” ketîye, tenê di tîpa yekem de cudane ew jî tîpa “h” ku dengekî qirigîye. “p” di peyva duyem de ku ew jî dengekî kipa lêvîye. Bi vî awayî çêbuna her duyan di dev de ji hev dur e bûne. Hevbêjîya lahîq jî pêkhatîye.

1.1.2.4. Havbêjîya Ne tam a Hev Wezin “Hev kêş” :

Ew peyvên ku ev havbêjî jê dibin pêwîste li ser yek wezinê bin. Ji bo çêkirina wezna peyv an ev merc hatîne danîn:

“1- Pêwîste jimareya tîpên wan yeksan be.

2- Pêwîste cîyawazîya wan di şeweyê zêdebûnê de du tîp be.

3- Pêwîste tîpên dengdêr wek yekbin. Ew cîyawazîya ku heye pêwîste tîpên dengdar be” ¹.

Mînak:

“Deng ekem bednawim, deng nakem tengawim” r.198

“Bednaw, Tengaw” Cîyawazîya her du yan di tîpên dengdar deye. Ji mareye rêza her du yan paşve yeksane. Dengdêrên wan jî gohertin bi ser wan de ne hatîye. Bi vî awayî wezina her du peyv an jî hatîye dîyarkirin. Ji ber vê jî havbêjîya ne temama wezin çêbûye.

1.1.2.5. Hevbêjîya Berevajî:

Ev hevbêjîye di rêxistina tîpan de du peyv ne wek hev in. *“Ev cîyawazî jî di navbera tîpên hevbeş ên peyvên dane”* ². Ev jî di wê demê dibe *“Jimare û corê tîpên wan wek yekbin. Lê belê rêza tîpên wan ne wek yekbin. Tîpên wan*

¹ Îdrîs 'Ebdulla, *Kowanekani Rewanbêjî*, ç.1, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2013.r.24

² Şemîsa, Sîrus, *Nîgahî Taze Be Bedî*, ç.14, Întîşarat Fîrdews, Tehran 1383 het. r.70

berevajî bin û cihê wan serbu bin bin”¹. Mînak: Peyvên wekî “reş, şer”, “hûr, rûh” ev jî bi du awayan dibe.

1- berevajîya wan hemu tîpên peyvê digire. Eger yek peyv be ciwantire û dibe serwadara mitewazin “hav wezin” mînakên wê jî di vî corî de kêm çêdibin. Ev jî ji ber taybetmendîya çêbuna wane.

“*Wek kew çû*” r.419

Peyvên “wek, kew” di alîyê tîpan de yeksane. Herwiha di şêwe û corê wan de jî wek yekin. Tenê di rêzbûna wan de ciyawazî heye. Ciyawazîya wan jî hemû peyvê girtîye. Her peyvekî berevajî bê xwendin wê peyva din derbikeve holê. Bi vî wayî hevbêjîya berevajî pêkhatîye.

2- Berevahîya wê beşek ji peyvê digire. “Jêre dibêje cihgohertina kertî”².

“*Berdêk nadan pîxate gomewe, besed dana dernayêt*” r.91

Peyvên wekî “nadan” û “dana” di alîyê corê peyvê de wek yekin. Lêbelê di rêzbunê de ne wek yekin paş û pêş û cihê wan hatîye gohertin. Lê hemuyan tîpên wan ji yek corê ne. Her çîqa di peyva yekem de tîpa “n” du caran hatîye jî, lê belê bandorê li ser hevbêjîyê nekirîye. Bi vî awayî di vê pendê de havbêjîya girtina dest çêbûye.

1.1.2.6. Hevbêjîya Kertî:

Ev hevbêjî ji yek ji wan kerta peyva din be. “*Ev jî bi vî awayî dibe ku a duyem kertîya a yekme be. Bi vê re jî tîpên peyva duyem ji ya peyva yekem kêmtir dibe. Ji xeyrî wateya wan cudabe, her wiha mercên wê li pey hev bîn. Nabe peyvek yan jî kurte hevokek bi keve dinavbera wan de*”³. Ev cor dikare bibe havbêjîya zêde jî. Em dikarin bêjin: Hemu havbêjîyên kertî havbêjîyên zêdeye jî, lêbelê hemu havbêjîyên zêde nabe hevbêjîyên kertî. Mînak:

¹ Gerdî, Ezîz, *Rewanbêjî le Edebî Kurdî da (Ciwankarî)*, r.23

² Îdrîs 'Ebdulla, *Layene Rewanbêjîyekan le Şî'irî Klasîkî Kurdî da*, r.240

³ Komelêk Mamostay Zanko, *Kurdolocî*, ç.4, Çapxaney Minare, Hewlêr, 2009. r.169

“*Ker ke coy dî ka naxwat*” r.302

Amraza “ke” kertîya peyva “ker” e. Raste rast lidawî hatîye, bi vî awayî jî havbêjîya kertî çêbûye.

1.1.2.7. Havbêjîya Ne tam a Hevrêgez:

Pêktê ji havbêjîya “*Peyvên wan di jimarê de û şêwe û rêzbuna wan dikare ji hev cuda be. Lêbelê her dukyan yek kokyan heye*”¹. Wate di ferhengê de ji yek kokê hatîye. Mînak:

“*Yekê mirdû yekê mirdar bû, yekê be tîrî xuda girftar bû*” r.454

Peyva “Mirdû” li gel “Mirdar” her du jî di gelek alîyan de ji hev cudane. Lêbelê di ferhengê de ji yek kokê ne ew jî “Mirdin” e. Bi vî awayî hevbêjîya hevrêgez pêkhatîye.

“*Ziban parêzgarî, eger parastit detparêzê*” r.232

Di vir de peyvên wekî “Parast” û “Parêz” di alîyê rêzbûn û cûr û jimareyê de ji yek cudane. Lê belê di ferhengê de ji yek kokê ne, ew jî koka “Parastin” e. Herwiha peyva “Parêzgar” di beşê yekem de ev jî ji koka “Parêz” a parastinê hatîye. Bi vî awayî jî hevbêjîya netemam a havrêgez çêbûye.

1.1. 2.8. Hevbêjîya Dupat:

Bi hebuna pendên pêşîyan ev corê hevbêjîye hatîye dîyarkirin. Bi vî awayî hatîye pênasekirin. “*Ew her du peyvên hevbêjî jê dikeve. Pêwîste li gel hev hatibe, her wiha merca peyva duyem du tîp ji ya yekem zêdetir be. Pêwîste a zêde di dawîya peyvê de hatibe*”². Dikare a zêde ji du tîpan zêdetir bigire. Di vî havbêjîyê de peyva yekem dibe beşek ji peyva duyem. Bi vî awayî jî

¹ Îdrîs 'Ebdulla, *Şêwaz*, ç.1, Çapxaney Minare, Hewlêr, 2012, r.108

² Gerdî, Ezîz, *Rewanbêjî le Edebî Kurdî da (Ciwankarî)*, r.25

havbêjîya zêde çêdibe. “*Hemu hevbejîyên dupat havbêjîyên zêde ne. Lê belê ne şerte ku hemu havbêjîyên zêde bibin havbêjîyên dupat*”¹. Mînak:

“*Heqe, heqdarim, beşe beşdarim*” r.160

Peyva “Heq” di rêza yekem a pendê de bûye beş jî ya duyem. “heqdar”, zêdebûna peyva duyem jî ketîye dawîyê. Bi vî awayî jî hevbejîya dupat pêkhatîye. Her wiha di rêzika duyem de jî heman gotin peyva “Beş, Beşdar” hatîye. Di vir de peyva yekem bûye beşek ji peyva duyem. Ya zede jî sê tîpe ketîye dawîya peyva duyem. Bi vî awayî di vê pendê de hevbejîya dupat çêbûye.

“*Ke kes nebû min şay kesanim*” r.298

Di vir de amraza “Ke” beşek ji peyva “kes” e di pêşîya destpêka gotinê de hatîye. Bi vî awayî havbêjîya dupat çêbûye.

1.2. Serwadar “Secî” :

Ev jî yek ji hunera giring a ciwanîya peyvane. “*Serwadar di pexşanê de wekî qafîye yek a di helbestê de ye*”². Bi vê re “serwadar” heman xasyeta “Serwa” ya helbestê werdigire. Serwedar jî “*Ji wekhevîya dawîya gotinê bi yek peyv be*”³. Wate: “Peyva dawîya hevokan di tîpa dawî de wek hevbin”⁴. Bi yekbûna tîpa dawî de dikare zêdetirî yek tîpê jî bigire.

Serwedar rol û girîngîyekî bi bandor heye di parastina wateya pend û gotinan de. “*Berhemên serwedar her çiqas hebe ji, pend, metelok û helbestê giringin. Ji ber ku peyvên serwedar dengê dawîya wan wek heve. Di mejî de baştir berbi yek diçin di yek xalê de girêdidin û zutir tîn bîra mirovan*”⁵. Mirov her tim dixwaze kurtirîn îfadekirin û peyv bêje. Pend û gotinên pêşîyan jî yek ji van gotinane ku kurtin û xwedî wateyên mezinin. Ji bilî pend û gotinan

¹ H. b. , r.26

² Sekakî, b. n. b. , r.542

³ Îbin El-Esîr, *Mesel El-Saîr fî Edeb El-Katib We-Şa’îr*, teh: Muhemed Mihyedîn, cz.1, El-Mektebe El’Esrîye, Seyda, Beyrut- Lubnan, 1431 h. – 2010 m. r.195

⁴ Îbrahîmî, Muhemed Se’îd, *Geştê le ‘Îlmî Belaxe (Me’anî, Bedî’, ‘Eruz, Qafye)*, Azerbaycanî xerbî, Mihabad, 1364 het. r. 82

⁵ Gerdî, Ezîz, *Serwa*, ç.1, Dazgay Aras, Hewlêr, 1999. 38

ya herî zêde - ewên ku du beşin - ev jî beşên serwedare ne. Ev jî hinek di alîyê kiteyê de hev wezin li gel hev. Ji bilî serwaya wan, eger wezin jî beşdar bike hev wezin bin, ev jî temenê pendê dirêjtir dikin. Awayê gotinê xweştir û bi coştir dikin. Ciwanîyek din bi pendê di beşîne.

Mercên çêbûna Serwedare:

1-“*Peyv lipey wateyê dikeve*”¹: Wateya wan amade be piştire xistibe çarçûveya peyvê de.

2-Pêwîste, “*Her yek ji hevokên serwedare wateyek cuda ji ya din rabigihîne*”². Li gelvê jî pêwîste “*wekhevîyek li gel hev hebe na be ji hev durbin*”³.

3-Di serwadarî yê de “*Pêwîste peyvên wan nerm û nazik be... Ew hevok beramberî yek bi sekinin û tîpên dengdêr û dangdar yek awazên wan hebin*”⁴.

Hunera serwayê jî dibe çend beşek:

1.2.1.Serwedare Di Alîyê Kurtî û Dirêjîya Hevok û Pajeyan De:

1.2.1.1. Serwedariya Kurt: Ev jî sinorê hevokan dîyar dike di kurtîyê de.Kurtirîn helwest û hevoka serwedariyê “*Ewe ku hejmara kiteyên pajeyê ji “10” kite zêdetir nebe*”⁵. Ev cûr jî zêde pend û gotinan di nava xwe de digire. Ji ber ku ev kuert û zelalin wisan dikin di kurtîrîn dem de bên pêşkêşkirin. Mînak:

“*Ser bide, sir mede*” r.243

Hevoka yekm û ya duyem her yek ji wan ji “3” kiteyan pêk tê. Ji ber vê jî serwedariya kurt lê ketîye. Di vê mînakê de jî:

¹ Gerdî, Muhsîn, *Beharî Rewanbêjî (Watanasî – Rûnbêjî – Ciwankarî)*, ç.1, Çapxaney Narîn, Hewlêr, 2013. r.274

² H. b. , r.274

³ Secadî, Elaedîn, *Xoşxwanî (Guzarekarî- Rewankarî- Ciwankarî)*, Çapxaney Zankoy Selahedîn, Hewlêr, 1986. r. 141

⁴ H. b. , r. 141

⁵ Gerdî, Ezîz , *Rewanbêjî le Edebî Kurdî da (Ciwankarî)*, r.36

“Zistana agir û ez, be haran ez û bez, hawînan ez û rez” r.233

Ev pend jî ji 3 pajeyan pêkhatîye. A yek ji “7” kiteye, duyem û sêyem jî “6” kiteye. Bi vî awayî serwadarîya cûrê kurt ji bo van pajeyan çêbûye.

1.2.1.2.Serwadarîya Dirêj:

Di vê cûrê de jî hevok dirêjtire ji xala destpêkê. Ev jî dema ku dibe *“Hejmara kiteya pajeyên wan ji “10” kiteyan zêdetir be”*¹. Ev şêwe jî rêjeya wan kêmtire ji ya pendên pêşîyan.

Mînak: *“Eger xwa balî be huştirbidaye, ebwaye serbanman gişt bi rûxaye”* r.30

Di vir de beşê yekem û beşê duyem jî ji “11” kiteyan pêktê. Ev jî zêdetire ji “10” kiteyan ji ber ku, serwedara dirêj tê de çêbûye. Di mînakek din de dibêje:

“Seru malim le to dirêxî nîye, bizin le çarde şayî kemtir nîye” r.244

Di vir de beşê yekema goitnê ji “11” kiteyan pêkhatîye. Beşê duyem jî ji “12” kiteyan pêkhatîye. Ev cûr jî her yek di beşên xwe de serwedara dirêjin.

“Kes nazanê be nefsî kê rizgarî ebê, kesîş nazanê be nefsî kê giriftar ebê” r.309

Ev jî yek ji gotinên pêşîyane û şêweyekî pexşan jî heye. Beşê yek ji “13” kiteyan pêkhatîye, beşê duyem jî ji “14” kiteyan pêkhatîye. Ji ber vê jî her yek ji van serwedara dirêjin.

1.2.2.Serwedara Di Alîyê Wezin “Kêş” a Hevok û Pajan De: Ev cûr jî dabeşbuna serwedare li ser bingeha beramberîya hejmar, hevok û helwestê pêkhatîye. Wezina hevokan li gorî kiteyan tê dîyarkirin. Ev jî dibe çend beşek. Wekî me li jêr dayî dîyar kirin.

¹H. b. , r.27

1.2.2.1. Yeksanbin: Wate: “*Her du paje jê di alîyê wezinê de wek hevbin. Hejmara kiteyên wan jê wekê yek be*”¹.

“*Ew nane nane, emro le xwane*” r.53

Ev pend jê belgeya wê di alîyê beramberîya hejmara kiteyên wê ên wek hev deye. Her yek ji “5” kiteyan pêkhatîye, bi vê re jê serwedariya Yeksan pêkhatîye. Di mînakek din de dibêje:

“*Gule jale, belê ale, belam tale*” r.337

Ev jê ji sê pajan pêk hatîye. Her pajeyek ji “4” kiteyan pêktê. Bi vî awayî her sê jê yeksanin di beraberîya wezinê de. Di bê pendê de jê dibêje:

“*Heta gindor gindor bû, xizmê me gelek zor bû, gindor hate biranê, xizim hatine qiranê*” r.427

Ev pend jê ji çar kurte hevokan pêkhatîye, her hevokê ji “7” kiteyan çêbûye. Ev jê wisan kirîye ku di alîyê wezinê de wek yekbin.

1.2.2.2. Ne Yeksanî Di Herdu Paje yan Du Hevokan De: Ev jê di wê demê de pêwîste serwadar tenê di dawîya pajeyê de çêbibe. Di wezinê de ne yeksanbe, Yan jê di hejmara kiteyan de ne yeksan be. “*Helwest ‘paje’ ya yekem ji helwesta duyem kurtir be*”². Yan jê ya duyem ji ya yekem kurtir be di hejmara kiteyan de. Mînak:

“*Mirdin kerî decale, le hemu male*” r.384

Ev pend jê ji du beşan pêk hatîye, beşa yekem “7” kiteyan pêk hatîye û dirêjtire ji beşa duyem ku ew “5” kiteye kurte. Mînak:

“*Ho ho ye, her kes bo xoye*” r.448

Ev gotin jê ji du kurte hevokan pêkhatîye. Kurte hevoka yekem di alîyê hejmare ya kiteyan de kurtire ji kurte hevoka duyem, ya yekem “3” kiteye û

¹ H. b. , r.27

² H. b. n. b. , r.38

ya duyem jî “5” kiteye. Bi vî awayî jî serwadarîya ne yeksana du kurte hevok çêbûye.

1.2.2.3. Ne Yeksanîya Tevlîhev: Di vir de jî ne yeksanîya wan zêdetirî du paje û hevokane. Yek ji wan wezina wê cuda dibe, ew a din jî hev wezin dibin di hejmara kiteyan de yan jî her yek ji wan ji çend kiteyan pêktê. Dema cîyawaz dibin di hejmara wan de hev wezin nabin. Di hejmarê kitan de jî ji yek yan çend kiteyekê pêktê. Ev jî cîyawazbin di hejmarê de jî ne wezin bin.

“Reqe wek tû, reşe wek mû, dewletî bawkî eyda be şû” r.221

Ev gotin jî ji sê kurte hevok pêktê. Kurte hevoka yekem û duyem her yek ji “4” kiteyan pêktê. Lê belê kurte hevoka sêyem ji “9” kiteyan pêkhatîye. Di vir de cîyawazîya wan di nava kurte hevokan de ye ew jî di wezina wan de ye. Di vir de jî serwedara ne yeksana tevlîhev çêbûye. Di vê mînakê de jî:

“Demim nebê hakem, pê m nebê rakem, qûrî kwê beserakem” r.197

Wezna vê kurte hevokê jî di vê pendê de cudaye qet ne wek hevin. Ya yekem ji “6” kiteyan, ya duyem ji “5” kiteyan û ya sêyem jî ji “7” kiteyan pêktê. Ji ber vê jî hejmara kiteyên vê pendê ji hev cudaye. Ji ber vê jî di alîyê weznê de serwadarîya ne yeksana tevlîhev çêbûye.

1.2.3. Serwadarî Di Alîyê Wezin û Serwayê De:

Di vî alî de serwadarî çend corek jê cuda bûye. Hinek ji wan bi awayekî serbixwe ji bo ciwankarîya peyvan hatîye danîn. Di vê dabeşkirina serwadarîyê de cûrên wê li gorî kite û tîp û serwaya hevokan hatîye dabeşkirin. Misogerî li ser peyva dawî a hevokê hatîye kirin. Li gorî dengên dawîya van peyvan hatîye danîn. Ji bilî vê kite û wezin jî rolekî girîng heye di dabeşkirina corên serwadarîyê de. Serwadar di vî alî de dibe çend beşek:

1.2.3.1. Serwadarîya Hevrû “Mitewazî” :

Peywendîya vê jî bi kiteya peyv û tîpa “rewî” di peyvên serwadarîyê de heye. Bi vî awayî hatîye pênasekirin. *“Ewe ku di dawîyê de du hevok li cihê*

hev tèn. *Ev jî di alîyê wezin, hejmar, tîp û tîpa dawî “tîpa rewî” de ku di binçîneya serwadarîyê de sekinîye û serwadarîya wê li ser wê yekin*”¹. Di vir de ne şerte ku em xwe mecbûrî du hevok yan jî du kurte hevokan bikîn. Belkû di kare hevok û kurte hevokên zêde jî dinav xwe de bigire. “*Ev jî wisan dibe pêwîste du paje yan jî zêdetir bi cihê yek de bèn. Peyva dawî di alîyê serwayê ve yekbin*”². Evê cora serwadarîyê di gelek pend û gotinan de rengvedan daye. Mînak:

“*Hefî bimrê le bawan, Klî nabirê le çawan*” r.160

Ev pend jî ji du kurte hevokan pêkhatîye. Kurte hevoka yekem bi peyva serwadarîya “Bawan” bi dawî hatîye. Kurte hevoka duyem jî bi peyva serwadarîya “Çawan” dawî hatîye. Her du peyv jî hevwezin û hevserwan bi vê re jî serwedarîya Hevrû pêkhatîye. Her wiha di vê pendê de jî dibêje:

“*Qise bî gêje û bî bêje û bî wêje*” r.286

Ev jî ji sê kurte hevokan pêk hatîye. Peyvên serwadar jî ji “Gêje, bêje, wêje” pêkhatîye. Her sê peyv jî hev wezin û hev serwa ne. Bi vî awayî jî serwadarîya Hevrû pêkhatîye. Di vê pendê de jî dibêje:

“*Le malewe brêşke exwa, Le derewe be sabûn dest eşwa*” r.360

Ev pend jî ji du kurte hevokan pêk hatîye. Dawî Kurte hevokên wê jî pêktên ji “Exwa, eşwa” di alîyê wezin û serwayê de wekî yekin. Ji ber vê jî serwadarîya Hevrû pêkhatîye.

1.2.3.2. Serwadarîya Hevwezin “Mitewazin, Miwazene”^{*}:

Ev hunere “*Cûrek ji Serwadarîyê ye*”³. Bi gelek navên cuda hatîye. Bi vî awayî jî hatîye pênasekirin. “*Çend serwayeke di çend hevokên li pey hev de*

¹ Secadî, Elaedîn, *Edebî Kurdî û Lêkolînewe le Edebî Kurdî*, Çapxaney Me'arif, Bexda, 2667 ku . – 1967 z. r.145

² Gerdî, Ezîz, *Rewanbêjî le Edebî Kurdî da (Ciwankarî)*, r.40

^{*} Ev hunere jî di pirtûka rewanbêjan de bi du şêwe a cuda, cihê wê hatîye dîyarkirin, hinek jî li gel cûrên serwadarê danîne hinek din jî bi hunerekî serbixwe li gel cûrên ciwankarîya peyvî

çêdibin. Di weznê de ru be ruyê yek tên. Lê belê di tîpa dawî ya “rewî” de cudane”¹. Yan jî bi wateyê din hatîye eşkere kirin, serwadarîya hevwezin ew e ku “Peyvên wê tenê du hevok di wezinê de wek hev bin û pêwîste tîpên dawî wek yek ne bin”². Peyvên dawî hevwezînin, lê belê serwadarîya wan cuda dibin. Mînak wekî van pendên me li jêr dayî dîyarkirin.

“Sal be sal, xozge be par” r.239

Ev pend jî ji du kurte hevokan pêk hatîye. Kurte hevoka yekem bi peyva “Sal” dawî hatîye. Ya duyem jî bi peyva “Par” dawî hatîye. Her du peyv jî di weznê de wekî yekin. Lê belê di serwayê de tîpên wan ên dawî cudane. Ev jî evin “l, r”, bi vê re jî serwadarîya hevwezînin pêkhatîye.

Mînakek din di vê pendê de jî dibêje:

“Westay necar, binû bê xem û xeyal, xwa yeke û dergey hezar” r.416

Ev pend ji sê pendan pêkhatîye. Her kurte hevokê bi peyvekê dawî lê hatîye ku hunera serwedarî tê de derketîye holê. Ew jî di kurte hevoka yekem de “Necar” e di ya duyem de jî “xeyal” û di ya sêyem de jî “Hezar” e. Her sê jî ji wezna hevbeşin. Lê belê “Xeyal” serwaya cudaye ji her du peyvên din, cudahîya wê jî di tîpa dawî de ye. Ji ber vê jî serwadara hevwezînin pêkhatîye.

1.2.3.3. Serwadarîya Hevser, “Mutrîf”:

“Ew e ku ciyawazîyek heye di alîyê weznê de. Di alîyê tîpa rewî de wekî hevîn, ew wekhevî jî di dawîya wan de ye”³. Tîpên dawî wek hevîn, lê belê di wezinê de ciyawazînin.

“Rast be rastî, xwar be şkestî” r.219

qalkirîne. Êm jî bi pişt girêdana bi çavkanîyên nu bi taybet di alîyê rewanbêjên kurd ev hunera me li gel cûrên serwadarê rêzkirîne.

³ Îdrîs 'Ebdulla, *Layene Rewanbêjîyekan le Şî'irî Klasîkî Kurdî da*, r.276

¹ Secadî, 'Elaedîn, *Xoşxwanî*, r.142

² Îbrahîmî, Muhemed Se'îd, b. n. b. , r.84

³ 'Itîq, 'Ebdul'ezîz, *'Îlim El-Bedî'*, Dar El-Nehze El-'Erebîye, Beyrut- Lubnan, Dune Sene Elteb'. r.217-218

Ev gotin ji du kurte hevokan pêk hatîye. Her kurte hevokê bi tîpa serwadar dawî hatîye. Di peyva yekem de “rastî” e di ya duyem de jî “şkestî” ye. Ev her du peyv jî serwaya wan yekin. Lê belê di wezinê de ciyawazin. Bi vî awayî jî serwadara hevser pêk hatîye.

“*Roj bû be sal, sik bû be cewal*” r.223

Ev pend jî dawîya kurte hevokên wê ji “sal”, “cewal” pêktê. Serwaya wan yeke, lê belê wezina wan cudaye.

1.2.3.4.Serwadarîya Tersî':

Cûrek ji cûrên serwadarîyê ye, di ciwankarîya peyvên de bi kartê. Ev jî dema dibe “*Di du hevokan de peyvên wê bi hev re du bi du serwadarîya hevru hebe*”¹. Wate: “*Her peyvek ji peyva beşa yekem yeksane bi her peyvek ji peyva beşa duyem, di wezin û serwadarî yê de*”². Li gel wê jî pêwîste hemu yan jî zêdeyî peyvên di wezin û serwadarê de hevbeşbin. Merce ku di nav hevok û kurte hevokan de hev cih bin. Ev cûra ciwankarî yê jî hinek wan pend û gotinan di nav xwe de digire. Ji du beşan pêk hatîye. Tersî' jî dibe du cûr.

Tersî'a Tam û Tersî'a ne tam.

1.2.3.4.1.Tersî'a Tam:

“*Ew e ku hemu peyvek di peyvên beşa yekem de yeksan be. Di gel her peyvek di peyvên beşa duyem, ji her du aliyê wezin û serwadarîyê de yek be. Bêyî ku ciyawazîyek bi keve di nav bera peyvên de. Ev jî bi kêmbûn yan jî zêdebunê çê dibe*”³. Çêbuna vî corê tersî'ê şêwazê gotinê teng dike. Bi van mercan jî: Yeksanîya her du hevok û kurte hevokan. havserwayê û hevwezîna û hevcihê di herdu beşan de ye. Ji ber vê jî ev cûr zêde kêm çêdibe.

¹ Muhemedî, Muhemed Husên, b. n. b. , r.126-127

² Îbin El-Esîr, *Mesel El-Saîr fî Edeb El-Katîb We-Şa'îr*, cz.1 , r.258

³ 'Elewî Yemînî, Îmam Yehya, *El-Turaz Lîesrar El-Belaxe Wel- 'Ilûm Heqâiq El-Îcaz*, teh: 'Ebdulhemîd Hîndawî, cz.2, El-Mektebe El-'Esrîye, Seyda, Beyrut- Lubnan, 1429 h.-2008 m, r.194

Tersî' jî di pend û gotinan de şêwazên taybet digre, ji ber kurtîya hevok û kurte hevokan. Bi temaşekirina “Pendî pêşîyan” yê Şêxê Xal ji bo ev cûrê tersî'ê jî ji van mînakên pêktê:

“ *Rez bo rezewan, bez bo berzewan* ” r.220

Ev pend ji du kurte hevokan pêkhatîye. Peyvên kurte hevoka yekem yeksan û beramber a peyvên ya duyem:

Rez, bo, rezewan

Bez, bo, berzewan

Evane hem di wezinê de û hem jî di serwayê de yeksan û beramberin. Bi vî awayî jî tersî'a tam pêkhatîye.

1.2.3.4.2.Tersî'a Ne Tam:

Ev core jî sinorê şêwazê gotinê bi nemana yek ji mercan, ber firehtir dibe ev jî bi cîyawaze ji wezin yan serwadarî ya peyvek yan jî hinek ji peyvên beşekî du pajeyîne.Ev jî bi cîyawazîya wezin û serwadarîya wan pêk tê. Carna jî “*Wezna peyvan cîyawazîyê têxe di nav de. Lê belê di serwayê de yeksan dibin*”¹. Carna jî “*Wezina peyvan yeksan dibe lê serwadarîya wan jî yeksan dibe yan jî nêzîkî hev dibin*”². Wezina wan di be yek lê serwaya wan cuda dibe.Mînak:

“*Adar narwa be bê do, nîsan narwa bebê co*” r.13

Weke ku em dibînin di vê pendê de peyv û kurte hevokên her du beşan jî yeksane û berambere li gel yek di alîyê weznê de.

Adar, narwa, bebê, do

Nîsan, narwa, bebê co

¹ B. n. b. , r.195

² Haşimî, Seyid Ehmed, *Cewahîr El-Belaxe fî El-Me'anî Wel-Beyan Wel-Bedî'*, t.3, Dar El-Keteb El-Îlmîye, Beyrut- Lubnan, 1427 h.-2006 m, r.250

Lê belê ji bilf alîyê serwayê di peyva “adar” di destpêka beşê yekeme û “Nîsan” jî di destpêka beşa duyem daye. Serwaya wan ciyawaze. Bi hebuna vê ciyawazîyê di serwaya peyva yekem de tersî'a ne tam ji bo pendê derketîye holê. Di vê mînakê de jî dibêje:

“*Deng ekem bednawim, deng nakem tengawim*” r.198

Ev pend jî ji du kurte hevokan pêk hatîye. Peyvên kurte hevoka yekem hev serwa û berambere di gel kurte hevoka duyem de. Di alîyê weznê de jî peyvên wê hev weznin ji bilf peyva “Ekem” di kurte hevoka yekem de û peyva “Nakem” di kurte hevoka duyem de, ku wezina wan cudaye.

Deng, ekem, bednawim

Deng, nakem, tengawim

Bivî awayî tersî'a ne tam çêbûye.

1.3. Patkirin:

Ew ku “*Yek peyv du caran li pey hev dubare dibe*”¹. Yan jî bi awayekî eşkeretir, Patkirin “*Pêktê ji dubare kirina peyvan yan jî hevokan ji bo armançek dîyar*”². Patkirin pêwîste ji bo çend armançekî dîyar û patkirî be. Ji bilf peyvan dikare hevok jî bê patkirin. Her wiha merce ku ew peyv û hevokan patdikin pêwîste di alîyê rûxsarde hevşewebin. Eger wateya wan jî cuda be patkirin çênabe belku dibe hevbêjî.

Patkirin di çend alîyan de dabeş dibe:

1.3.1. Patkirin di alîyê mebestê de: Di vî alî de dabeşî ser çend mebestê dibe.

1.3.1.1. Ji bo mebesta eşkerekirina hestan û ecêbîyê:

“*Oxey oxey leminê, mêrde witî çilminê, ga derke le herzinê*” r.25

¹ Şemîsa, Sîrus, b. n. b. , r.85

² İbin El-Esîr, *Mesel El-Saîr fî Edeb El-Katib We-Şa'îr*, cz.2 , r.146

Di kurte hevoka yekem de destpêka gotinê de peyva ‘‘Oxey’’ . ku îbaret di gotinê de hest û xweşî dike. Bi awayekî balkêş dupat dike.

1.3.1.2. Ji bo mebesta a Jê bawerî û Misogerkirinê:

‘‘Her xwa xwa ye, dinya ka û baye’’ r.433

Di vir de patkirina navê ‘‘xwa’’ ji bo mebesta jêbawerîya misogerîya di mayîna cudatîya perwerdgar de hatîye. Peyva ‘‘Her’’ armanca wê zextkirina zêde eşkerekirinê ye.

1.3.1.3. Ji bo bawerî û eşkerekirina çawenîya Firmanekê:

‘‘Be zîstanan pîne û pero, be hawînan wird wird biro’’ r. 80

Patkirina ‘‘Wird wird’’, di vir de ji bo armanca bawerî û eşkerekirina şêwaz û çawenîya bi cih anîna firmana ‘‘Bro’’ ya pendê hatîye.

1.3.1.4. Ji bo mebesta nîşandan û eşkerekirina zêdetir ya tiştêkî yan rewşekî:

‘‘Ko ko le ho ho ebê’’ r.322

Patkirîya ‘‘Ko ko’’ û ‘‘Ho ho’’ di wateya pendê de eve ‘‘Li piştî cotkirinê de ‘‘Ho ho’’ neke, dexil û dan komnabe’’¹. Ev patkirine jî ji bo mebesta nîşandan û eşkerekirina rewşekê ye.

1.3.1.5. Ji bo mebesta çespendina armanca patkirinê di kesê beramber de ‘‘Guhdarvan’’:

‘‘Pîyawî du jine, Wek kewgîr cergî kun kune’’ r.120

Di vir de patkirina ‘‘Kun kun’’ di dawîya de ji bo mebesta çespendina wateya patkirine di kesê berambere de. Ev jî ji bo wê ye ku bandorîya wê hîn zêdetir be. Eger ne asayî bu tenê carekê jî berjenga wê bi gotîya û wateya wê jî wê bi eşkereyî bi gota.

¹ Xal, Şêx mihemed, b. n. b. , r.322

1.3.1.6. Ji bo mebesta hevsengî û rêkxistina wezin û serwadarîya pajeyan:

“Be xalo xalo, xoy xiste malo” r.76

Ev gotin jî ji du pajeyên pêkhatîne ku yeksanin di wezin û kiteyan. Her yek ji wan “5” kiteye. Patkirina navê “xalo” di pajeya yekem de erkê hevsengî û yeksanîya wezina pendê werdigire. Jiber ku eger tenê carekê bi hataya wê wezina pendê ne hevseng ba. Di gel wê de jî beşdare di rêkxistina serwadarê ji bo pendê.

“Be xase xase, riyaye kase” r.76

Ev pend jî ji du pajeyan pêk hatîye, Her yek ji wan ji peyvek serwadarî ye. Dawîya pajeya yekem jî bi patkirina peyva “Xase” ya serwadar çêbuye. Her wiha beşdar jî dike di rêkxistina hevsengî û wezina gotinê de.

1.3.1.7. Ji bo kurtkirina firman û daxwazkirina encamdana karekî ji kesê beramber:

“Bilaw bilaw, segê gilaw” r.100

Wekî dîyare firmana “Bilaw” di destpêka gotinê de patkiriye bi awayekî kurtkirî. Wateya gotinê jî eve: “Belav bikin, jê bilav bikin, seyê heram hat” .Xwesteka wê ew ku mirov xirape. Di vir de jî her du firmana wê bi kurtkirî patkirîye. Armanca wê jî daxwaza encama karî ye. Eger firmana wê bi serê xwe bi hataya û kurt nekirîba pêwîste tenê carekê jî bi hataya armancek wê bi gihanda. Lê belê jî ber ku kurt kirîye pêwîste pat bike. Ev jî îfadekirina wê ciwantir kirîye.

1.3.1.8. Ji bo nîşamdana rewşekî zanînê ku armanc girtina amojgarî û sud û ezmunê be:

“Lafaw le tike tike peyda ebê” r.343

Di vir de peyva “Tike” di navîna gotinê de patkirîye. Rewşekî zanîbûne, xwesteka wê gehandina amojgarîya pişt peyvê ye. Bi wateya vê tê her tiştê biçuke ku gelek bu, mezin dibe û bandora wê jî mezintir dibe.

1.3.2. Patkirin di alîyê cûrên rêzimanî ya Patkirinê de:

1.3.2.1. Patkirina Nav:

“*Be xale xale hat belamewe, bû be ejdîha day be pamewe*” r.76

“xale” nave ku di beşê yekemê gotinê de patkirîye.

1.3.2.2. Patkirina Berjenga Jimarîya Bincî:

“*Bû be sûrî du du gir*” r.104

“Du” berjenga jimarîya bincîye du caran di navîna gotinê de patkirîye.

1.3.2.3. Patkirina peyva balkêş “Ecêb”

“*Oxey oxey le minê, Mêrde wîfî çilminê, ga derke le herzinê*” r.25

“Oxey” peyvekî balkêşe li pişthev di destpêka gotinê de patkirîye.

1.3.2.4. Patkirina Berjengê kar ya çawenî:

“*Be zîstanan pîne û pero, be hawînan wirde wird biro*” r.80

Di vir de peyva “Wirde” berjengê karî ya çawenîye di dubeşên pendê de patkirîye.

1.3.2.5. Patkirina Firman:

“*Bu be hat hatekey rom*” r.103

“Hat” Firmana ne derbazbûyî ye ji bo demê borî ye di navîna gotinê de du caran patkirîye.

1.3.2.6. Patkirina Hevokê:

“*Her nehatî her nehatî, ta wek dumel le cêy nask derhatî*” r.439

Di vê pendê de ‘‘Her nehatî’’ hevokekî sade ye di rewşa nerênî da ye. Di destpêkê de hatîye du caran patkirîye.

1.3.2.7. Patkirina berjengê çawenî:

‘‘Bê'ar day le derya witî, ter ter nebaşed’’ r.112

Peyva ‘‘Ter’’ berjengê çawenî ye du caran patkirîye.

1.3.3.D. Patkirin di alîyê cihê peyva patkirî de di nav pajeya pend û gotinê de:

1.3.3.1. Patkirina cihê wê dikeve destpêkê:

‘‘Gez gez bala eke’’ r.330

1.3.3.2. Patkirina cihê wê dikeve navendê:

‘‘Lafaw le tike tike peyda ebê’’ r.343

1.3.3.3. Patkirina cihê wê dikeve dawîyê:

‘‘Pîyawî du jine wek kewgîr cergî kun kune’’ r.120

1.4. Zivirandin ‘‘Gêranewe’’:

Yekek dine ji ciwankarîya peyvane. ‘‘Ew e ku peyvek, hevokek yan kurte hevokek bînî bi wateyek taybet ve girê bidî. Dîsan heman peyv, hevok yan kurte hevok dubare bînî. Lê belê vê carê peywendîya wê bi tiştêk din ve hebe’’¹. Di vir de ne şerte ku tenê zivirandin du caran bê zivirandin. Belku dikare ji ducarane zêdetir jî be. Bi kurtî zivirandin: Pêktê ji zivirandina çend carek ya wateyekê û bi yek formê, her carê jî li cem wateyêkê û formekê di ciyawaz bi zivire.

1.4.1. Zivirandin jî di alîyê rêzimanî de dibe çend beşek:

1.4.1.1. Zivirandina Nav:

¹ Gerdî, Ezîz, *Rewanbêjî le Edebî Kurdî da (Ciwankarî)*, r.42

1.4.1.1.1. Zivirandina Navê Watayî:

“*Salê mal û salê minal*” r.239

“Sal” navekî watayîye. Carekê li pêşt navê “Mal” û carekê jî li pêşt navê “Mnal” hatîye zivirandin. Bi vî awayî jî hunera zivirandinê pêkhatîye.

1.4.1.1.2. Zivirandina Navê heyberî:

“*Berû be kalî, berû be kulawî, berû be brjawî*” r.92

“Berû” navekî heyberîye. Sêcaran li cem peyvên “bekalî”, “Bekulawî” û “be brjawî” zivirandîye.

1.4.1.2. Zivirandina Amraza Peywendî:

1.4.1.2.1. Zivirandina Amraza Peywendîya “be” :

“*Be xot bixo têr, be xelq meke xêr*” r.76

Amraza peywendîya “be” du caran hatîye zivirandin li pêşîya peyva “xot” û “xelq”. Bi vî awayî jî zivirandin ji bo gotinê pêkhatîye.

1.4.1.2.2. Zivirandina Amraza Peywendîya “Bo”:

“*Nan bo nanewa, goşt bo qesab*” r.399

“Bo” Amraza peywendîye, carek li pêşîya peyva “Nanewa” û carekê jî li pêşîya peyva “qesab” hatîye zivirandin.

1.4.1.2.3. Zivirandina amraza peywendîya “le”:

“*Le segê dir, lehakimî kur, le afretî demşir, bitirse*” r.355

“le” amraza peywendîye li destpêka her sê pajeyên pendê hatîye zivirandin. Carekê jî li pêşîya “Segê dir” û carekê jî li pêşîya “Hakimî kur” carekê jî li pêşîya “afretî demşir” hatîye zivirandin bivî awayî jî hunera zivirandina amraza peywendîya “le” ji bo pendê çêbûye.

1.4.1.2.4. Zivirandina Amraza Peywendîya hevgirtî ya “Bebê”:

“*Adar narwa bebê do, nîsan narwa bebê co*” r.13

“bebê” amraza peywendîya hevgirtîye, li cem peyvên “do” û “co” hatîye zivirandin.

1.4.1.2.5. Zivirandina Amraza peywendîya “lo”: Ev jî taybete bi şêwezarê hewlêrîyan. Ligorî hinek ziman nasan kurtkirina her du amrazê “le + bo” ye.

“*Mal lo mêrdane, 'ezab lo jinane*” r.372

“lo” du caran hatîye zivirandin. carekê li cem “mêrdan”, carekê jî li cem “jinan” bi kar hatîye.

1.4.1.3. Zivirandina Berjengî:

1.4.1.3.1. Zivirandina berjengên çawenî:

“*serî zil dewlete, pêy zil meynete*” r.247

“Zil” berjengê çawenîye li cem navên “ser” û “pê” hatîye zivirandin.

1.4.1.3.2. Zivirandina Berjengê Nedîyar:

“*Eger wa nebûwaye, wa ebû*” r.35

“Wa” berjengê ne dîyare, du caran hatîye zivirandin. Carekê li cem “nebû”, carekê jî li cem “ebû” hatîye bi kar anîn.

1.4.1.3.3. Zivirandina Berjenga Jimarî:

“*Du fele karwanêke, du jina hemamêke, du keran garanêke*” r.212

“du” berjengê jimarîya bincîye, sê caran li cem peyvên: “Fele, jin, keran,” hatîye zivirandin.

1.4.1.3.4. Zivirandina Berjenga Nîşanê:

“*dewletî ciwanî, eweta şivanî, dewletî pîrî, eweta mîrî*” r.200

“eweta” berjenga nîşanîye, du caran li cem peyvên: “şîwan, mîr” hatîye zivirandin.

1.4.1.4. Zivirandina Berjengê firmanî:

1.4.1.4.1. Zivirandina berjengê cihî:

“*Jêr bende ziban, jêr dîze agir*” r.238

“Jêr” berjenga firmanîya cihîye, du caran li cem peyvên “bende” û “dîze” hatîye zivirandin.

1.4.1.4.2. Zivirandina Berjenga firmanîya pir jimarî:

“*Tawê geş ebimewe, tawê reş ebimewe*” r.133

Di vê gotinê de jî berjenga firmanîya pir jimarî “tawê” çêbuye. Li cem peyvên wekî “Geş” û “reş” hatîye zivirandin.

1.4.1.4.3. Zivirandina Berjenga Firmanîya Rêkxistî:

“*Gaga be xerwar, gaga be mistal*” r.327

“Gaga” berjenga firmanîya rêkxistîye, li cem peyvên wekî “be xerwar” û “be mistal” hatîye zivirandin.

1.4.1.5. Zivirandina Amraza Lihevdayî:

1.4.1.5.1. Zivirandina amraza lihevdayîya “ya”:

“*Ya zana be, ya prsa be*” r.451

“Ya” amraza lihevdayîye li cem peyva “zana” û “prsa” hatîye zivirandin.

1.4.1.5.2. Zivirandina Amraza lihevdayîya “çi”: Di vir de morfîma “çi” rola amraza lihevdayî dibîne ne ya pirsyar.

“*Şêr ke le bêşe der perî, çi nêr bê çi mê*” r.272

Di vir de amraza “çi” du caran li cem peyva “nêr” û “mê” hatîye zivirandin.

1.4.1.5.3. Zivirandina Amraza lihevdayîya “Eger”:

“*Eger baye eger borane, bo befir zîyane*” r.28

“Eger” amraza lihevdayîye li cem peyva “ba” û “boran” hatîye zivirandin.

1.4.1.5.4. Zivirandina Amraza lihevdayîya “Nek”:

“*Dewlemendî be dile nek be male, gewreyî be 'eqile nek be sal*” r.200

“nek” Amraza lihevdayîye, erka nerênîyê jî girtîy. Du caran li cem peyva “be mal” û “be sal” hatîye zivirandin.

1.4.1.5.5. Zivirandina Amraza lihevdayîya “Hem” :

“*Be 'ereb melê merheba, hem exwat û hem eba*” r.82

“hem”, amraza lihevdayîye, du caran li cem firmanên wekî “exwat” û “eba” hatîye zivirandin.

1.4.1.6. Zivirandina Cînavkan:

1.4.1.6.1. Zivirandina cînavka ne dîyar:

“*Destî kes, piştî kes naxurênê*” r.195

“kes” cînavka ne dîyare, Li cem peyvên: “dest, pişt” hatîye zivirandin.

1.4.1.6.2. Zivirandina Cînavka xweyî:

“*Nanit nebê le teşê xo, kurt nebê le koşê xot, temat nebê be brayê xot*” r.401

“xo” cînavka xweyî ye, sêcaran li cem peyvên: “teşt, koş, bra” hatîye zivirandin.

1.4.1.6.3. Zivirandina cînavka heyî:

“*Bax hî baxewan û bêstan hî bêstanewan*” r.68

“hî” cênava heyî ye, du caran li cem peyva “baxewan” û “bêstanewan” hatîye zivirandin.

1.4.1.6.4. Zivirandina cênava pirsyarî:

“*kê kirdî, kê birdî*” r.323

Cênava pirsyarî a “kê” di destpêka her du pajeyên firmanî yên wekî “kirdî” û “birdî” hatîye zivirandin.

1.4.1.7. Zivirandina Amraza Nerênî:

“*ne renc bo nakes, ne şîn bo mirdu*” r.407

Hunera zivirandina amraza nerênî ya “ne” ji bo pendê çêbuye. Du caran li cem peyva “renc” û “şîn” hatîye zivirandin.

1.4.1.8. Zivirandina her du amrazên peywendî ya “ne” û “bu” bi hevre:

“*Axa dest meşo, ne bo mine ne bo to*” r.19

Di vir de jî amraza nerênî û peywendî ya “ne” û “bo” bi hevre hatîye. Du caran li cem cênava “min” û “to” hatîye zivirandin.

1.4.1.9. Zivirandina Amraza peywendîya “le” û berjenga nîşanê ya “ew...e” bi hevre:

“*Ga lew gaye, goşt lew goşte*” r.326

“lew...e” pêkhatîye ji amraza peywendî û berjenga nîşanê bi vê re jî “le+ew...e” lêbelê ji bo sivikîya “e” berjenga nîşanê hatîye. Di vir de jî du caran licem peyvên wekî “Ga” û “Goşt” hatîye zivirandin.

1.4.1.10. Zivirandina Grêdanê “Girê” :

“*Aş le xeyalê, aşewan lexeyalê*” r.17

“Le xeyalê” girêdana bende, du caran li cem peyva “aş” û “aşewan” hatîye zivirandin.

1.4.1.11.Zivirandina Hevokî:

“Eçme cêyek goşt bigrim, nek derdê bigrim pêy bimrim” r.27

“Bigrim” hevokê sadeye, di vê pendê de du caran hatîye zivirandin. Carekê li cem peyva “goşt” û carekê jî licem peyva “derd” hatîye zivirandin.

1.4.1.12.Zivirandina Ewzarî ya “wek”:

“Reçe wek tû, reşe wek mû, dewletî bawkî eyda be şû” r.221

Ewzara “wek” du caran li cem peyva “tû” û “mû” hatîye zivirandin.

1.4.2.Zivirandin di aliyê jimara hatî zivirîn de:

1.4.2.1. Zivirandina du carî: Ew zivirandine ku peyv û amrazên di gotinê de du caran dubare dibe li cem peyv û wateyek din.

“Le awî mend û le piyawî mon bitirse” r.344

Amraza “le” tenê du caran dubare buye. carekê li pêşîya “nawî mend” û carekê jî li pêşîya “Piyawî mon” hatîye zivirandin.

1.4.2.2. Zivirandina sê carî: Zivirandina ku peyv û morfêmên sêcaran licem peyv û wateyek din dubare dibe. Ev jî di wan pend û gotinan de dibe ku ji du pajeya zêdetir pêkhatî be.

“Ne salî du behar, ne jinî du çikdar, ne piyawî gwê be giwar” r.407

Amraza nerênî ya “ne” sêcaran li destpêka her tek ji pajeyan li cem peyva “salê du behar”, “jinî du çikdar” û “piyawî gwê be giwar” hatîye zivirandin.

1.4.2.3. Zivirandina Çar carî: Ev corjî peyv û amrazên wê çar caran dubare dibe. Ev jî di van pend û gotinan de dibe ku ji çend pajeya pêkhatîye.

“Min bûm be to, to bûy be min, Min bûm be cin, to bûy be jin” r.391

Amraza peywendîya “be” çar caran li cem çar wateyên cuda hatîye zivirandin: “To, min, cin, jin”

1.4.3. Zivirandin li gorî cihê hatî zivirandin: Ev jî çend coreke.

A. Peyva zivirî di keve pêşîya wê peyvê ya ku li cem wê tê., zêde gelek ev zivirandine bi vî awayîne di pend û gotinan de. Bi kurtî tenê emê yek mînakê destnîşan bikîn.

“Ne bazarî çol, ne şahyî bê dehol” r.405

Amraza peywendîya nerênî ya “ne” du caran li cem kurte hevokên “bazarî çol” û “Şahyî bê dehol” hatîye zivirandin. Her du caran jî ketîne pêşîya kurte hevokan.

B. Zivirandina wê dikeve pişt ew peyv yan kurte hevokê ye ku li cem hev hatîne. Amajeya vî corî jî ewe rêjeya ya pêşî kêmtir be di nava pend û gotinê de. Tenê di çend pendan de reng daye. Di vir de jî ji bo kurtkirina babetê tenê emê yek mînakê bidin destnîşnkirin.

“Destî kes, piştî kes na xurênê” r.195

Cînavka ne dîyara “kes” du caran li cem peyvên wekî “dest” û “pişt” hatîye dubarekirin. Her du caran jî cihê wê ketîye dawîya peyvên.

Cîyawazîya dinavbera Zivirandin û Patkirinê de:

Di zivirandinê de peyv yan jî amraz di gotinê çend carekê tê, Pêwîste her carekê jî di bi leztir li cem peyvek û wateyek din bê.

“Ne şîş bi sutê, ne kebab” r.408

Wekî ku em dibînîn amraza nerênî ya “ne” du caran hatîye. Carekê li cem navê “Şîş” û carekêdin jî li cem navê “kebab” hatîye bikar anîn. Lê belê di patkirinê de peyv bi hev re li cem yekdu tînan û bi tiştên din ve nayên girêdan.

“*Bilaw bilaw segê glaw*” r.120

Patkirina “*Bilaw bilaw*” di vir de hatîye bê yî ku bi tiştêkê ve hatibe girêdan.

1.5. Anîn “*Tesdîr*”:

“*Ewe ku yek ji du peyvên dubare yan jî du peyvên lipey hevdu hatî, di destpêka kiteya hatî nivîsandin tê danîn. Ya duyem jî li dawîyê tê danîn*”¹. Her wiha peyv dikarin hev rêgez jî bin. Wekî ku ev pênase jî dibêje: “*Pêktê ji du peyvên dubare yan jî hevrêgez bi hev re bînan, yek ji wan dikeve destpêka paragrafê û ewa din jî bi keve dawîya paragrafê*”². Di vir de ne şerete ku anîna peyva dawî tenê peyva destpêkê be. Belku dikar peyva her cihê ya hevokê li pêşîya xwe be. Bi taybet eger ji du beşan yan jî zêdetir pêk hatibe. Ji bo anîna peyva dawî sê cih hatîye diyarkirin.

“1- *Peyva dawî wekî peyva dawîya nîvê a yekem dibe.*

2- *Peyva dawî wekî peyva yekem a nîva yekem dibe.*

3- *Peyva dawî wekî beşekê a di nava tekista de dibe.*”³

Li gorî vê jî bo pend û gotinan, zêdetir ew pend û gotinan digire nava xwe ku ji du nîvan zêdetir pêkhatî be. Bi kurtî anîn di pend û gotinan de: pêktê ji anîna peyva dawî jî bo ya destpêk yan navîn yan dawîya pajeya pêşîya xwe. Yan jî li her cihê tekista pend û gotinê ya lipêşîya xwe bi kar bîne. Ev jî bi yek wate yan hevrêgez û wateyek ciyawaz dibe.

Beşkirina vê hunerê jî di pend û gotinan de li çend alîyan dabeş dibe:

¹ Metlub, Ehmed, *Finun Belaxîye (El-Beyan – El-Bedî)*, t.1, Dar El-Bihus El-Îlmîye, Kiweyt, 1395 h. – 1975 m. r.237

² Îdrîs'Ebdulla, *Ciwankarî le Edebî kurdî da*, Dezgay çap û pexşî Serdem, Silêmanî, 2003, r.35

³ Bin El-Mu'tez, Ebdulla *Kîtab El-Bedî'*, T.3, Dar Elmesîre, Beyrut-Lubnan, 1402 h.-1982 m, r.47-48

1.5.1. Anîn di alîyê rûxsar û wateya wan tiştên ku anînê çêdikin:

1.5.1.1. Peyv hevrûxsar û hev wate dibin: Ew peyva ku anîna wan çêdike, pêwîste hem di rûxsar û hem jî di wateyê de wek yek be.

“Kes naçête gorî kes” r.309

Di vir de peyva “Kes” cînavka ne dîyare di destpêkê de hatîye anîn jî çêkirîye. Di dawîyê de jî bi heman wate anîye. Mînake din jî:

“Be destî xom, çîm kird be xom” r.77

Di vê pendê de jî peyva “xom” cînavka kesîye. Di dawîya pajeya yekem de hatîye. Bi heman rûxsar û wate di dawîya pajeya duyem jî hatîye.

1.5.1.2. Peyv hevrûxsar dibin, lê belê wateya wan cuda dibe:

Ev cor jî peyvên wan di alîyê rûxsar de wekî yekin. Lê belê her yek ji wan wateyek ciyawaz heye. Ji ber vê jî ev cor dibe hevbêjîya tam jî.

“Qsey rast berde, rastgobe, diro berde” r.289

Di vir de peyva “berd” li dawîya pajeya yekem û dawîya pendê hatîye û anîn jî pêkanîye. Di rûxsar yê xwe de wekî hevin lê di wateya xwe de ciyawazin. Ya yekem bi wateya “berd” tê. Li gel firmana bêhêz a “e” hatîye û temamkerê karê bêhêze jî. Lê belêa duyem ya li dawîyê hatî wateya wê cudaye. “Berde” karê daxwzîye ji bo kesê duyemê yek jimat. Ji koka çaviga “berdan” û “e” ye ku ji cînavka kesê duyemê yek jimar pêkhatîye. Bi vî awayî jî hevbêjîya tam jê ketîye.

1.5.1.3. Peyv hevrêgezin:

Di vir de ew peyvên ku anînê çêdikin, di rûxsar de ciyawazîya wan dikeve navberê. Di alîyê wateyê de jî ciyawaz dibin yan wateya wan nêzîkî hev dibin. Lê belê yek rêgez û koka ferhengîyan heye. Mînak:

“Aş bimîzê le hîzî aşewane” r.16

Di vir de peyva “aş” li destpêkê hatîye û di dawîyê de jî peyva “Aşewan” hatîye. Bi vî awayî jî hunera anînê çêbuye. Her çiqas peyvên wan di rûxsar û wateyê de ciyawazin, “Aş” navekî sadeye lê belê “aşewan” jî kireke di vir de jî berjenga kirekî çêbuye. Ev jî pekhatîye ji nav û paşgir “Aş + ewan”. Di vir de koka binçîneyî a “Aşewan” he ji “aş” hatîye. Ji ber vê jî ev şêweye anîna hevrêgez pêkanîye.

1.5.2. Anîn di alîyê cihê peyvan di pend û gotinan de:

Di vir de armanc ew cihe ye ku peyvên wan jê anîne. Ev jî di alîyê pend û gotinên pêşîyan de şêweyekî taybet girtîne. Anîna peyv û hevokan jî yan di pend û gotina de dibe ku ji du pajeyan zêdetir ya serwadar pêk hatibin. Ev jî xasyeta rêzika hunandinê wer digire. Yan jî ev hunere di wan pend û gotinan de dibe ku di yek hevokê de çêdibe. Ev jî di şêweyê pexşanekî kurt de xwe nîşan dide.

Di vî alî de anîna pendên pêşîyanê xal li gorî cihê peyvên hatîn bi vî awayî dabeş dibin.

1.5.2.1. Cihê peyvan yek li destpêkê dibe ew din jî li dawîyê dibe:

“*Siwar ta negilê, nabê be siwar*” r.255

“Siwar” li destpêka pendê hatîye û li dawîya pendê de jî hatîye.

1.5.2.2. Peyv cihê wan dikeve dawîya her yek ji pajeyan:

“*Ta pîrê emrê, hezar ciwan emrê*” r.128

Di vî beşî de jî hunera anînê bi firmana “emrê” çêbûye. Ya yekem li cihê dawîya pajeya yekem hatîye a duyem jî li dawîya pajeya duyem anîye.

1.5.2.3. Hine ji peyvan di beşê pêşîya heman tekistê de tèn û ew ya din jî li dawîyê tê: Ji bo vî corî jî ev pend me daye destnîşan kirin.

“*Wityan berde bo berdî ? wîfî: berd ebînim boye bûmete berd*” r.423

Peyva “berd” çend caran di navîna tekista pendê de hatîye. Di dawîyê de jî anîye, bi vî awayî anînekî dewlemend ji bo gotinê çêkirîye.

1.5.2.4. Peyv li dawîya beşê pajan anîye:

Peyvan di paje û beşên pêşîyê de na ênin, belku di dawîya pajeyan anîne. Ji bo vê jî nabe pend yan jî gotin ji du beş kêmtir be.

“Gam wa be barewe, doyinem wa be darewe, mela direnge kurekem bike be mela” r.327

Ev pend jî ji çend pajeyan çêbuye. Cihê hunera anîne ketîye dawîya beşê pendê. Peyva “Mela” ku li destpêka pajeyê dawîyê hatîye û di dawîya pendê de jî anîye.

1.6. Jê girtin ‘îqtîbas’ :

Li gorî wêjeya berz û hatî nivîsandin bi vî awayî pênaseya vî beşê hunerê kirîye: Pêktê ji “*Nivîskar di pêkanîna gotinê yan rêxistinê de gotinên ayetekê yan hedîsek yan babetekê bi karbîne, jiber pîroz girtin û bilind nîrxandin*”¹. Yan jî bi awayekî berfireh gotîye jê girtin: “*Pêktê ji pexşan yan helbest, tiştekek di qurana pîroz de yan jî di hedîsek a Pêximber de ‘s. a. s.’ yan jî her gotin û axaftinekê bi hêz di xwe de bigire, lê belê a merc di vir de ewe ku ya jê girtî nabe ji hevokê sade kêmtir be û nabe amajeyê hebe ku ev gotin wergirtîye*”². Jê girtin di pend û gotinên pêşyan de bi giştî tenê babetên ayînî digirin, vêca mijarên wê wekî xwe jê bigirin yan jî naveroka wê, di vir de pêwîste hev ahengî û bi hev re guncanekî ciwan di nava wan de be. di alîyê ruxsar û naverokê de teksta folklorî di dema bi hev re hatina li gel peyv û gotinan.

Gotin hemu bi hev re yek parçe nîşa bikin.

Hunera jê girtinê di vê beşa folklorîyê de bi çend şeweyekî dibe:

1.6.1. Wergirtina mijarekê yan beşek ji mijarê olekî wekî xwe: Ev jî bi vî awayî dibe, wergirtina mijarekê û gotinekê şewazê wê ji bo xwe çawe be bi wî awayî jî werbigire, bêyî ku destkarî tê de bike. Mijar yan hemu be yan jî ayetek ya hedîsê be. Mînak:

“*Ne şeytan bibîne, ne e'uzu bîla* “*أعوذ بالله*” bike” r.408

Di vê pendê de jî jê girtin bi “*E'uzu bîla*” kirîye. Ku beşeke ji gotina “*أعوذ بالله من الشيطان الرجيم*”. Ev jî li çend cihan li qurana pîroz û hedîsê Pêximber “s.a.s” qal kirîye. Bi vî awayî jî hunera jê girtina vê gotina olî çêbûye. Bêyî ku destkarîyek lê bike wekî amajeyek hatîye. Di vê mînakê de jî dibêje:

“*Ta min witim bîsimîla* الله *بِاسْمِ*”, ew witî elhemdulîla “*الحمد لله*”” r.131

¹ Muhemedî, Muhemed Husên, b. n. b. , r.179

² Îdrîs 'Ebdulla, *Ciwankarî Şî'irî Klasîkî Kurdî*, ç.1, Çapxaney Hêvî, Hewlêr, 2012, r.50

Di vir de li du cihan hunera jê girtinê bi gotina olî çêbûye. “, “بأسم الله“ jî pajeya yekeme û pajeya duyem jî “الحمد لله“, her du jî gotinên olîne. Ev her du jî gotinên dîyarin û li çend cihên dîyar ên wekî qurana pîrozû hedîsên giring hatine. Di vir de jî jê girtin wekî xwe hatîye nivîsandin bêyî ku destkarî lê hatibe kirin.

1.6.2. Wergirtina ji naveroka mijarên olî: Ev jî bi vî awayî dibe ku gotin ji bo xwe çawe ye. Bi vî awayî nayê wergirtin. Belku tenê naveroka mijarê tê wergirtin. Ev jî her çawe be bila wisan be ya girîng ew e ku wateya jê girtî nîşan bide û jê dernekeve.

“îsayî be dînî xoy, musayî be dînî xoy” r.276

Beşa serekî naveroka vê gotinê, Ji Qurana Pîroz hatîye girtin, ku di bêje “لكم دينكم ولي دين”¹. Di vê pendê de naveroka vê ayetê hatîye girtin. Gotina wê ciyawaze bêyî ku hiç amajeyek bide. Bi vî awayî jê girtina ya naveroka olîne pêkhatîye.

1.6.3. Wergirtina raman û fikrên olî:

Di vir de jê girtin di van fikr û ramanê olî werdigirin. Di derbarê xwedê yan jî her diyarde û tiştekî derdor ku bi awayîyekî giştî ji naverok û bingeha vê olê wergirtibin. Mînak wekî vê pendê ku dibêje:

“To binû westay necar, xwa yeke û deru hezar” r.140

“xwa yeke deru hezar” ev jî fikrekî olîye ku ji bawerîya eqîdeya ola îslamê wergirtîye.

“Her xwa xwa ye dinya ka û baye” r.433

Di vê gotinê de jî gotina “Xwa xwa ye” wergirtîye ev jî di giştî ew hizir û ramanê ola îslamî hatîye di derbarê mayîna xwedê di pêşerojê de her ew dimîne û mayîn tenê ji bo wî dibe. Ev jî ramanekî rast a ayînîye ku pêşîyan

¹ *Qurana pîroz*, sureta Elkafirûn, ayeta (6)

tevlî gotinan kirîne û buye beşekî serekî ya gotinê. Hiç amajeyek nîne ku ev jî jê girtîye.

1.7. Îktîfa:

Corek din ya ciwankarîye şewazeka kurtbirî ye. “*Ewe ku bêjer hinek peyv wisan jê bibe ku bêyî bê qalkirin mirov bizane çîye û ji ber wê jî qalkirina wan ne pêwîst be*”¹. Pend û gotin jî bi xwe taybetnedîyên wan jî wisanin kurt û têr watene. Ji ber vê jî asayîye îktîfayê bêxî di navde. Lê belê di vir de nabe îktîfa bandorê li ser armanc û wateyê çêbike û bi be sedemê ne fêmkirina wateyê. Mînak:

“*Xirape be hemû kes, çake be kem kes*” r.167

Wate: “*Xirape be hemû kes dekrê, çake be kem kes dekrê*”. Di vir de her beşek yê vê pendê îktîfayan lê kirîye. ev jî bi dayîna aliyek ya firmana “*Dekrê*” di dawîya her beşekê de. Li gel vê jî qet ne tamamî li wate û naveroka pendê ne çêkirîye. Ji ber ku di komkirina wateyê de ew firmane di hizir de çêdibe ku di vir de ne hatîye. Li gel vê jî ciwanî bi şewazê pendê bexşîye di vê mînakê de jî dibêje

“*Ne şeytan bibîne, ne e'ûzu bîla* “*أعوذ بالله*” bike” r.408

Wate; Ne şeytan bibîne ne “*E'ûzu billahî mine şeytane recîm* من أعوذ بالله -الشیطان الرجيم” bike. Lê belê di vir de jê girtina ayînî hatîye Îktîfakirin û “*mine şeytane recîm* من الشيطان الرجيم” jê birîye. Ev jî ji bo ku pend kurtbe û ne dirêj be. Ya jêbirî jî eşkereye wateya wê jî dîyare qet kêmasî ji bo ya beramber û di fêmkirinê de çê nekirîye. Bi vî awayî hunera îktîfa pêkhatîye.

¹ Muderrîs, Mela Ebdulkerîm, *Bedî' û 'Eruzî Namî*, Çapxaney Dar Cahiz, Bexda, 1991, r.58

1.8. Hebûna Pêwîstêyê, “Pêwîstbûn bi Pêwîst” :

“Pêktê ji wekyektî û hevşêwe hatina tîpek yan çend tîpekê ji beriya tîpa kû di honandiyê de “serwa” û di pexşan de “serwedar” çêdike”¹. Mebest ji vê tîpê jî, tîpa binçîneyî ya “rewî” ye, li gora wê: “Dengê dawî ya peyva ferhengî ya ku serwaye bê morfîma piştî wê ye”². Yanî bê morfîmên rêzimanî, ev tîp jî ewe kû peyva serwa û peyva serwedarî li ser tîpê damezrandin. Di vê alî de ji bo pend û gotinan bi vî şeweyî pênaseya vê hunerî hatiye kirin:

Pêktê ji xwe pêve girêdana tîpek yan çend tîpekê hevform û hevşêwe, Vêca çî dengdêr bin yan dengdar bin ku di dumahiya hevok û pajeyan û di peyvên serwadarî de ku li pêş tîpa binçîneyî “rewî” ye, divê tîpên hevşeweyên wê pêş tîpa binçîneyî “rewî” jî bê. Jêre tê gotin “pêşrewî” û dibin sedema pêwîstî, evane jî hevbeşiya hemahengiyê dikin di durîstbûn û kamilbûna serwa yan “serwedar” de, ji bo peyvê, her wuha ew deng û tîpên kû li pey rewî jî tîpê wek dengdêrên kurt û morfîmên rêzimanî dibine “paşrewî” .

Ev hunere jî li gora jimareya tîpên pêş dawiyê dibine çend cûrek:

1.8.1. Hebûna pêwîstiya yektîpî: wek:

“*Ew ware, ne ew behare*” r.53

Ev pende jî ji du paje “beş- parçe” pêkhatiye, beşa yekem “ware” û pajeya duyem “behare” serwedar hatiye kirin. “r” di her du peyvan de tîpa binçîneyî ya rewî ye, “a” ya pêşiya tîpa “r” hebûna pêwîstiya dengdêra kurt jî “e” di dawîya herdu peyvan de paşrewî ye.

“*Ga be cil û cor, jin be ser û por*” r.325

Peyvên “cor” û “por” di dawîya her du pajeyan de serwedarî ji bo pendê daye durîst kirin. “r” ya dawî jî ya “rewî” ye. Tîpa dengdêr ya dirêj “o” di herdu peyvan de hebûna pêwîstî ye, yanî di vê mînakê de jî:

“*Le ser malim, bide le balim*” r.354

¹ Îdrîs'Ebdulla, *Ciwankarî le Edebî kurdî da*, r.53

² Gerdî, Ezîz, *Kêşnasî*, Çapxaney Narîn, Hewlêr, 2014, r.271

Peyvên “malim, bilim” peyvên serwadarin di pendê de, tîpa “l” di her du peyvên de tîpa binçîneyî ya rewî ye. “a” jî hebûna pêwîstî ye, “im” ya di dawiyê de jî cînava zeliqandî ya paşrewî ye.

1.8.2. Hebûna pêwîstiya du tîpî: wek:

“*Dijminî dana bu be dostim, çawerê key bikewê kostim*” r.210

Ev pendê jî ji du paje pêkhatiyê, dawiya wan bi peyvên “dostim” û “kostim” serwedar hatine kirin, tîpa “t” di her du peyvên de rewî ye, tîpên “o, s” pêşrewîne, hebûna pêwîstîne, bi anîna van jî di her du peyvên serwedarên de kû bi hêztir û ciwantir û lêdanek baştir çêbûye, “im” ya dawiyê jî paşrewî ye.

“*Le bûkê ziman nebû, le xesûyê îman nebû*” r.346

Pajeyên vê pendê jî bi peyvên “ziman” û “îman” serwedar hatine kirin, tîpa binçîneyî ya rewî jî di her du peyvên de “n” ye, tîpên “m, a” jî pêş tîpa rewî ye û hebûna pêwîstîne kû serwedarên wê ciwantir û bihêztir kirine, peyva “nebû” li dawiya herdu pajeyan de jî paşserwa ye.

1.8.3. Hebûna Pêwîstiya sê tîpî: wek:

“*Dêw kem bû le dêwelan, eweş hate ser banî kundelan*” r.218

Peyvên “dêwelan” û “kundelan” di dawiya her du pajeyan de serwedarin ji pendê re, “n” ya dawiyê tîpa binçîneyî ya rewî ye. Tîpên “e, l, a” tîpên rewîbûna pêwîstin, bi anîna vane jî li pêşrewî serwedarên wê ciwantir û bihêztir kiriye di pêdana awaz û muzîka di dawiya pendê de.

“*Bira bû be biraza, kar le kar tiraza*” r.96

Peyvên “biraza” û “tiraza” serwadarî ji bo pendê durist kirine, tîpa dawiyê “a” di her du peyvên de rewî ye, tîpên “r, a, z” tîpên rewîbûna pêwîstin, evane jî çend û ciwanîyekê bi dawiya pendê bexşandine di duristkirina hevşeweyiya awaz û muzîkan de.

1.9. Paşxistin:

Yek dîtire ji wan hunerên ciwankariyên peyvvan: “*Pêktê ji paşxistina du sê gotinan kû piştire û li cihek din dixite rû*”¹. Bê anîna beşa paşxistinê, mebest û wateya temam û zelal ji aliyê guhdar ve durist nabe, ev beş jî zêdetir dikeve dawiyê, ya paşxistî jî vica her çi tiştêk be carnan wusa heye “firmana, hevokan, navê cihek, yan hevokê, hewal yan sifetek û..hwd” paşdixe.

Mînak:

“*Awî ser berû, nanî bê kerû, kuzeley bê zerû, xoşe*” r. 23

Ev pende ji çar pajeyan pêkhatiye, dema yê beramber guhdariya pajeya yekem “awî ser berû” dike, kû girêyeka navî ye û nîhade, hatiye wesifkirin bi berjengek, wusa tê digehe kû behskirina wê “wesfa wê” raste rast li dûv wê tê kû her çi di pajeya duyem de dubare guhdarekî dine kû “nanî bê kerû” bi dûv wê re tê. Ev jî serbixwe ye û bi heman şêwe nîhade, hatiye wesifkirin, çaverêy wesifa tê behskirin dike kû her çi be dubare paş dixê. Di pajeya dûv re jî de dubare guhdarekî din navê “kuzeley bê zerû” li pey de tê kû ev jî nîhade û serbixweye û hatiye wesifkirin bi berjengek, wekî yên pêşiya wê. Vica di dawiya her sê pajeyan de behsa “xoşe” di dawiya pendê de têt û dibe wesfek ji bo her yek ji wan wesifkiriyan pêşî, bi vî awayî hunerê paşxistin ji bo pendê hatiye berhem dan.

“*Le segî dir, le hakmî kur, le afretî demşir, bitirse*” r.355

Ev pende jî ji çar paje pêkhatiye kû her yek ji wan jî çaverêy firmanek dike ji bo temambûna wan di gihandina mebestên xwe de, dema yê beramber guhdarê pajeya yekem “le segî dir” dike, çaverê dike raste rast firmana hevokê li dûv wê bêt, belê di pajeya duyem de behsek din serbixwe tê “le hakmî kur” kû evane jî çaverêy heman firmanê dikin, kû her dîsan jî firman tê paşxistin û pajeyek din ya serbixwe “le afretî demşir” li pey re tê, hinca di dawiya her sê pajeyan de firmana daxwazî ya “bitirse” ji bo temamkirina her yek ji pajeyên li pêşiya xwe hatine, lê ji vî hunerî re jî tê gotin “paşxistin” .

¹Îdrîs 'Ebdulla, *Ciwankarî Şî'irî Nwêy Kurdî*, ç.1, Çapxaney Hêvî, Hewlêr, 2012, r.77

“Caşî kulkin, gwêrekey wergin, minalî lîkin, pesendin” r. 145

Ev pende jî ji çar paje pêkhatiyê, di pajeya yekem de “Caşî kulkin” behsekê serbixwe ye û girêyekê navî ye, nîhade, di heman demê de hatiye wesifkirin bi berjengekê jî, lê raste rast li pey ne hatiye, dema yê beramber guhdar dîke raste rast behsê wesfa wê tê kû di dawiya wê de be, kû her çî be di pajeya duyem de di bira wê de guhdarekê din navê “gwêrekey wergin” li pey re tê kû ev jî behsekê serbixwe ye çaverê dîke ji dawiyê ve bê, lê disan jî wesif û behsa wê dide paşxistin û pajeyekê din li pey wê tê kû ew jî “minanalî lîkin” e, kû ev jî girêya navî ye, nîhade, hatiye wesifkirin û çaverêyê tamamkera xwe dîke, vica di dawiya van de ji bo hemî pajeyan “girêya nîhad” behsa “pesend” e tîne ji bo wesfa her sêyan çêdîke, paşxistina vê beşa pendê jî jêre tê gotin hunera “paşxistin” .

1.10. Îzdiwac:

Pêktê ji wê kû “çend peyvên li pey hevdu bin û hemî jî hevqafiye bin”¹. Yanî hevserwabûna peyvyan merca serekî ya duristbûna vê honandiyê ye, di vê derê de peyvên serwa nabe li du peyvyan kêmtir be, eger na ev huner berhem nayê, eger zêdetir jî bin asayî ye û bilêvkirina wê jî ciwantir dîkin, bo mînak:

“Dunya kê xwardî? Zibanlûsan, lûs û pûsan, bênamûsan” r.207

“Zibanlûsan, lûs û pûsan, bê namusan” evane çend hevalnavêkê lêkdayî û darêjandîne, li pey beşê yekem ya gotinê li dûv hev de hatine kû hemî jî hevserwane. Hîç peyv û wajeyek jî ne ketiye di navbera wan de, bi vî şêweyî hunerê îzdiwac ji bo gotinê hatiye berhem dan.

“Rastî reftî, çeftî keftî” r.219

Ev gotin jî ji destpêkê heta dawî peyvyan hevserwane, hemî peyv li dûv hevdu hatine û hîç peyv û wajeyek neketiye di navbera wan de, bi vî îzdiwacek ciwan ji bo gotinê durist bûye.

¹ Dizeyî, Elî Fetah, *Hunerekanî Belaxet le Mem û Zînê Ehmedî Xanê da*, Govarî Karwan, j.24, Hewlêr, 1984, r.44

“*Kirdin û birdin û mirdin. Seryan pêkewe nawe*” r.316

Peyvên “kirdin, birdin û mirdin” her sê jî li ser yek serwa çoyîne û li dûv hevdû jî hatine, lê li vê derê de amraza lêkdayî “û” du car ketine di nava peyvan de kû eve jî ne peyv û destewajeye û ti karêgeriyek jî nexistiye li ser hunera wê û şêwaza wê neşêwandiyê, bi vî cûrî jî bo vê gotinê jî hunera îzdîwac hatiye berhem dan.

1.11. Pêkve guncan “Li hev hatin”:

“*Pêktê ji selametiya peyvan di gel selametiya wateyên wan û parastina kurtî û guncana wan bi hevdu ve*”¹. Ji ber wê pêwîste gotin dûr be ji her cûrên kêr û kurtî û wateyên veşartî û forma şêlo jî bo peyvan, yanî: “*Gotin sax û bê xeletî bi hesanî ji wateya wê bê fehmkirin*”². Li vê derê heta hevok pabend dibin bi wateya ferhengiya peyvan û ji bo mebestekê aşkira derdibirin û durin ji her pêç û penaya wateya naçin û giran û dûr yan jî jêre hatiye gotin pêkve guncan: “*Ewe kû qiseker bêkû mebest axaftina xwe bike helbest*”³. Eve jî di pend û gotinan de vane vedibêjin kû di çend pajayek durist bûbin de û bê mebest dawî pajeyan de serwedaran têde çêbibe. Bo mînak:

“*Qisey kurt, dirêj meke, rêgey nêzîk dûr meke*” r.289

Li vê derê de wek tê dîtin ew keresteyên kû gotinan durist kirine hemî jî peyvên asan û zelal û sax û selametin, çî ji aliyê formê durin ji her nerêkî û şêloyiyek, çî ji aliyê wateyan ve kû her yek jî wan bi wateya ferhengiya xwe hatiye bikaranîn, bilêvkirin jî bê kêr û kurtî û giranî hîç zor li berxwekirinek berhem hatiye, koma wate û mebesta pendê jî aşkira û zelale û ji vî alî ve yê beramber hîç pirsgirêkek nîne di têgihîştina mebesta pendê de, ev şêwaza derbirînê jî di hevahengîya peyv û wateyan de jêre tê gotin hunerê pêkve guncan.

“*Befrî Adarê, bikewê heta gwêy darê, namînê ta êwarê*” r.93

¹ Haşimî, Seyid Ehmed, b. n. b. , r.253

² Muderrîs, Mela Ebdulkerîm, b. n. b. , r.58

³ Dr. Îdrîs 'Ebdulla, *Layene Rewanbêjîyekan le Şî'irî Klasîkî Kurdî da*, r.280

Peyv li vê derê asan, zelal û tèn zanînin, her yek ji wan bi wateya xwe ya ferhengî hatiye, kû bê hîç xwe zordayînê dawîya pajeyan de bi peyva serwedat hatiye û hîç giranî û nezelaî û tengiyek tède rû nedaye, şewazekê sade û rewankirî heye di komkirina wan de, peyv û wateyên wan pêkve guncanek ciwan di nav de berhem hatiye, evane jî wusa li gotinê kirine di bilêvkirinê de li guh xweş bèn û yê beramber “guhdar” bi hêsanî bê pirsgirêk bigehe wateya mebesta xwe. Bi vî cûrî hunera pêkve guncan hatiye berhem dan.

1.12. Paşserwa “redîf”:

Yeke ji hunerên ciwankariya peyvan, paşserwa jî: *“Peyv yan çend peyvin kû li pey peyva serwa de ye kû heman wate dubare dibin”*¹. Di pend û gotinan de ew peyv û wateyên digire nava xwe kû di dawîya peyva serwedat yan tîpa binçîneyî “rewî” de dubare dibine, bi heman form û wateya li vê derê ew pend û gotinên tene gotin kû di du pajeyan de zêdetir xweyî serwedat durist bûne, cihê serincê ye ew peyvên kû dubare dibin di dawîya wan de, divê peyvên pêşya wan xweyî serwa be, eger peyv tenê xwe dubare bikin bêkû peyva serwa pêş ve hebin, hingê nabite paşserwa, belkû dibe hunerek din “anîn”, paşserwa jî dikare “peyva hevokê ya firman... hwd” be.

“Asûde xom kerim nîye, le ka û co xeberim nîye” r.16

Ev gotin jî ji du beşên serwedat pêkhatiye, peyvên serwedat pêktên ji: “kerim, xeberim” tîpa “r” di her du peyvan de rewî ye, “e” ya pêş vê jî pêşrewî ye, tîpa “m” li pey cînavê zeliqandî ya paşrewî ye, peyva “nîne” li pey her du peyvan bi heman form û wateyan dubare bûye û bûye paşserwa “redîf” di dawîya her du pajeyan de.

“Eger mû be bext ebû, bizin le ser text ebû” r.34

Ev pend jî ji du beş pêkhatiye, peyvên serwedat pêktên ji “bext, text”, peyva “ebû” jî raste rast di pey re bi heman wate û form dubare bûye, bûye paşserwa “redîf” ji bo vê pendê. Her wuha ev pend jî kû dibêje:

¹ Gerdî, Ezîz, *Kêşnasî*, r.277

“*Heta hatim bû, her hat hatim bû, ke nehatim bû, ruwî zulatim bû*” r.428

Wek diyare ev pend jî ji çar pajeyan pêkhatiye û peyva “bû” di dawiya her yek ji wan de bi heman wate û form li pey peyva serwa de anîye û bûye paşserwa “redîf” ji bo her yek ji pajeyan, bi vî cûrî di vê pendê de jî hunera paşserwa ji bo pendê hatiye berhem dan.

1.13. Hevbirî “Hevbîrî”:

“*Ev şewaze di wate de diyar dibe kû du kes li du cihên cuda bê kû agah ji hevdu hebe, bi yek ziman yan du zimanên cuda heman tişt dibêjin*”¹. Hevbirî dikare di nava du netewe de jî durist bibe, yanî hevbirî hunereke peywendî bi lêkçoyîna bîrên du kes yan du komelga yan du neteweyên ciyawaz yan zêdetir heye kû di derbarê her tişt û diyardeyek de derencama jîngeh û barûdoxekê hevbeş ya hevserdem, yanî serdemên ciyawaz de çêbûbe.

‘Pendên pêşiyên’ yên Şêx Mihemedê Xal jî beşekê firewan ya pend û gotinên pêşiyên neteweya Kurd pêktînin, hunera hevbirîyê têde heye, kû wekî bûyîna heyîna naveroka wan li gel hindêk pendên milletên din, mînak bo vê jî li xwar bi kurtî çend pendekê Kurdî werdigrîn kû hevbirî têde durist bûne li gel komelek ji pendên neteweyên cuda cuda yên cîhanê.

Kurd dibêjin:

“*Her çî rîşî bê sofî nîye*” r.431 yanî “*Her çî rîşî sûr bû Hemze axa nîye*” r.431

Yanî nabe mirov ji ber yek berjengê pêkçoyîn û goman li ser tiştan nehêle nabe biryara dawî li ser bide, di beramber vê de Ereb dibêjin:

“*Hemû reşêk xurme nîye*”².

Faris jî ji bo vê dibêjin:

¹ Îdrîs 'Ebdulla, *Kowanekanî Rewanbêjî*, r.69

² Helebceyî, Husên Mehmûd, *Pendî Gelan (5000 Pend)*, ç.2, Çapxane û pexşî Rênima, Silêmanî, 2014, r.125

“*Hemû mêzer be serêk şêx nîye*”¹.

Di pendekê din de Kurd dibêjin:

“*Zerer le nîwey bigerêtewe her başe*” r.228

Yanî her kar û xebatek eger her zerer jê bibînî, ewe nîvçe bimîne baştîre ji wê ta dawî li ser zerer û zîyanê dewam bikî. Hindî jî kû neteweyek bi hezaran mîl ji neteweya Kurd dûre heman ezmûn û bîrkirina wan hebûye kû dibêjin:

“*Geranewe le nîway rêga baştîre lewey rêga wind bikeyt*”².

Di pendekê din de Kurd dibêjin:

“*Ziban biwestê, ser rehetê*” r.228

Yanî mirov rasta her girêft û derdek ya janaseriyê bêt bi rêya zimane, ji ber vê çendê eger ziman raweste ji qîseyên nayên xwestin, hingê ser û giyan jî parastî aram dibe, heman naverok di pendekê Turkî de jî heye kû dibêje:

“*Ewey zimanî xoy girt, serî xoy parast*”³.

Di pendekê din Kurd dibêjin:

“*Daye bibîne, diwête bixwaze*” r.185

Evane jî bi wê wateya kû rewîşt û silûkî keç dişibe ser yê dayîka wê ve, eger dayîk çawa be keç jî wusa ye, li beramber vê diyardeyê heman naverok di pendekê Emrîkî de heye kû dibêje:

“*Pêş ewey kiçî bixwazît temaşay daykî bike*”⁴.

Di mînakek din de Kurd dibêjin:

“*Qise ya le şêt bibîste ya le minal*” r. 287

¹ H. b. r.264

² H. b. r.285

³ Îdrîs 'Ebdulla, *Edebî Mîllî û Folklorî Kurdî*, b.2, ç.1, Ekadîmyay Kurdî, Hewlêr, 2014, r.77

⁴ H. b. , r.256

Ev jî tê wê wateya ji ber kû kesayetiya van du çînan dûrin ji her xirabî û fêhl û direwek ji bo veşartina qîseyan. Heman naverok li gel neteweyên Înglîz û Kanadî jî hene: bo mînak:

Înglîz dibêjin:

“*Mindal û şêt راستیەکان دەلەن*”¹.

Kanadî jî dibêjin:

“*Şêt û mindal hemîşe راستگون*”².

Di pendek din de Kurd dibêjin:

“*Çolekeyekî naw dest, baştîre le de colekey ser dirext*” r.157

Ev jî tê wateya her tiştêk yê te be eger kêm jî be baştir ji wê yekê kû gelek be û ne yê te be, heman naverok di pendekê Elmanî de bi şêwaza keresteyek ciyawaz kû dibêje:

“*Masiyekî ser mêz, baştîre le masiyekî gewrey naw derya*”³.

Yanjî di vê mînakê de Kurd dibêjin:

“*Carêk xeletandimit xwa bitgirê, carî duwem xeletandimit xwa xom bigrê*” r.145

Ev jî tê wê wateyê kû mirovek divê jîr û wurya be û nabe ji aliyê yek kes ve du car fêhl lê bêr kirin, ji ber di cara yekem de şareza bûye, ji ber wê divê lomeya xwe bike, ne li ti kesek din. Heman naverok û wate di pendekê dûr neteweyî wek Ûsturalîyan de heye kû dibêje:

“*Eger mirov carêk fêlî lê kirdim 'eybe boyî, eger du car kirdî eybe bo min*”⁴.

¹ Helebceyî, Husên Mehmûd, b. n. b. , r.174

² H. b. , r.202

³ H. b. , r.208

⁴ H. b. , r.224

BEŞA DUYEM

2.HUNERA CIWANKARÎYA WATEYAN:

2.1- Dijyek ‘‘Tîbaq’’ :

‘‘Komkirina du wateyên dijîyektire’’¹. Vica evane di her peyv û wajeyek de bin yanî her tiştê bigere nava beşên axaftinê, bi şêweyekî zelaltir dijyek: ‘‘Pêktê ji komkirina du tiştên dijyek, bi wateya du wateyên beramber yek di hevokê de’’². Ev hunere jî yek ji wane ye kû bikaranîna wê çalake di axaftina asayî ya rojane de, rengdana wê jî di pend û gotinên pêşyan de bi şêweyekê berçave.

Bi giştî dijyek dibe du cûr:

A- Dijyeka ferhengî yanî ‘‘dijyeka erênî’’ :

‘‘Pêktê ji anîna du peyvên dijyek kû erênî bin’’³. Yanî her yek di ferheng de xwedî kok û wateyek serbixwe bin, kû wateya xwezayî ya xwe ne. Nexistibin rewşekê rêzimanî û nerênî.

‘‘Têr agay le bîrsî nîye’’ r.142

Peyvên ‘‘têr’’ û ‘‘bîrsî’’ dijberên hevdu ne. Her yek jî reftarek cuda û serbixwe hene di ferhengê de.

B- Dijyeka ne Ferhengî yanî ‘‘dijyeka nerênî’’:

‘‘Komkirina du firmanên yek çavge yek jê nerênî ya din jî erênî be’’⁴. Wate her du peyv yek koka ferhengî heye. Lê ji ber sedema rewşekê dijwateya ve yek ya nerênî kiriye bi morfîmeka nerênîkirin, vica ne merce du peyv tenê

¹ Tebîbyan, Seyd Hemîd, *Ayîn Dirust der Daniş Belaxet we 'Eruz*, ç.1, Întîşarat Emîr Kebîr , Tehran, 1392 het, r.143

² Metlub, Ehmed, *El-Belaxe El-'Erebîye (El-Me'anî Wel-Beyan Wel-Bedî)*, t.1, 1400 h.-1980 m, r.285

³ Tebîbyan, Seyd Hemîd, *Beraber hay 'Ilûm Belaxet der Farsî û 'Erebî*, ç.2, Întîşarat Emîr Kebîr, Tehran, 1392 het, r.411

⁴ Metlub, Ehmed, *Mi'ecem El-Mustelehat El-Belaxîye wetetewiruha*, t.1, cz.3, Dar El'erebîye Lîlmewsu'at, Beyrut- Lubnan, 1427 h. – 2006 m, r.67

firman bigrin nava xwe, dikare beşên din yên axaftinê jî bin: wek: nav, hevalnav, hevalfirman...

“*Goştî naxwa herame, goştawî exwa be tame*” r.341

“naxwe, exwe” di pajeya yekem û duyem de du peyvên dij û berevajiyê hevdune, her du jî xweyî koka firmanîne, bi sedema rewşekê rêzimanî morfîma nerênî çoye ser peyva yekem. Nerê peyva duyem çêkiriye.

2.1.1.Cûrên Dijyek li gora cûra rêzimanî ya peyvên dijwateyan:

2.1.1.1. Nav: Yanî wateya peyva dijwate di beşa axaftina nav de bin

“*Şerî jin û mêrdan, heta mal nûstînan*” r.266

Peyvên “jin û mêr” di rêgez de dij û berevajiyê hevdu ne, her du jî du navên giştîne û xweyî kok û çiqek serbixwe ne.

“*Em mirdûwe, bem şîwene, zindû nabêtewe*” r.49

Peyvên “mirdû” û “zindû” du navên wateyîne û dij û berevajiyê hevdu ne. Her yek ji wan jî kokek serbixwe hene.

2.1.1.2. Hevalnav: Yanî peyvên dijwate hevalnav bin.

“*Sebir tale û berî şîrîne*” r.240

“tal” û “şîrîn” du hevalnavin di wate de dij û berevajiyê hevdu ne, her yek ji wan serbixwene di ferheng de.

“*Nanî merd le sikî namerd da namênê*” r.402

Peyvên “merd” û “namerd” hevalnavin bi sedema nerênîkirina peyva duyem dijyêke, herdu peyv jî yek kok û çîqa ferhengê heye, bi vê jî wateya neferhengîne.

2.1.1.3. Hevalfirman: Peyv divê hevalfirman bin.

“*Kêm bilê û gelek bibe*” r.311

Kêm û gelek Du peyvên hevalfirmanîne, di wate de dij û berevajiyê hevdu ne û her yek ji wan jî kok û çîqa wan serbixwe ye, yanî dijiyekên ferhengîne.

“Tund bigre şil dê, şil bigre hîç dê”

Tund u şil du peyvên navin, di wate de dij û berevajiyê hevdu ne û her yek ji wan jî kok û çîqa wan serbixwe ye, yanî dijiyekên ferhengîne.

2.1.1.4. Firman: Yanî peyvên dijiwate ji firmanan pekhatibin vica her çî firmanên temam bin anjî netemam.

“Ser bide, sir mede” r.243

“bide” û “mede” du firmanên daxwazîne yek di rewşa nerênî de yek jî di rewşa erênî de bi vî awayî bûne dij û berevajiyê hevdu, herdu jî yekrengiya ferhengî heye, ji ber wê sedemê dijiyeka neferhengî di firmana temam de durist bûye.

“Aqil ker ebê, ker aqil nabê” r.275

“dibe” û “nabe” du firmanên bêhêzin, ya duyem nerênîya ya yekeme, ji ber wê bûye dij û berevajiyê hevdu, her du jî ji yek koka ferhengî hene kû çavge “bûn” e. Bi vî awayî dijiyeka neferhengî di firmana bê hêz de durist bûye.

“Sûk biro, selamet werewe” r. 257

“biro” û “were” du firmanên daxwazîne. Wateyên wan dij û berevajiyê hevduye û her yek ji wan kok û çîqek serbixwe heye di ferheng de bi vî awayî dijiyeka ferhengî di firmana temam de durist bûye.

2.1.1.5. Çavge: Yanî peyvên diji ber çavge bin.

“Peşîmanî newitin le peşîmanî witin çaktire” r.115

“newitin” û “witin” du çawigên talî yên têperin kû ya yekem nerêniya ya duyeme, bi vî awayî bûne di jyek di herduyan de ji yek kokê hatine, yanî ne ferhengîne.

“Pêkenînî zor giryanî le diwawe ye” r.124

Peyvên “Pêkenîn” û “giryân” du çavigin, ya yekem çavgeyekê yaî ye, ya duyem çavgeyekê elfî ye, herdu jî têneperin. Di wate de jî berevajiyê hevdu ne, her yekê kokekê serbixwe heye. Evane wateya ferhengî ne.

2.1.1.6. Dijyeka Ferhengî ya bi amraz:

Ev ew amrazan digire nava xwe kû erkê nerênî kirin û erênî kirinê werdigrin. Wek pêşgirek li pêş peyvên tên. Li beramberê hevdu dijyeki çêdikin.

“Berêz xawenî nake bêrêz” r.79

“be” û “bê” du amrazin kû wekû pêşgir hatine, berevajiyê hevdu ne. Ya yekem erkê erêkirinê, ya duyem jî erkê nerênîkirinê girtiye. Heryek ji wan jî serbixwe ye. Bi vî awayî dijyekiya ferhengî ya bi amraz di gotinê de çêbûye.

2.1.1.7. Dijyekiya Zaravî:

Ev ji hingê pêktê kû gotinek olî yan civakî yan wêjeyî yan her gotinek din kû berevajiyê xwe werbigre.

“Na 'elacî heram helal eka” r.398

Gotinên “heram” û “helal” du peyvên dijberê hevdu ne, her yek ji wan serbixwe ne. Bi vî awayî dijberiyek ferhengî ya gotinan çêbûye.

2.1.1.8. Dijyeka Bincî:

“Ew diyyeke kû peyvên diyar û serbixwe bin di ferhengê de di derketinê de berevajiyê hevdu bin.”¹.

“Hat binû, nehat binû” r.425

Peyvên “hat” û “nehat” bi temamî berevajiyê hevdu ne.

“Gewre aw erêjê û biçûk pêy tê exa” r.332

Dijyeka di peyvên “mezin” û “biçûk” de çêbûye, evane di ferhengê de jî berevajiyê hevdu ne.

2.1.1.9. Dijyeka Tevlîhev:

“Ew diyyekîye kû ew peyvên diyar û serbixwe lê belê di ferhengê de neberevajiyê hevdu ne.”²

“Mar ekujê û tûlema bexêw eka” r.369

Li vê derê hunera dijyekiye dinavbera “ekujê” û “bexêw eka” de çêbûye. Lê belê li hemberî “Ekujê” dijyeka xwe ne girtîye. Lê belê ji ber gihandina wate û armnca pendê hevoka “Bexêweke” dîcihê wê de hatîye. Ev jî ne dijyeka “Ekujê” ye. Ji ber ku rastîya dijyekê dibe “Nakujî” ç. Her wisan dijyeka hevoka “Be xwêeke” hevoka “Bexêwnake” ye. Di vir de jî ne hatîye, di vir de jî du tişt tevlîhev kirîne. Hevoka “bexwêeke” wisan berdest bûye heman wateya “Ekujê” werbigire. Ev corê dijyekê jî pêwîstî bi raman û hizirîne heye. Dijyeka dur jî têkçûwe.

2.1.1.10. Dijyeka diyar:

“ji komkirina du wateyên berevajiyên hevdu kû çî ferhengê bin yanî neferhengê bin.”³

“Karî zil be biçûk mespêre” r.294

¹ Îdrîs 'Ebdulla, *Şêwaz*, b. n. b. , r.134

² H. b. , r.134

³ Dr. Îdrîs 'Ebdulla, *Ciwankarî Şî'irî Klasîkî Kurdî*, r.96

“zil” û “biçûk” du berjengin, di wateyê de bi awayek diyar dijberê hevdu ne.

2.1.1.11. Dijyeka nediyar: “*Pêktê ji komkirina du wateya kû yek ji wan peywendî heye bi peyva din ya dijber re, ne girînge peywendiyekê pêwîstî be yanî sedemî be anî her peywendiyek din be*”¹.

“*Xoy lêreya kilkî le Bexda toz eka*” r.179

Di beşa yekem de peyva “lêre” hatiye, kû wateya nêzîk dide, dijberê wê jî bi awayek diyar nehatiye diyar kirin, lê di beşa duyem de bi awayê “kilî le Bexda toz eka” hatiye, ew jî tê wateya “le wê”, mebesta wê dûriye û bûye berevajiyê peyva “lêre”. Bi vî awayî dijyekiya nediyar pêkhatiye.

2.1.1.12. Dijyekiya Dirke “kîneye”:

“*Ew dijyekiye kû her du peyvên wê di wê parçeya têde hatine dirkeyek durist dike*”².

“*Gurge û le pêstî meraye*” r.335

Eve jî wateyekê dirkeyî heye, mebest ewe kû mirovê xirab û durindeye kû bi awayê başû paqij xwe nîşan dide, li vê derê dijyeki di nava “gurg” û “pez-mer” de çêbûye. Gurg kinaye ye kû niyet pîs, qirêj û durinde ye û pez jî kinaye ye kû niyet pak û selamete. Bi vî awayî her du nav bûne dijberê hevdu û hunera dijyeka kinaye çêbûye.

2.1.2. Dijyeki ji aliyê rewşên Dijyekiyan ve:

2.1.2.1. Dijyeka yek rewşî yan sade:

Pêktê ji di nivîsînê de tenê yek rewşên dijyeki hebe.

“*Gewre delên le xanan, giçke degêrnewe le banan*” r.332

¹ H. b. , r.96

² H. b. , r.95

Li vê derê rewşa dijberiyê tenê carekê çêbûye ew jî tenê di nava peyvên “gewre” û “gîçke” de çêbûye. Ev peyvane her yek serbixwe ji ya din.

2.1.2.2. Dijyeka du rewş:

Pêktê ji dema dinivîsînê de du rewşên dijyekî hebe.

“*Siwar û piyade her egene cê, belam dereng û zû ekewê*” r.256

Li vê derê du rewşên dijyekî çêbûne. Ya yekem di nava “siwar” û “piyade” ye, ya duyem jî di nava “direng” û “zû” de ye kû evane jî berevajiyê hevdu ne. Bi heman awayî her yek ji wan serbixwene. Bi vî awayî dijyeka du rewşî çêbûye.

2.2. Beramberî:

Beşeke girînge di hunera ciwankariyê de, beramberî jî dijyekerê hatî firehkirine. “*Ewe kû wateyek guncan yan zêdetir bîne û piştire biheman pêkhateyê re bîne beramberê hev*”¹. bi wateyek din, “*du peyv yan zêdetir bîn, li beramberê vane jî dijwateyên wan bi rêz bêne cihkirin*”². Ev huner yeke ji wan ciwankariyane kû şeklek dide pend û gotinan.

2.2.1. Beramberî ji aliyê jimara peyvên beramberî ve:

2.2.1.1. Beramberiya du bi duyî: Ji wê beramberiyê pêktê kû destpêkê du peyv yan wate ye, di beşê piştire de jî beramberê her yek ji wan bêne. Bi vî awayî jimara peyvên beramberî yê çêdikin dibin çar.

“*Taziye dewlemend, şayî feqîre*” r.134

Di destpêkê de peyvên “taziye” û “dewlemend” hatine, di beşê piştire jî ji bo her yekê beramberek hatiye. Li bermaberê “taziye”, “şayî” û li beramberê “dewlemend”, “feqîr” hatiye. Bi vî awayî beramberî du bi du di vê pendê de çêbûye.

¹ Haşimî, Seyid Ehmed, b. n. b. , r.221

² Itîq, Umer, *Mi'ecem El-Mustelehat 'Îlim El-Belaxe*, t.1, Dar Usame Lineşir wetewzîh, Ūman- Erden, 2016, r.365

“Dujminayetî zana, le dostayetî nezan xoştire” r.210

Di destpêkê de peyvên “dujminayetî” û “zana” hatine, di beşê duyem de li beramberî “dijminahî”, “dostayetî” hatiye kû dijberên hevdu ne. Li beramberê “nezan”, “zana” hatiye, evane jî dijberên hevdu ne. Bi vî awayî hunera beramberîya du bi du di pendê de çêbûye.

2.2.1.2. Beramberiya Sê bi sêyî: Ji wê beramberiyê pêktê kû di destpêkê de sê peyvên tîne, di beşê din de jî ji bo her yek ji wan beramberek tîne. Bi vî awayî hêjmara peyvên beramberiyê çêdikin dibin şeş.

“Helal binî barîke û serî qewî, heram binî qewîye û serî barîk” r.162

Di beşa yekem ya vê pendê de “helal, barîk, qewî” hatiye, li beramberê vane di pey re jî peyvên “heram, qewî, barîk” hatine, yanî li dijî “helal, heram” û “barîk, qewî” û “qewî, barîk- tenik” hatiye. Bi vî awayî beramberiya sê bi sê çêbûye. Ji derveyê vê di nava hemî peyvên vê pendê de peywendiya dijîtiyê heye. Di beşa yekem de peyvên “bin û barîk” hatiye, li pişt wan peyvên dijber hatine kû ewane jî “ser û qewî” ne. Bi vî awayî heryek ji beşên pendê beramberiya du bi du jê çêbûye. Bi giştî tenê di vê pendê de du cûrên beramberî “sê bi sê” û “du bi du” çêbûye. Ji vê re dibêjin beramberiya pir rewşî.

Ciyawaziya di navbera dijyekî û beramberî de:

- Ew peyvên dijyekiyê çêdikin nabe jimara wan ji duyan kêmtir be. Lê di beramberî de nabe ji çaran kêmtir be, eger zêdetir jî be, dibe.

- Di dijyek de peyv û waje, di paje û beşan de divê li peyhev bên. Yanî dema peyv hat divê peyva dijber li pey wê bêt. Lê di beramberî de ev ne şerte. Dikare di serî de çend peyvek bin, di beşên pey re dijberê wan jî bêne. Mînak: ger di serî du peyv hatin, divê du piştê li beramberî wan du peyv bên.

2.3. Pêçe û pexşe “Lef û neşir”:

Ewe ku: “*Di serî de çend peyvek yan babetekê beşek gotar yan helbestek bêne kû jêre dibêjin "Lef yan pêçanewe". Piştî di beşên pey re di gotar yan helbestê de zelalkirin di derbarê wan de bêne, ji vê zelalkirinê re dibêjin "pexşkirin yan neşir"*”¹. Yanî di serî de çend peyvek tê qedandin jî beşên pey re li cihê wê peyvên din tê pexşkirin kû peywendiya pêve heye, li vê derê peywendî di nava peyva destpêk û dawîyê de heye. Ev peywendî dikare peywendiya lihevhatî, yan pêwîstî yan lêkçoyîn yan diyek yanjî her peywendiyek din be. Lê belê nabe peywendiya nava hemiyan de diyek be, ji ber kû wê demê nabe ew hunerê Pêçe û pexşe, belkû dibe beramberî.

Pêçe û pexşe dibe du cûr:

2.3.1. Pêçe û pexşeya temam “rêk”: Evane jî di wê peyvên pêçe, rêk û beramber bin di gel peyvên pexşê di rêzbûnê de. Wate peyva yekem ya pêçe beramberî peyva yekem ya pexşe bêt. Peyva duyem beramberî duyem be..., hwd. Mînak:

“Hêlkey emro le cûceley sibeynê baştire” r.450

Di beşa yekem de peyvên “Hêlke” û “emro” bi hevdu ve hatine kirin, di beşa piştî de jî “cûcele” û “sibeynê” hatine pexşkirin. Hêlke beramberî cûcele û emro ji bermaberî sibeynê hatine. Bi vî awayî pêçe û pexşeya duyîya temam “rêk” çêbûye.

2.3.2. Pêçe û pexşeya netamam “nerêk”: Ev jî ewe kû peyvên pêçe rêk û beramberê peyvên pexşe nebin, di rêzbendiyê de. Yanî peyva yekem ya pêçe beramberî peyva duyem yan sêyem ya pexşê bêt, yanjî ya duyem ji bo ya yekem be, yan berevajî be. Mînak:

“Siwar û piyade her egene cê, belam direng û zû ekewê” r.256

Di beşa yekem de “siwar” û “piyade” hatiye kû evane pêçene, di beşê pey re peyvên pexşe anîye kû evane jî “direng” û “zû” ne. Beramberî peyva

¹ Şemîsa, Sîrus, b. n. b. , r.165

“siwar”, “zû” û “piyade”, direng” pexş kiriye. Bi vî awayî pêçe û pexşeya netemam “nerêk” çêbûye.

2.4.Çavliyek“Mura'atînezîr”:

Yeke ji ciwankariya wateyî. Hinek caran jî jêre hatine gotin “pêkve guncan” . Pêktê ji: “*Komkirina du peyvyan yan zêdetir yan du destewaje yan zêdetir jî ber li hevhatin bi şeweyekî wisabin kû ne berevajiyê hevdu bin*”¹. Bi vî awayî ew peyvên ev huner li ser pêktên merce kû peywendiyekê hevşeweyî yan hevcûrî di wate de bi hevdu re hebe. Di wê hunerê de merce nabe ji du peyv yan du destewajeyan kêmtir bîn, eger ne wusa be hunera wê çênabe. Eger ji duyan zêdetir jî be asayîye û ciwantire. Vica ew peyvên ji bo vê armancê hatin di nava pend û gotinan de bi du şeweyan tîn rexhev û li peyhev tîn yan jî her yek dikeve cihek û beşek yê hevokê, li gora van du şeweyên li jêr mînakyan pend û gotinan hatine.

2.4.1. Eger peyv li rexhev û li peyhev bin:

“*Jimarey cûcele û mirîşk le payîz der ekewê*” r.235

Peyvên “çûcele” û “mirîşk” kû di nava vê gotinê de hatiye ji ber kû peywendiya hevşeweyî û bi hevguncanê heye, hunera çavliyekê çêbûye, li rexhev û li peyhev hatine.

“*Tîr û şîr leyek esûn*” r.143

Li vê derê peyvên “tîr” û “şîr” kû her du jî amêrên cengî yên kevnin, bi sedema peywendî ya pêkveyî û bi hevduguncandin li gel hevdu hatine bikaranîn, cihbicihbûna wan li pal hevdu û ketina li dûv hevdu, bi vê şeweyî hunera çavliyek durist bûye.

2.4.2.Eger peyv ne li pal hevdu bin:

“*Bawke bela ye, dayke qeza ye, jin nî'metî xwa ye*” r.71

¹ Ebdulselam Salar 'Ebdulrehman, *Hunerî Rewanbêjî le Şî'irî Nalî da*, Tezê Master, Beşî Kurdî , Kolêjî Ziman, Zankoy Silêmanî, 1420 h.- 2000 z. , r.188

Li vê derê navên “bav”, “dayîk” û “jin” bi sedema li hevdu nêzîkbûna peyvvan li gel hevdu hunera çavliyêk hatiye afirandin. Her yek ji wan jî cihê wan ketiye li serê pendekê di van gotinan de, û neketine li dûv hevdu.

“*Hesp le jêr kurtan, ker le jêr zîn*” r.26

Di peyvên “hesp, kurtan, ker, zîn” de bi sedema pêkveyî û li hevdu nêzîkbûnê hunera çavliyêkê durist bûye, peyv jî neketine li dûv hevdu, belkû her yek ji wan cihek yê pendê de.

2.5. Ciwanîya Hokar – sedem “Ciwanî bayis” :

Ev huner jî peywendiya xwe bi hokarên duristbûna tişt û diyardeyên wê ve heye, bi vî şêweyî hatiye pênasê kirin: “*ewe kû “sedem” hoyekê guncaw ji bo diyardeyekê bîne, bi şêwazekê ciwanî ya nerasteqîne*”¹. Diyardebûyîna wan tiştaneya û diyardeye kû ji bo xwe tîne meydanê bi hokarekê zanistî yan sirûştî ve durist dibe, lê ev hokare tê pişt guhxistin û hoyekê din ya nerasteqîne vica her çi tiştêk be kû nîşaneya nerasteqîneya hunera ciwanî hebe jêre tîne. Ev huner jî mîna gelek hunerên din ciwankarîya wateyî, di çend pend û gotinan de reng daye kû tam û lezetekê cuda ya wateyi ya ciwanîyê pê dibexşin. Bo mînak:

“*Elê Jale bo wa talît? Elê: le ber bira mirdin, gulit bo wa ciwane? Le ber dost û dujmin*” r.36

Di gotinê de li du cihan hunera “ciwaniya hokar” hatiye bikaranîn, ya yekem tehlebûna gula jale ye kû hokarekê sirûştî ya wê gulê ye, ji ber sedema pêkhateya xwe tama wê tehle, ev jî sedemek kû hoyekê rasteqîneye kû peywendî bi zanista ruwaknasiyê ve heye, lê li vê derê ev hoya jê hatiye birin û hoyek din ya nerasteqîne jêre hatiye gotin kû ew jî “bira mirin” e, bi jêbirina hoyê rasteqîne û anîna hoya nerasteqîne, hunera “ciwaniya hokar” hatiye

¹ Xetîb El-Qezwînî, Cêlêdîn Muhemed bin 'Ebdulrehman, *El-Telxîs fî 'Ilûm El-Belaxe*, ş.: 'Ebdulrehman El-Berquqî, Dar Elkîtab El-'Erebî, Beyrut – Lubnan, Dune Sene Eltebi', r.375

berhem dan. Ji bilê vê ciwaniyek din jî têde heye kû “Jale” navê gule û li vê derê bi vî navî hatiye karanîn kû di demekê de navê “bira” li gel wê hatiye, aşkiraye kû “bira” ji bo mirov tê bikaranîn nekû ruwek “hişînatî”, vê jî ciwaniyek din bexşîye. Di ya duyem de ciwaniya gula Jale sedema rasteqîneya wê ye kû xwezaya gulê bi xwe wusa yekû eger av û ax û hewaye jingehê tenduristî hebe ew jî wê weke hemî gulan ciwan be û sîs û hişk nabe, lê belê li vê derê ev hokar jêhatiye birin hoyek din yê nerasteqîne di cihê wê de hatiye, ew jî “ji ber dost û dujmine” . Bi vî awayî tenê di vê gotinê de li du cihan hunera “ciwaniya hokar” hatiye berhem dan. Jixwe wateya pendê jî ewe kû kesek kû mijûlî du karên berevajî be, ji bo herduyan jî pozşîkî jêre anîye û dixwaze pîne bike.

“*Be gulyan wit bo wa geşî? Wifî: baxewanekem merde*” r.82

“Geşîya” gul hokara wê çendê ye kû sirûsta gulê wusane kû eger jingeyekê heyî ji av û ax û hewa jêre bêt amadekirin hingê ew geş û ciwan dibe, yanî hokara rasteqîne hokarekê hatiye veğerandin, di demek de kû berjenga “merdî” ya baxçevan ti karêgeriyek nîne di ciwanî û geşîya gulê de, bi vê hokarê nerasteqîne “ciwaniya hokar” ji bo pendê hatiye berhem dan, wateya pendê jî gihiştîye bo kesekê zor ciwan, rêkûpêk û qoz kû ji saya mezinên xwe wusa lê hatiye.

2.6. Tilnîşan “Telmîh” :

Tilnîşan ewe kû xweyî deq yanjî gotine “...*Bi rêya peyvek yan wateyek, amaje ji bo ayatek ya Qurana pîroz, yan fermûdeyek ya pêxemberê xweda “silava xwedayê mezin li ser be”, yan destan û çêrok û efsaneyek yan ya kesayetekê navdar yanjî rûdawekê dîrokî be..., yan her tiştek din ya hevşeweyê wan be*”¹. Di vî hunerî de ger amajedayînên heyî nebe bi şeweyekî kamilî hemî babetan bi têr û tengî zelal bike ku xwe jî ji çend hevok û parçe hevokan pêkhatîye, ji ber ger ew dem nabe tilnîşan belkû dibe lêwergirtin yan têhilkêşî ku evane jî cudane, ji ber wê jî divê amajedanên wan bi şeweyek be kû tenê

¹ Îdrîs'Ebdulla, *Hendê Hunerî Ciwankarî le Şî'irî Pîremêrd da*, Ekademî Kurdî-Kowarî Korri Zanyarî Kurdistan, j.6, Hewlêr, 2007, r.301

nav anîna bes bêd durbe ji her helwestekirinê û şîrove û zelalkirin. Pêwîste bi şêweyek be hemaheng û guncan û rêkeftin peyda bike di gel naveroka û furma mijara heyî.

Tilnîşana bi peyv û Tilnîşana bi wate:

A. Tilnîşan bi peyv: Ew tilnîşaneyê kû bi peyv anjî destewajeyek amaje bi fermûde yan ayatek yan kesayetek yanjî her tiştekê dîtir dike.

“*Nirxêke û Şa 'Ebas biryûwyetî*” r.412, yanjî “*Dilêke û Şa 'Ebas birdûyetî*” r.206

Navê “Şa 'Ebas” di van du mînakyan de tilnîşane ji bo yek jî şahên navdar yê Faris kû “*serdema femandartiya wî vedigere ji bo salên 1587-1638*” z., *wekû 'Ebasê Mezin navdar bûye çarem fermanrawetiya binemala Sefawiyên Îranê bûye*”¹. Bi vî awayî di gotinê de tilnîşan ji bo vî kesayetiye dîrokî hatiye kirin.

B. Tilnîşan bi wate: Ew tilnîşaneyê kû bi wateyek yanjî komwateyan çend peyvek tilnîşan dike yanjî rûdawek yan kesayetiye yan her tiştek dîtir pêname dike.

“*Elêy dirkê Mem û Zîne*” r.39

“Dirkê Mem û Zîn” wateyekê tilnîşane ji bo wî kesî beşdarî kû bi “Bekir Mengewer” hatiye naskirin, di Destana Mem û Zîn de qala wî hatiye kirin kû herî dawî di naverasta gora herduyan de hat kuştin, li cihê xwîna wî hişkedarek û xarî hişînûye.

Cûrên Tilnîşan:

2.6.1. Tilnîşan ji bo sûretekê Qurana pîroz:

“*Le ‘qul hwe Ellahu - قُلْ هُوَ اللَّهُ’ satme eka*” r.357

¹ Yasîn Sabir Salh, *Însayklopûdyay Gîştî*, b.2, ç.2, Dezgay Serdem, Silêmanî, 2009, r.529

“qul hwe Ellahu” - قُلْ هُوَ اللَّهُ أَحَدٌ” di Qurana pîroz de kû eve:

”قُلْ هُوَ اللَّهُ أَحَدٌ (١) اللَّهُ الصَّمَدُ (٢) لَمْ يَلِدْ وَلَمْ يُولَدْ (٣) وَلَمْ يَكُنْ لَهُ كُفُوًا أَحَدٌ (٤)”¹

2.6.2. Tilnîşan ji bo ayatek ji ayatên Qurana pîroz:

“Ewende bawerî pê bike bilê: Xuda yeke” r.56

“Xuda yeke” ev jî wateyekê tilnîşane ji bo beşek ji ayetên yekem yên sûreta “îxlas” di Qurana pîroz de kû eve: “Qul hwe Ellah ehed “1” - أَحَدٌ قُلْ هُوَ اللَّهُ” , ji bilê vê jî, ev tilnîşane ji bo yek ji wan ruknên îmanê di Îslamê de kû “La Îlahe Îlallah- لا اله الا الله” e jî, her wuha di çendîn ayat û fermûdeyên din de jî behs hatiye kirin.

2.6.3. Tilnîşan ji bo çêrokek folklorî:

“Bû be gîskekey Heyasî xas” r.105

“Gîska Heyasê xas” tilnîşane ji bo wê çêroka di navbera Sultan Mehmûdî Xeznewî û Heyasê Xas de rû daye, di çêrokê de dibêje: “*Sultan Mehmud gîsk dide destê Heyasê xas û jêre dibêje: Ev gîsk ne bêje difiroşim, xweyî bike ji bo salekê, nabe ne zêde bike ne jî kê, wî jî gîskê girêda û guriyek jî bi dîwar ve girêda, gîsk her cara çavê wê bi gurg dikeve ji tirsax zexim nabe, her wuha kû ewqas ji Sultan Mehmud ditirse ji ber wê jî ewlekariya wê baş digirt; vica ev yek ji bo kesek tê gotin kû ji tirsax tiştêkê zexim nebe-pêşnekeve*”².

2.6.4. Tilnîşan ji bo keresteyekê dîrokî: Ew tilnîşana kû bi peyvan bi wate amaje bi keresteyekê cengî yan her tiştêkî din yê dîrokî bike kû navdar û bêt zanîn be.

“Zulfîqar bo hemû Elî nawê nehatwe” r.233

¹ Qurana pîroz, sûreta Îxlas.

² Xal, Şêx Mihemed, b. n. b. , r.105

“Zulfîqar” tilnîşane ji bo navê ew şûrê Îmamê Elî, tê gotin kû şêwazekê taybet yê wê di çêkirinê de hebû, gelek bihêz û giran bû. Di gotinê de dibêje du serîyên ji hevdu cuda hebû, ji ber wê jî jêre hatiye gotin “Zûlfîqar”, bê tilnîşan navûdengê wê maye û behsa wê tê kirin.

2.6.5. Tilnîşan ji bo kesayetiyên ayînî: Ew tilnîşaneyê kû ji bo kesayetên ayînî tê bikaranîn, çî bi şêwe yan bi wate:

“Destî dwazde îmamî birîwe, be şiwên çwarde me'suma egerê” r.194

“duwazde îmam” û “çarde me'sum” tilnîşane bo îmamên Şî'e pêktê “1- Îmamê Elî, 2- Huseyn, 3- Hesen, 4- Elî kurî Huseyn, 5- Mihemedê kurî Elî “baqir”, 6- Ce'ferê kurî Mihemed kurî Elî “Sadiq”, 7- Musayê kurî Ce'fer “Kazim”, 8- Elî kurî Musayê Kazim “Elî Reza”, 9- Mihemedê kurî Elî “Cewad”, 10- Elî kurî Mihemed “Hadî”, 11- Hesenê kurî Elî “Eskerî”, 12- Ehmedî kurî Hesen “Mehdî” . çarde me'sum ew duwazdene kû li pey pêxember “silavên xwedayê mezin li ser bin” li dâv Fatime”¹. derbaz dibe.

2.6.6. Tilnîşan ji bo berhemekê Edebî yê navdar: Ev jî ew berhemaneke kû şahkarekî cîhanî digire nava xwe.

“Elif leyle exwênê” r.36

“Elif leyle” amajeye bo ew berhemê folkloriyên navdar kû şahkarên cîhanî digire nava xwe, bi çêrok, hikayet behsa zorbeyê mîletên Rojhilatî dike. gelek dûr û dirêje ji aliyê her mîletek ve cuda hatiye naskirin. Ji bilê vî navî jî Kurd ji bo vê berhemê “Hezar û Yek Şev” gotine.

2.6.7. Tilnîşan ji bo kesayetên diyar yê dîrokî: Amadekirine ji bo wan kesayetiyên palewanên çêrokan bin kû dem û dem mayîne yan kesayetekî destheladar bin, paşa û siyasî bin, ji ber her sedemek ji sedeman nav û dengê wan çêbibe û navê wan ketine di nav edeba devkî de, bi taybetî di pend û gotinan de.

¹ H. b. , r.194

“*Behlûlî Bexdaye, raze bû be kaye, kaşyan nedaye*” r.94

“Behlûl” tilnîşane ji bo wan kesê navdar kû dîroka wî di serdema Xelîfe Harûne Reşîd de ye kû kesekê pîr û dana û arîfekê serdema xwe bû. Ji ber taybetiya wî xelk bi şêr danîne, dehan çêrok û serpêhatîyên seyr di derbarê wî de hatine gotin ta kû niha jî têne behs kirin.

2.7.Cihguherkê, “cihguherîn”:

Cihguherîn peywendî bi cih û rêzbendîya peyvan û hevokan bilêvkinê re heye. Cihên wan tê guhertin û rêzbendiyên wan berevajî dike, bi vî awayî hatiye pênase kirin: “*Pêkhatiye ji di dema gotinê de beşek pêş bixe û piştê her ew beşe jî pişt bixe*”¹. Ji bo kû cihguherkê durist bibe divê ji du keresteyan ne kêmtir be û divê bi şêweyek be peyva yekem li şûna peyva duyema berayî û peyva duyem li cihê peyva yekema berayî be..., eve jî wusa lê têt derbirîna hegeran weke kû ji dawiyê ve bêje heman ew derbirîn derbiçit kû ji pêşiya xwe hatiye eger ji serî de ve bibêje, evane ji aliyê wate ve dikare her yekwate bin anjî hegera wê wateyek ciyewaztir werbigre.

Cûra cihguherkek wate neguher û cihguherka wate guhertî:

Cihguherka wate neguher: Ev cûre jî degmene û rêjeyekê kêmtir heye di pend û gotinan de, eve jî wusa dibe kû ev derbirîn bi hegera heman wateya pê bibexşe, bo mînak:

“*Çi bilêy Hesên keçel, çi bilêy Keçel Hesên*” r.151

Di serî de navê “Hesên” li pêşiya berjenga “keçel” hatiye di beşa dawî de wuha ye, peyvên cihguher “keçel” ketiye di serî de û “hesên” ketiye li dumahiya wê, bi vî awayî di herduyan de her yek wateyek berceşt bûye, ev jî di pendê de bi vî cûreyê hatiye kû mirov tiştêk bêje bi du şêweyên ciyewaz kû her yek wateyek bigehîne.

¹ Xetîb El-Qezwînî, Celalêdîn Muhemed bin 'Ebdulrehman, *El-Eyzağ fî 'Ilûm El-Belaxe (El-Me'anî Wel-Beyan Wel-Bedî')*, t.1, Dar El-keteb El-Îlmîye, Beyrut – Lubnan, 1424 h. – 2003 m, r.265

Cihguherka wate guher: piraniya cihguherkan bi vî şêweyîne, ew jî eve ye kû derbirîn bi hegera wê nabexşe belkû wateyek ciyewaztir dirust dike, bo mînak:

“Ta xawen mal dizî girt, diz xawen malî girt” r.128

Di beşa yekem de wek diyare “xawen mal” pêşiya navê “diz” hatiye, lê belê di beşê piştê de cihguherka bi navê “xawen mal” û “diz” kiriye bi ewe kû navê “diz” bikeve pêşiya “xawen malê”, vê jî wateyek bi temamî ciyewaz û dijber dirust kiriye.

2.7.1.Cihguherîna li gorî cûrê rêzimanî û peyv hevokê ku cihgoherînê pê dîkin:

2.7.1.Cihguherka Du Navî Ya Heyberî:

“Hêlke le mirîşke û mirîşk le hêlke” r.499

Li beşa yekem de “hêlke le mirîşke” hatiye, di beşa piştê de jî cihguherk bi peyvvan hatiye kirin û bûye “mirîşk le hêlkeye”, û peyvên “hêlke” û “mirîşk” du navên bercestone.

2.7. 2.Cihguherka du navî ya wateyî:

“Le şera beşî aşî, le aşî de beşî şer bêlewe” r.355

Di vê derê de cihguherk bi şêweyên “şer” û “aşî” hatiye kirin, di parçeya yekem de navê “şer” di serî de hatiye, dûv re jî navê “aşî” hatiye, lê di parçeya piştê de navê “aşî” di serî de hatiye û dûv re jî navê “şer” hatiye, ji vê hunerê jî tê gotin cihguherkan.

2.7. 3.Cihguherka bi nav wateyî:

“Bedtirîn le bed bedtîre, bed le bedtirîn çaktîre” r.88

Di beşa yekem de cihguherka bi derbirîna “bedtirîn le bed” hatiye kirin, peyvên “bedtirîn” û “bed” herdu jî yek hevalnavê ne, lê belê ji aliyê pile ve ciyewazin, ya yekem hevalnavê pile yê bilinde û ya duyem jî di pileya çespayî

de ye. Di serî de navê hevalnavî “bedtirîn” û di piştê jî navê hevalnavî “bed” hatiye, bi vî şêweyî ye: “bedtirîn ji bed”, belê di parçeya dûv re hilgirtinê honandîne û ciyewaziya wan hatiye çêkirin, di serî de “bed” hatiye vêca “bedtirîn” ev jî bûye “bed ji bedtirîn”, ji vê rewşê re tê gotin hunerê cihguherkê.

2.7.4.Cihguherka bi firman û nav: wate du peyv kû yek ji wan nave û ewa din jî firman be.

“Nan gîra aw, aw gîra caw” r.400

Di parçeya yekem de derbirîna “Gîra aw” hatiye, peyva “gîra” di serî de hatiye firmana dema boriya tînepere, peyva “aw” nave ku li piştê wê hatiye. Li parçeya duyem cihguherk pê hatiye kirin û derbirîna wê bûye “Aw gîra” bi vî şêweyî hunera cihguherkê bi nav û firman hatiye kirin.

2.7.5.Cihguherka bi nav û hevalnav:

“Çi bilêy Hesên keçel, çi bilêy keçel Hesên” r.151

Peyvên “Hesên” û “keçel” kû cihguherk pê hatine çêkirin, ya yekem di serî de hatiye nave, ya duyem kû li dûv navî “Hesên” hatiye “hevalnav” e. Di parçeya dumahî de jî bi hilgirayî hatiye û bûyîne “keçel Hesên” bi vî cûrî cihguherka bi hevalnav û nav dirust bûye.

2.7.6.Cihguherka bi cînavên kesî ya serbixwe:

“Min bûm be to, to bûy be min, min bûm be cin, to bûy be jin” r.391

Di parçeya yekem de dibêje: “Min bûm be to”, “ez- min” û “tû- to” cînavên kesî yê serbixwene. Li vê derê cînavê kesî yê “min” di serî de û cînavê kesî yê “to” jî piştê hatiye lê belê li parçeyên dîtir cihguherk pê hatine kirin û cînavê “to” ketiye di serî de û “min” ketiye paş wê ve, bi vî awayî derbirîn bûye “to bûy be min” .

2.7.7.Cihguherka Bi girê:

“*Le hêlkey spî mirîşkî reş, le mirîşkî reş hêlkey spî peyda ebê*” r.363

Li vê derê di beşê yekem de du girê nav hatine kû ya yekem girêya “hêlkey spî” di serî de hatiye û ya duyem jî “mirîşkî reş” e li pey wê hatiye, di beşa dawîtir de jî rêzbenda girêyan bi hilgirayî hatine, cihguherk pê hatiye kirin, girêya “mirîşka reş” ketiye di serî de û girêya “hêlkey spî” ketiye li paş wê ve, bi vî awayî hunera cihguherka navê bi girê dirust bûye.

2.8. Arasteyî- “Tewcihe”

“*Ewe kû peyv du arasteyên ciyawaz têde hebe*”¹. Tê wateya peyv du wateyên ciyawaz bigre nava xwe, vêca dibe kû ev du wateyane ciyawaz bin, bila ya berevajî jî dirist bikin, yanî di karin dij û berevajî hevdu nebin, jiber vê jî ev hûner bi vî şêweyî hatye pênasekirin: “*Her dema çarçoveya peyvê bi şêwazek be kû dû wateyên stayş û lome li xwe bigre*”². Taybetmendiya vê hûnerê jî di wê yekêdeye kû ew derbirîna dû wate kû di nava xwede digre di kare mebest ji herdû wateyan be, yanî tû nîşane û amajeyek nade kû beramber “guhdar” girê bide bi neçarî ve tenê bi yek wateyek ji wan ve xerîk bibe, ev ji cûreke azadiyê dide kesên beramber kû çawa têgihiştina derbirînê bide heryek ji wan wateyan.

“*Qise hîçî tênaçê*” r.287

Ev gotin jî dû wateyên ciyawaz yê berevajî digre nava xwe, di kare mebest ew be qala gotinên baş û xirab be, yan jî berevajiyê wê mebest ew be qise zor bi wate û derew be, di herdû rewşande axaftin kirin bila neke û qet bi serve naçe, bi ve şêweyê ev gotin dû arasteyên cûda û berevajî girtiye.

“*Kes natwanê pêy bilê, berî çawit kilî pêweye*” r.309

Ev pend jî dû arasteyên cûda di gihîne dema kû ji kesekî re di bêjin, ev jî yan jiber gelek baş û qenciya kesekê ye, tû kes nikare rexne li wî bigre, jiberkû

¹ Sekakî, Ebî Ye'qub, b. n. b. , r.537

² Mehmud Fezîlet, *Saxtar hay Bedî'*, ç.1, Întîşarat Yadewa Kîtab, Daniş Pijwe, Tehran, 1391 het, r.136

zor başe, yan jî jiber wê çendê ye kes nikare qise ligel bike jiber kû pir bi zebir û zenc û tûnd û dil reqe, bi vî cûrê vê pend ê dû rûyên ciyawaz yên wateyê girtiye û hûnerê aresteyê têde berhem daye.

“*Kun le cergya nîye*” r.321

Ev gotin jî du wateyên wê hene, gelek normale kû mebest ji her yek wateyekê be, ya yekem delalet bi kesê xweragir û bi cerg dike, ev jî stayîşe, ya duyem jî delalet bi kesê dilreq û bêwujdan dike, ev jî lomeye kû berevajiyê wateya pêşiya niha ye, bi vî awayî hunerê arastekirin di gotinê de pêkhatiye.

2.9. Pirwateyî “fireh wateyî”:

“*Ew peyve kû du wate yan jî zêdetir di nava xwe de digre*”¹. Ev cûr jî di pend û gotinên pêşiyên de bi degmenî “kêmpeyda” dirust dibe û mînakî wan kêmin, ev jî ji ber wê çendê ye kû pend û gotinên xelkê sade û sakar bûne, ji ber vê jî zorbeya peyvên derbirînên wan jî sadene û bi yek wateyê hatine meydanê.

“*Tacî edeb le ser nê, hemû cîhan le ber bê*” r.131

Li vê derê de peyva Edeb bi du wateyan hatiye:

- Bi wateya silûk û şerm û rewîşt
- Bi wateya zanist û huner û wêje

Ciyewaziya firehwateyî di gel hunerî araste di pend û gotinên pêşiyên de:

Cudahiya vê hunerê jî di gel hunerê araste di wê de ye kû “firehwate” bi giştî ji peyvek yan destewajeyek dirust dibe, lê belê “araste” zorîneya caran ji kombûna wateya gotin û pendan, yan jî hevokekê nav wan dirust dibe.

¹ Dizeyî, Ebdulwahîd Mişîr b. n. b. , r.132

2.10. Xwe lomekirin

“*Pêktê ji sîfetê rewşekê*”¹, ev rewş jî kû navê wê bi wê ve ye, ewe kû kesek rûyê lomekirinê li xwe bi xwe bike, ji vê re jî dihat gotin “xwe lomekirin”. Mînakî van jî di pend û gotinan de hêj zêdetir arasteya bext û şans kiriye, bo mînak:

“*Le bextekey xom wa ra ebînim, biçime ser Sîrwan hîç aw nebînim*” r.346

Kesek vê pendê ji bo bextê xwe dibêje kû di jîyanê de gelek bê bexte, li vê derê qiseker berê dev dide xwe û lomeyê bextê xwe dike, ji xwe lomekirin jî ewe kû eger biçê ser robarê Sîrwan jî ewê hişk bibe, ev lomekirin di vê derê de şêwazekî yê ciwanî nîşan daye û dûre ji qiseyên sade yên asayî.

“*Bext reşim, ke biçime dizî ebîte mangeşew*” r.87

Di vê mînakî de jî bi heman şêweyê li jor kesê bextreş vê bi xwe dibêje, li vê derê arasteya lomekirinê zelale û xweyî lomeyê jî dibêje eger şeva tarî jî biçê dizîkirinê bext û şansê wî nîne, ji ber wê çendê dibe tavheyv.

“*Bextekey min ewinde lare, tirozî eçînim kalyare*” r.88

Evane jî wekû mînakî pêşiya niha lomekirinek zelale û behsa xweyî bi xwe kiriye.

2.11. Wesifkirin- Pesnkirin “Medih”:

Ji wesifkirina her tiştek pêktê kû ciwanîyek têde hebe, “mercê wê jî ewe kû wesif ji bo tiştan neraste rast be nekû pesneka raste rast be ji bo wan”².

“*Bermalî be ser awewe egerê*” r.92

Ev jî wateya dergeha mebestê ye kû delaletekî wesfî û pesnî di bexşe bi şêweyekî ne raste rast kû ji bo kesekê zor xwedatirs û musulman re tê gotin, bi

¹ Îbin Hece El-Hemewî, *Xezanet El-Edeb we Xayet El-Erib*, teh: Dr. Kewkeb Dîyab, t.1, c.2, Dar Sadir, Beyrut- Lubnan, 1421 h. – 2001 m, r.384

² Îdrîs 'Ebdulla, b. n. b. , r.112

vî cûrî şêwazî ciwaniya wê jî pê hatiye bexşandin di vê wesifkirina wê de û ev huner jê çêbûye kû wesifkirine.

“*Dest eka be demî şêra*” r.190

Ev gotin jî şêwazekê dirkeyî heye, wateya wê jî delalet bi kesê zîrek û bi xîret dike û şêweyekî ne raste rast jî heye di wesif û pesnîkirinê de, ji bo ew kesê kû ev gotin jêre hatiye gotin.

2.12. Lomekirin “zemkirin”:

“*Ji lomekirina herkesek yan tişteke pêktê*”¹. Di vê derê de pêwîste lomekirin ciwaniyek têde hebe, ji ber kû şêwazekî veşartî yê neraste rast yê ciwanî heye, nekû bes lomekirinek rût û aşkirayî vale di be ji ciwaniyê.

“*Be nûstûyî le hemû wextêkî tir çaktire*” r.87

Yanî kesek ewqas xirabe, bes wê demê dest ji xirabiyên di berde dema nivîstûye, weke diyar dibe ev gotin jî bo kesê xirab tê gotin, lê belê li vê derê lomekirina heyî bi şêwazekî veşartî neraste rast gelek spehî hatiye bilêvkirin kû nîşane bi kesekê wuha dike kû ji vê re jî tê gotin lomekirin.

“*Ta'rîfî xo kirdin, pemû cûne*” r.134

Yanî eger kesek metih û pênasê û senaya xwe bike, di nava xelkê de wekû pembû çûyîn wusaye kû çend neşîrîn û kirête, ev jî lomeyêke bi sedema xwe pênasîkirinekê wuha neşîrîn hatiye naskirin û wekû pembû çûyîn hatiye pênasîkirin. Ciwaniya wê jî di wê yekê de kû bi raste rast negotiye pênasîya xwe kirin karekê neşîrîn û nedurîste, û di nava civakê de ne hêjayê pejirandinê ye.

“*Dest ekata demî seg*” r.190

Ev gotin jî bi şêweyekî dergeyî hatiye bilêvkirin, ev jî nîşane bi kesekê bê heya, bê şerm û çenebaz dike kû şêweyekî ne raste rast têde heye ji bo

¹ H. b. , r.113

lomekirina wan kesên ev gotin ji bo wan hatine dahênan, bi vî awayî lomekirinek dirust bûye.

2.13. Lome Di berga Pesn de:

Ewe kû qiseker di qise û derbirînên xwe de “*Di serî behsa pesna kesek yan tişteke dike lê belê di dawiyê de derdixe holê kû mebesta gotinê lomekirine nekû pesnkirin.*”¹. Bo mînak:

“*Sing şêrî maker pişt*” r.255

Li vê derê di serî de gotin nîşane bo bihêzî û mezinahî dike, ev jî dibe pesn lê belê di beşê piştê de berevajiyê wê behsa neşîrînî û biçûkî dike, ev jî lomeyeke kû mebesta gotinê ewe, wê yekê derdixe kû beşa yekem ya wê her bi mebesta lomekirine hatiye bikaranîn nekû ji bo pesn, bi vî awayî hunerê lomekirin di berga stayîş de dirust bûye. Ev gotin jî ji bo kesên qebe, zexim û bê sûd û bê erk dihat gotin.

“*Min berzî ekemewe, xwa bitbatewe*” r.391

Li vê derê pêşiya gotinê ji bo bilindkirina pileya kesayetiyekê hatiye bikaranîn kû bi pesnkirinê ye, lê belê di beşa pey re dû'aya xirabî di serde hatiye, ev jî dibe lomeyeke rût kû ji bo xirabiyê hatiye karanîn ne kû jibo başiyê, û vê der dixê holê kû mebest di serê gotinê de nekû be ne pesn bû belkû lomekirin bû, bi vî cûrî lome diberga pesn de bo vê gotinê dirist bû.

2.14. Ekîtkirina “Misoger” a lome wekû wesf “Ekîtkirina zemî li pesn ê de”

Ev jî ji corekî zêdetir heye, ewa li vê derê mînakya wê hebe ev cûre ne: “*sifatekî lome kirin ji bo tişteke tê dîtîn, di pey re amrazek ya cûdakirinê hebe, piştê jî sifatekî dîtir yê lomeyî di peyre bêt.*”². Di vê derê de di serî de lomekirin bi aşkirayî tê lê eger amrazek li pey de bêt beraber wisan pê diçe kû

¹ H. b. , r.103

² Xetîb El-Xelxalî, Şemsedîn Muhemed bin Muzefer, *Mîftah Telxîs El-Mîftah*, teh: Haşim Muhemed, t.1, El-Naşir El-Mektebe El-Ezherîye Lîturas, 2011, r.690

vê carê pesna tişteki dike kû her dîsan pênaseya lomekirinekî dîtir li dûf tê kû bandor li lomeya pêşiya xwe dike. Bû mînak:

“*Bextim le hemû şitêk da reşe, tenya le şûtî da nebê spî ye.*” r.88

Ev gotin ji aliyê kesek ve tê gotin kû di jiyane de gelek bêbext û bê çare be, hûnera wê jî ji wê wateyê dirust bûye kû despêka gotinê di bêje “Bextim le hemû şitêk da reşe” Ev jî lomeyek aşkire û diyare, li pey re ew amraza “Tenê-tenya” hatiye, li vê derê beramber bi serîn û gumanên wêve diçe kû vê carê pesn li dawî bêt, kû her wiha lomeyek din li pey re têt kû ew jî eveye “tenya le şûtî da nebê spî ye” lome di wê yekêde ye kû zeveşe spî dîsan nîşaneya bextreşiyê, jberkûn bê feyde ye, bi vî cûre yî hûnera bandorkirina lomeyan di wekû wesif “pesn” berhem hatiye.

2.15. Rû vegeran- Têlnîga “Îltîfat” :

“Ji wê yekê pêk tê qiseker, arasteya qiseyên xwe ji kesên sêyemê ne diyar ji bo kesê dûwemê beramber yan jî bo kesê yekemê qiseker yanî bi berevajiyê wê, di bêje”¹. Yanî rûyê peyvê her carek ber bi kesekê ve ye.

“*Xwa delê le to hereket, le min bereket*” r.171

Li vê derê despêka pendê rû li kesê sêyemê kû “xwedê- xwa” ye, piştî arasteya wê guhertiye û rû li kesê duyem kiriye kû bi cînavê “tû- to” hatiye holê, ji wê derê jî arasteya rû wergerandinê çoye ser kesê yekem kû bi cînavê “min” hatiye diyarkirin.

“*Kêmî min û keremî to*” r.312

Li vê derê despêka gotinê rû li kesê yekemê kû bi cînavê “min” jêre hatiye anîn, piştî jî rû wergeraye bo kesê beramber kû cînavê “tû- to” jêre hatiye, bi vî cûre rû wergeran ji kesê yekem ve bo kesê duyem dirust bûye.

“*To binû westay Nekar, xwa yeke û derû hezar*” r.140

¹ Kamil Ehmed Nejad, *Finûnî Edebî*, ç.4, îtişarat Payan, Tehran, 1382 het, r.137

Ev pend jî di destpêkê de rû li kesê berambere kû bi sedema cînavê “tû-to” hatiye, piştî navê “xwedê- xwa” hatine bilêvkirin, ev jî ji bo kesê sêyemî nediyar tê gotin, bi vî awayî arasteya rû wergerana peyvê ji kesê beramber çoye ser kesê sêyemî nediyar.

2.16. Rû li ew kirin:

Ewe kû qiseker qiseyên xwe arasteyê beramber bike, yanî “...rûyê bide û guh bide kesê beramberê xwe û qise û amojgariyên wî rû li wî kesê beramber bike”¹.

Ev jî bi du şeweyane:

1- Gotin û amojgariyên heyî pêşkêşî yek kesê beramber dike.

“Eger şitêkit nezanî melê, eger zanî nîwey bilê” r.32

Qiseker di vê pendê de, qise û amojgariyên xwe tenê arasteyê yek kesê beramber kiriye, bi vî awayî hunerê rû li ew kirin bi cih hatiye.

“Ne hênde tal be firê bidrêyit, ne hênde şîrîn be qûtî biden” r.410

Di vê pendê de jî qiseker tenê amojgarî û gotinên xwe arasteyê yek kesê beramber kiriye, bi vî awayî hunerê rû li ew kirin dirust bûye.

2- Goin û amojgariyên heyî pêşkêşî çend kesek beramber dike.

“Eger gulin beramberin, eger 'etrin ser be serin” r.32

Li vê derê qiseyên heyî arasteyê çend kesek yê beramber hatine kirin, bi vî awayî hunerê rû le ew kirin dirust bûye.

2.17. Deranîn:

“Ji axaftina bi şeweyekî nûçeyî dirust pêktê kû nûçe bi yek şeweyê giştî wate dide, kû piştretir tişteke ji nûya ya wê tiştê giştî dertîne...bi wateyê puxtir: derhênan ji derînan tişteke taybet ji nava tişteke giştî de”¹.

¹ Îdrîs'Ebdulla, *Ciwankarî le Edebî kurdî da*, b. n. b. , r.131

“Hemû şit le barîkî epiçrê, mêrd le qayîmî” r. 444

Li vê derê nûçeya giştî ewe kû “Hemû şit le barîkî epiçrê” ev li ser hemî tişteke hatiye giştîkirin, yanî: Hemî tişteke ji lawazî û bêhêzî didiriya lê di nava hemiyana de tenê “mêr” ji nav hatiye derhênan, kû ew pêçawene ji qayîmî û bihêzî didirihe nekû ji ber lawazî, bi vî awayî derhênan ji nava tişteke giştî hatiye kirin.

“Hemû kesê goşt xore, her gurg bed nawe” r.445

Di vê pendê de jî di serî de sifeta goştxwerî li ser hemî tişteke hatiye giştîkirin, belê tenê “gurg” jê hatiye deranîn kû “bed naw” bûye, yanî hemî goştxwerek “bê nawe” lêbelê tenê “gurg” e kû navê wî nebaş belav bûye.

“Ke merim gurg bîxwa, ba gurgî niştîman bîxwa” r.299

Di serî de navê gurg bi şêweyekî giştî hatiye, hemî gurgan girîtiye nava xwe, piştî tenê “gurgê niştîman” jê hatiye derhênan, ev jî dibe derhênan tişteke taybet ji nava yekê giştî de.

“Hemû şit diroye, şert çaw û biro ye” r.444

Di destpêka vê gotinê de jî hemî ciwanîyekê beden bi direw hatine nasandin, ev jî giştîya wê ye, lê di nava wan de tenê ciwanîya çav û birû jê hatiye derhênan û bûye merca ciwanî, bi vî şêweye tişteke taybet ji biryara giştî hatiye derhênan.

2.18. Komkirin:

*“Ji komkirina çend tişteke di bin yek biryar û hukim de pêktê”*². Li vê derê ew tiştên tene komkirin dikare ji yêk ciyawaz bin yanî hevçêşin û pêkve guncaw bin, cûrên rêzimanî jî dikare her çî be ji “peyv, hevok, destwaje...” .

“Heyran û sawer qet pîr nabê, karwanî aş tewaw nabê” r.161

¹ Îdrîs 'Ebdulla, *Ciwankarî Şî'irî Nwêy Kurdî*, b. n. b. , r.169

² Teftazanî, Se'dedîn Mes'ud bin Umer, *El-Mitûl Şerh Telxîs Miftah El-'Ilûm*, teh: 'Ebdulhemîd Hîndawî, t.2, Dar El-keteb El-'Îlmîye, Beyrut – Lubnan, 1428 h. – 2007 m, r.656

Li vê derê “heyran” û “sawer” di wê de hatine komkirin kû ev herduyane pîr nabin.

“*Jin û tifeng û mayîn, le kin kê bê hî wîye*” r.236

“jin” û “tifeng” û “mayîn” li jêr hukmê xweyîbûna xweyîyane kû evane “li cem kê bin yê wanin” hatine komkirin.

“*Aw û agir, amanyan nîye*” r.22

“av- aw” û “agir” di wê de hatine komkirin kû ev duyane “amanyan nîne” yanî ne selametin.

“*Le awî mend û piyawî mon, bitirse*” r.344

Li vê derê de “awî mend” û “piyawî mon” herdu jî li dor firmana “bitirse” hatine komkirin.

2.19. Ji Hevdukirin “Tefrîq”:

Ev huner jî berevajiyê komkirinê ye, ji ber kû li vê derê tişt nayên komkirin, belkû tene cudakirin, yanî: “*cudakirina du tiştane di yek cûr de*”¹. Li vê derê ne merce kû tenê du tişt bigre nava xwe, belkû dikare ji du tiştan zêdetir jî ji hevdu bike û ciyewaziya navbera wan bixe rû.

“*Zamî şimşêr xoş ebêtewe, zamî qise xoş nabêtewe*” r.227

Li vê derê de du “cîh û birîn” hatine têkrekirin û ciyewaziya navbera wan de hatiye xistina rû, ya yekem “birîna şimşêr- xencere” ya duyem jî “birîna qise” ye.

“*Dana bedirkandin, nadan be kutek*” r.185

Di vê mînakî de jî du sifet bikerî ji hev hatine kirin û ciyewaziya wan hatiye xistina rû. Ya yekem “dana” e ya duyem jî “nadan” e. Bi vî cûre hunerê ji hevdukirina pendê dirust bûye.

¹ Bîsyunî 'Ebdulfetah, *'Îlim El-Bedî'*, t.2, Muesese Elmuxtar Lineşir wetewzî', Qahîre-Mîsir, 1425h.-2004 m, r.184

“Beharan heyran û pez, hawînan bax û rez, zistanan agir û ez” r.94

Li vê derê de jî werzên “behar”, “hawîn” û “zistan” ji hevdu hatine kirin û ciyewaziya navbera wan hatiye xistina rû.

“Wecaxzade be îşare û nawecax be kutek” r.415

Di vê mînakî de jî kesê “wecaxzade” û kesê “nawecax” ji hevdu hatine kirin û ciyewaziya di navbera wan de hatiye xistina holê.

2.20. Çotbûn “Mizawîce”:

“Ji têkelkirina du wateyan pêktê di dema merc û bersiva merc de”¹. Yanî ji bo duristbûna berjengek Yan rewşek yan bi cihbicihanîna firmanek yan jî her tiştek din be, merce didane piştê li gel bersiva mercê bi yekve dihînit.

“Eger zal nebît, besteziman ebît” r.31

Di vê derê de hunerê cotbûn di wê dema kû ewane besteziman nebin merce kû divê zal bî, ji bo zulm li te neyê kirin.

“Dem biwestê, ser selamete” r.197

Di vê pendê de jî hunerê cotbûn ji wê yekê dirust bûye kû ji bo kû serê mirov silamet be ji belayan, merce kû dev û ziman ji qiseyên nexwaztî rawestin.

“Eqil nebê, giyan le 'ezab de ye” r.275

Hunerê cotbûn di vê derê de berceste dibe ji bo kû giyana mirov ne di 'ezabê de be merce kû 'eqilê hebe, ji bo bi duristî rû be rû bibe ji bo berjewendiyên xwe araste bike.

¹ Xetîb El-Qezwînî, *El-Eyzah fî 'Ilûm El-Belaxe (El-Me'anî Wel-Beyan Wel-Bedî)*, b. n. b. , r.265

2.21. Pasaw anîn “hêcet- bihane anîn”:

Dema qiseker “*Di destpêkê de tişteke bêje, piştêre bibe pasawek “bihanek” bibîne ji bo kû qiseya xwe zûtir kirye*”¹. Vêca anîna pasawê bikeve pêş qise anjî piştê wê.

“*Qisem heqe, boye reqe*” r.288

Di vê pendê de reqîya qiseya durist pasaw bi wê ve bû kû qiseya wî herdem ji bo kesê beramber reqe ji ber kû heqe, bi vî cûrê hunerê pasaw anîna ji bo pendê hatiye berhemdan û ketiye di beşa destpêkê ya pendê de.

“*Rêwî demî nedegeyişte tirê, eywit: Tirşe*” r.226

Di vê pendê de jî behsa kesek dike kû arezûya wî di derbarê tişteke de hebe lê ji ber kû nikare bi dest ve bîne ji tiştên din hêcetên jêre tîne û serve digre, bi vî awayî hunerê anîna hêcetê ji bo pendê dirust bûye û ketiye di dawîya pendê de.

2.22. Zêderewî “Mubalexe” :

“*Wesfêke kû têde zêderewî heye*”². yanjî bi şeweyekî hurtir hatiye gotin zêderewî: “*ewe kû bêjer Wesfêk bike û di wesifkirina xwe de bigihe astek kû dûr bêt zanîn anjî mehal be, di lazawî anjî bihêzê da*”³

“*Ewinde dize, kil le çaw efrênê*” r.55

Wek diyare ew pend jî behsa diziyê dike, lê wesifkirinê de gihiştîye astek zêderewî dirust kiriye, ji ber kû ger diz çend jêhati be di karê xwe de ew nagehet ewqasî kû kil jî çav birevîne, ew tistekê ne pêkane, her wiha zêde rewîyekê ditir di wê de ye kû gava kil jî çav hate jî derxistin, ne jî hêza wi ye, ji ber kû eve tişteke ne pêwîste û ne buye, çêbûna wî yê jî ne pêkane, ev zêde rewîye jî ne eqil, ne nerît napejîrênin.

“*Nokêk be no parû exwa*” r.413

¹ Îdrîs 'Ebdulla, *Ciwankarî Şî'irî Klasîkî Kurdî*, b. n. b. , r.154

² Muhemedî, Muhemed Husên, b. n. b. , r. 147

³ Haşimî, Seyid Ehmed, b. n. b. , r.230

Ev jî ji bo kesekê tê gotîn kû zor bexî û rezîl be, lê li vê dere di wesifkirdinek de zêde rewî di perjengek de hatiye kirin, ji ber kû xwarina nûkek bi neh parû ne tîştekekê durîste û zêde rewî tê de heye. Bi vê cureyî hûnera zêde rewî di pendê de durîst buye.

“*Asiman lêfebê, dayna poşê*” r.15

Ev jî ji bo kesekê tê gotin kû bednav û le kedar buye û navê wî derketîbit, her çî biket ew xwe jê di veşêret û derbaz dike, lê vê derê wesifkirin bi zêde rewî girtiye nava xwe kû ger asman bo wî bibine lîfe eve nikare bi veşêre, kû her çî mirov bi biçûkayiye xwe bi beramberkirine li gel vê asmane mezin û firahwan tîştekekê ewqas biçûke nikare behsa wî bê kirin. Bi vê cûreyî hûnera zêde rewî di wesifkirinek de durîst buye.

“*Le ser qûrê, tozî dekat*” r. 354

Ew ji bo kesekê tê gotin di hemû tîştekekê de ajawegirbit an ji zêde bi lezbit di çêkirina tiştan de, zêde rewî bi wêde durîst buye kû herî hîç demek tozê nake, ji ber kû terî û lîce û ew jî ne berjengê wiye, lê li vê derê ji bo zêde rewî hatiye bikaranin.

2.23. Kom pend:

Ev jî weke hûnerek ciwankarî ya wateyî hatiye behskirin, di pend û gotinan de mînakî wan hene, ev hûner jî “*ji komkirina çend pendek pêkte*”¹. Yan jî bi wateyek ditir kom pend: ji durîstbuna du pend yan zêdetir jî yek deq de pêkte, vêca ev deqane her çî tîştekek be. Berceştuna vê hûnerê jî di pend û gotinên pêşiyên de şewazekê taybet werdigre.

“*Pêxwasi baştîre le pêlawî teng, bêmalî baştîre le malî be ceng*” r.122

Ev pend jî ji du beşan pêkhatîye. Eger her beşek ji wan derbixî dikare bibe pendekî serbixwe. Ew beşa ku dimîne bi heman awayî dikare wekî pendekî serbixwe bînê. Bi vî awayî hunera kom pend pêkhatîye.

¹ Muxtar 'Etîye, *'Îlim El-Bedî' wedelalat El-Î'ûraz fî Şî'r El-Buhterî*, Dar El-Wefa, Eskenderîye- Mîsir, Dune Sene Eltebi', r.104

“*dostî dostim dostime, dujminî dujminim dostime*” r.215

Ev pend jî bi giştî bi du beşê serekî durîst buye, her beşek ji van pendekê serbixweye, bo mînak di beşê duyem de “*dujminî dujminim dostime*” ev dikarî bû weke pendekê jî bi hatiba bi karanin, beşa yekem jî bi heman awayi ye.

“*Kiç be bê bawk nîrxî nîye, bax be bê perjîn ciwanî nîye*” r.314

Ev pend jî bi heman şêweya pendên pêşiya xwe jî du beşan pêk hatiye, kû her yek jî wan bi xwe pendeke, bi vê cûrî hûnera kom pend hatiye berhemdan.

2.24. Hevahengîya ciwan:

Ev hûner zêdetir ji rwangeha helbestîve hatiye pênasekirin, lê ji ber sedema hebûn bandorkirina li ser beşek ji pend û gotinan nekariya bêt pajgahkirin, jî aliyê helbestîve bi vê awayî hatiye pênasekirin: “*Helbestvan çend rêzekê bi hevduve girêdaye û sipehîne, ger her rêzek jî ji nav bêt derêxistin bi tena serê xwe bikare wateyê bide*”¹. bi vê hûnerî bi beşek ya pendan û gotinan heman nivandin dikin, lê bi şêwazeke taybet û ciyewaz, bi kurtî: hevahengîya ciwan jî rwangeha pend û gotinên pêşiyên wane digre nava xwe kû jî çend beş û pajê pêk hatine, ger her beşek ji wan bê derexistin jî wateya wan heye, û ew beş û pajene jî kû dimînin ewane jî wateyên temam û durîst di bexşîn, ji vê re jî gotin Hevahengîya ciwan.

“*Îşî nîye kirdaran dekat, gulî nîye hewseran dekat, 'emelî nîye ferman dekat*”

Ev mînak jî ji sê pajeyan pêktê, eger her pajek jî jê bêt deranîn dîsa dikare wateyek serbixwe bi de.

“*Le zistan şewê, le pîran tewê, le boresiwaran hewê*” r.353

¹ Îdrîs 'Ebdulla, *Layene Rewanbêjîyekan le Şî'irî Klasîkî Kurdî da*, b. n. b. , r.369

Eve jî li sê beşan pêk hatiye, her yek li beşa xwe de jî bi kurtahî hatiye, beşa yekem “Le zistan şewê” yanî li zivistanê tenê şevê bese bo piyaçon û malwêraniye, ji ber vê jî şevê zivistanan ti emana wan nine, di beşa duyem de jî “le pîran tewê” yanî mirovê pîr tayek bigre bese ji bo kû pê bimre, yanî evane jî ne cihê dîl xweşî û pêşabunê ne, her wiha di penda dawîde jî “le boresiwaran hewê”, hatiye ev jî tê wateya:borasiwar hemû yek “foyek bigre bese ji bo kû ew bikeve, yanî evane jî ne cihê eman û pêşbuniyê ne, ji ber kû dikarê xwe de neşarezaye. bi vê cûreyî her beşekê nava pendê de ger bi têna serê xwe û serbixweji bit hengê wateya tamam û durîst di bexşît û bandorik jî li ser wateya pendê nakin, kû ew beşên jî bêne derxistin bi vê şeweyî jê derhênan her du jî dibin wate bexş bêy kû hîç aliyek kêmi kurtî li wateyan durîstbe, jî hûnerê re jî tê gotin hevahengîya ciwan.

Ciyewaziya hevahengîya ciwan li gel kom pend di pend û gotinên pêşyan de:

- Hemû kom pendek dibin hevahengîya ciwan, lê ne merce hemû hevahengîyek bibe kom pend.
- Di kom pende ew beşe kû ji kom pendê dê derxistin, û ew beş ya beşên din kû mane, dikare her yek ji wan bi şeweyeke serbixwe weke pend bikar bêne, ji ber kû sifate pend werdigre, yanî: ya hatiye derxistin û jê derxistin her yek jî wan dikare serbixwe weke pend bîn bi karanin, lê di hevahengîya ciwan de ew beşe kû tê derxistin ne merce berjenga pend bigrit yanî bibe pend, belku tenê wate bexşe dibe.

2.25. Zivirandina Got û bêj:

“*Dariştina Got û bêja di nava du kes yan zêdetir rû dabe, vica ger qiseker yek ji wan kesan bi xwe be an ne, merc jî ewe kû peyv û wajeyên nazik û ron û ciwan bin û şêwazekê karîger be tiştên zêde tê nekevin*”¹.

“*Witî: bêne mela witî: Estexfîrallah, witî: hanê mela, witî: Barekallah*”
r.421

Ev gotin jî ji du beşan pêkhatiye, her beşek jî girtina got û bêj têde ye kû di nava du kesan de durist bûye, bi şêwazekê ciwan, bi peyv û bilêvkirinek diyar û ron hatiye gotin, ji aliyê wateyê ve jî nîşaneyekê ciwan bexşiyê kû behsa mela dike.

“*Min elêm nêre, ew elê bidoşe*” r.390

Ev got û bêj jî di navbera qiseker û yekê din de durist bûye, bi şêwazekê sadeyî, peyv bilêvkirin aşkire û diyar, wateyekê ciwan ya berevajî di nava wan de berhem hatiye.

“*Witî siwarbûnî hûştir zor xoşe, witî ey xot boçî siwar nabî*” r.421

Eve jî girtina got û bêja sade ya di navbera du kesan de durist bûye, wateyekê ron û ciwan jî bexşî ye.

“*Le kêwyan pirsî bo wa berzî? Witî le sayey dolekey ber demmewe*”
r.358

Li vê derê girtina got û bêja bi şêweya sade û hesan hatiye bikaranîn û wateyekê bilind û ciwan jî bexşî ye.

2.26. Pêkve Guncawbûna Peyv û Wate:

Ji vane pêk hatiye: “*Dema peyv li sukî û giranî de bi wateyan re pêkve bi guncin*”². Li vê derê peyv û wateyên wan dibin temamkerên hevdu. Lewaziya her yek ji wan dibe lewaziya ewên ditir, ji ber vê sedemê jî pêwîste, pêkve

¹ H. b. , r.367

² Tebîbyan, Seyd Hemîd, *Ayîn Dirust der Daniş Belaxet we 'Eruz*, b. n. b. , r.173

guncawbûyîn dinava peyv û wateyan de bi şêweyek be kû: “*gotin a jî peyva nazîk bo wateya nazîk û je "Talaîfûz" a giran û sext bo wateya giran û sext hatibe ditîn*”¹.

“*Darî bê gela nîrxî nîye, xuşkî bê bira zînetî nîye*” r.183

Li vê derê peyv bi forma durîst hatine, bê kû hîç kêmi kurtî tê de hebe, di wateyên de jî hîç ne temambunek tê de nine li gel ew peyva kû ji bo wê hatiye rêk û yeksandin, bi vê şêweyî peyv temamkerê wateyên xwene, bi heman şêwe bi wateyên wan jî temamkerên peyvanin, eve jî hevahengî pêkve guncawbûyîn dinava peyv û wateyên wan de durîstkiriye kû lê vê derê peyva sûk û nazîk, wateya sûk û nazîk ji wan re hatiye anin, ew jî ciwaniyek ya wan bi şêwazek ditir bexşandiye.

“*Pêxwasî baştîre le pêlawî teng, bê malî baştîre le malî be ceng*” r.122

Li vê derê peyv temam û bê kêmi kurtî û her peyvek bi wateya xwe ya pêwîst hatiye, wateyên wan jî hevahengî li gel peyvan, kû li vê derê beşek yê peyvan giranin û tundîn, wateyên wan jî giranî û tundî jê re hatine, ev jî hevahengî û pêkveguncawbûyîna dinavbera peyv û wateyên wan de durîstkiriye.

2.27. Ravekirin, “tefsîr” :

“*Ji zelalkirin û derxistîne pêktê*”², yanî zelalkirina tiştêkê ji bo derxistin û têgehîştina wî zêdetir be, yan ji bi wateyekê ditir ravekirin: “*Ewe kû qîseker wateyek bêne, dikare ji wateya têbigêhe bi avekirin, yanî pêwîstî bi ravekirin be*”³.

“*Helal binî barîke û serî qewî, heram binî qewîye û serî barîk*” r.161

Lê wê derê zeravayên helal û heram hatine anin, her yek jî wan rave û zelalkirineyekê ji bo wan hatiye kirin, helal: raveyek hatiye kirin kû binê wî

¹ Muderrîs, Mela Ebdulkerîm, b. n. b. , r.36

² Metlub, Ehmed, *Mi'ecem El-Mustelehat El-Belaxîye wetetewiruha*, cz.2, r.314

³ İbin Hece El-Hemewî, *Xezanet El-Edeb we Xayet El-Erib*, teh: Kewkeb Dîyab, t.1, c.4, Dar Sadir, Beyrut- Lubnan, 1421 h. – 2001 m, r.316

tanike û serê wî qewiye, yanî rîsqê helal eger kê m jî be, lê bi pêt û berekete, heram jî: li gora raveya hatiye kirin kû binê wî qewiye û serê wî jî tanike, yanî risqê heram her çend gelek jî be, lê bê berekete. Bi vê şeweyî hûnera ravekirin bi du wateyên ciyewaz hatine berhemdan.

“Nan nanî genim û dîn dînî mihemed” r.400

Li vê derê jî bi kurtî rave ji bo peyvên “nan” û “dîn” hatiye kirin, di ya yekem de cûrê wê nanê kû baş û pesinde hatiye zelalkirin, ev jî “nanî genim” e, ya duyem jî ew dine kû bi rast û tamam tê nasîn hatiye zelalkirin, ew jî “dînî mihemed” e kû îslame.

“Dil berd niye, le perey gul nasiktire” r.205

Di vê mînakî de rave ji bo “dil” hatiye kirin, bi vê yekê kû di reqî û bi hêzîde ne weke gul, belkû li nazîkide jî ji perê gul nazîktire, bi vê cûrî wesifkirin û zelalkirineke ciwan ji bo “dil” hatiye kirin û hûnerê ravekirin hatiye pêkanin.

2.28. Bedîkirin, çaverêkirin “Îrsad” :

*“Ewe kû bi awayê hevokan bêne danîn kû ji ber wê sedemê çaverêbûna dawîya wê jî bike, yanî li pêş dawîhatina hevokan de tiştek hebe kû peywendî li gel ya dawiyê de hebe”*¹, ew jî bi wateya kû hevokên destpêkê bi sedema hinek peyvan wate yan jî serwadarîya hevokê, pêşbiniya ewa kû di hizir de ji bo wê dirust bike kû hevokên li peywan bizanin çawa tên.

“Xirape be hemû kes, çake be kem kes” r.167

Ewane jî ji du beşan pêktên, beşa despêkê bi sedema peyv û wateyên wan, ewa têde tê çaverêkirin kû bizanî beşa piştê cî têt.

“Du zore û yekêk kem” r.209

Li vê derê jî pajeya despêkê amajeyek diyar û tê zanîn tê de heye kû pajeya piştî vê bi çî hatiye, ji ber kû eger got “du” gelek be, aşkereye piştê

¹ Secadî, Elaedîn, *Xoşxwanî*, r.88

dibêjin “yek” kême, ewe jî bi sedema ew peywendiya beramberiye û di jyekî kû di nava wan heye.

“*Qisekirdin be parebuwaye, kes ney ekirî*” r.286

Di beşa despêkê de bi sedema anîna navê “pare” ji bo qisekirinê vê yekê di hizir de dirust dike kû beşa di pey wê re “nekirîn” ji bo wê hatiye karanîn.

“*Îmro çi biçînît, sibeynê ewe edûrîtewe*” r.65

Eve jî di beşa destpêkê de bi sedema anîna peyvên “îro- Îmro” û “biçînî”, ewa kû têde tê çaverêkirin kû bizanibe kû “sibey” û “edûrîtewe” di beramberê wan de têne bikaranîn.

2.29. Şêwazî Danayî “Îslubî hekîm” :

“*Ewe kû kesê beramber “guhdar” di dema guhdarkirinê de pirsyarekê neçaverêkirî dibe, ew jî ji bo dawîanîn li bersiva wê pirsê tê bersiva pirsyarekê dîtir bide kû mebesta pirsê hatî kirin ne ew bû*”¹.

“*Elên: Xizmit kêye? Elê: Jinim nehênawe*” r.36

Li vê derê pirsyar ji bo “xizim” hatiye kirin, lê yê beramber bersiva pirsêkê dîtir daye kû mebesta pirsê ne ew bû. Bi vî awayî şêwazî danayî hatiye berhem anîn. Ev gotin jî ji bo kesek tê gotin kû tenê kesûkarî jina xwe wek xizim dizane, yanî dema kû jin bîne.

“*Le hêstiryar pirsê: Bawkit kêye? Witî: xalim hespe*” r.345

Li vê derê jî pirsyar ji bo “bav” hatiye kirin kû kiye, kû çawa be kesê beramber bersiva pirsyarek din daye kû mebesta pirsyarê ne ew bû, ev jî ji bo kesek tê gotin kû bavekê hejar û bêqedir hebe kû çawa be ew şanaziyê bi xizmekê dewlemend û payeberz bike, ev xwe dizîna ji bersiva vê pirsyarê jî bi mebesta kû xwe ji lomekirin û şkestinê biparêze ye.

“*Le Homeryan pirsê xelkî kwêyit? Witî: Hêsta jinim nehênawe*” r.362

¹ Itîq, Ebdul'ezîz, b. n. b. , r.182

Ev mînak jî bi heman şêwe, şêwaza daneyekan daneyiye li wê de dirust bûye kû pirsyarker pirsyaran cih û navçeyê ji beramber kiriye, kû çawa beramber bersiva pirsyarekê ditir daye kû mebest ne ew bûye. Ev jî tê wê wateya kû zelum piştî jin aninê êdî xwe weke xelkê malbava jinê dizane.

2.30. Dahênan ‘‘Îbdai’’ :

‘‘*Ji wê yekê pêktê kû qise çend cûrek ciwankarî tê de hebe*’’¹. Bo mînak:

‘‘*Pêxwasî baştîre le pêlawî teng, bêmalî baştîre le malî be ceng*’’ r.122

Di vê mînakê de hûnera dahênanê dirustbûye kû çend cûrên ciwankarî tê de heye:

- Havbêjî netemamî cûda li nav ‘‘teng’’ û ‘‘çeng’’ dirustbûye, her wiha Havbêjî yê netemam zêde mûtrîf di nava ‘‘bê mal’’ û ‘‘mal’’ dirustbûye.
- Serwadarê hevrû di nava ‘‘teng’’ û ‘‘çeng’’ pêk hatiye.
- Hûnera zivirandinê bi sedema zivirandina amraza peywendî ya ‘‘le’’ û li cem peyvên ‘‘pêlaw’’ û ‘‘mal’’ çêbuye.
- Hebûna pêwîstî ji peyva serwedaran ‘‘teng’’ û ‘‘çeng’’ pêktên ji tîpên ‘‘en’’
- Hûnerê pekve guncawbûn tê de heye, bi awayê kû peyv bi wateyên xwe yê ferhengî hatin bikaranîn.
- Hûnerê dijyekê ne ferhengî di navbera ‘‘bê malî’’ û ‘‘malî’’ dirustbûye.
- Hûnera kom pendî tê de heye, ji ber kû her yek jî wan beşan dikare wekû pend bêne bi karanîn.
- Hûnera pêkveguncawdîna peyv û wateyan tê de heye, bi qasî kû di wateyên tund û req peyvên tund û req jî hatiye bikaranîn, weke ‘‘teng’’ û ‘‘çeng’’ ...

‘‘*Be zîstanan pîne û pero, be hawînan wird wird biro*’’ r.80

¹ Haşimî, Seyid Ehmed r.235

Ev mînak jî van cûrên ciwankariyan digre nava xwe:

- Havbêjî ya netemam ya cûda dinava “pero” û “biro” dirustbûye.
- Hûnera serwadarî hevserwa dinavbera “pero” û “biro” dirustbûye.
- Hûnera patkirin heye, di patkirinê de berjengê karîya çawanî dirustbuye.
- Hûnera zivirandinê bi sedema zivirandina du cara amraza peywendiyê “be” li cem peyvên “zistan” û “hawîn” çêbuye.
- Hebûna pêwîstî yê di peyvên serwadarên “pero” û “biro” jî tîpa “R” pêktê.
- Hûnera pêkve guncawbûn têde heye, ji ber kû ev peyv bi wateyên xwe yê ferhengî hatine bi karnanîn.
- Hûnerê di jyek dinavbera “zistan” û “hawîn” dirustbûye kû mebesta wê “sarî” û “germahî” ye.
- Hûnera çavliyek di peyvên “pîne” û “pero” dirustbune.
- Hûnera ji cudakirinê di du werzên salêde hatine kirin, kû “zistan” û “hawîn” in, ji hevdu hatine kirin.

ENCAM

1- Pend û gotinên pêşîyên kurdan rasenatî û şêwaza gotinên netewa kurdin. Hunera rewanbêjîya zimanê vê netewê dîyar dike.

2- Mînakên “Pendî Pêşînan” ê Xal cûr bi cûrin, di alîyê serdem de ciyawazin. Kesayetî û buyerên dîrokî di nava xwe de digire û demê serhildana wê jî dîyare. wek: “*Bu be gîskekey heyasî xas*” r. 105.

Heye ku di ezmuna çend salan de çêbûye ku dem û serdema wê nayê zanîn: “*Goze hemu carê be saxî nagerêtewe le kanî*” r.339.

Hinek jî serdema niha dinav xwe de digire. “*Kîmya naygatê*” r.324.

3- “Pendî Pêşînan” ê Xal ne taybete bi zarê Kurmancîya naverast “sorani” a Başûrê Kurdistanê. Belku mînakên navçeyên cuda zar û şêwezarên wan ê cîyawaz jî tê deye. Bi vê re jî şêweyekî giştî girtîye.

4- Mînakên “Pendî Pêşînan” cûr bi cûrin hem di alîyê naverokê de dewlemend û berfirehin Hem jî di alîyê sîmayê de bi şêweyekî cuda derketîne. Bi vî awayî gelek sifet û xasyetên hunerî tê de berdest dibe. Hinek jî wekî malikên Şîrin: “*Tacî edeb le ser nê, hmû cîhan leber nê*” r.131

Yan di şêweyê pexşana kurt dane: “Herçî biçête şarî kwêran ebê dest be çawyewe bigrê” r.430

Yan jî gotinekî kurt û poxt û watedare: “*Diro kerî feqîre*” r.202

5- Beşek ji “Pendî Pêşînan” ê kurdî ji heman naveroka pendên neweyê ciyawaz û dûr jî tê de heye. Sedemê vê jî hunera hevbeşîya fikrên wan netewan nîşan dide li hember buyer û heyînên ciyawaz.

6- Bi hêztirîn hêza berdewambûna pend û gotinan di jîyanê de ji ber hebûna hunera rewanbêjî yê ye. Di nav hemî wan jî hunera ciwankarî ye, ku dewrekî serekî û bilind dibîne di ciwankirin û xemilandina rûxsar û naverokê de.

7- Ew hunera ciwankarîya peyvan ku di “Pendî Pêşînan” ê Xal de me bi dest xistîye jimare “13” hunera serekîye. Di nav wande ew e ku zêdetir û belavtir be hunera “Hevbêjî” û “Serwadar” e.

8- Hunera ciwankarîya wateyî jî rêjeya wan zêdetire. Ewên ku me bi destxistî mînakên jimare “30” e. Di nav wande ew e ku zêdetir û belavtir be hunera “Dijyek û herdu cûrên wêye” .

9- Rengvedana hinek ji wan huneran ku di helbestê de hene, di pend û gotinên pêşîyan de şêweyekî taybet girtîne.



ÇAVKANÎ

A- pirtûk:

- *Qurana Pîroz*

- Bin El- Mu'tez, 'Ebdulla *Kûtab El- Bedî*', T.3, Dar El- Mesîre, Beyrut- Lubnan, 1402 h.- 1982 m.

- Bîsyunî 'Ebdulfetah, '*Îlim El- Bedî*', t.2, Muesese El- Muxtar Lîneşir wetewzî', Qahîre- Mîsir, 1425 h.- 2004 m.

- Deştakî, Umer Şêxella, *Pendî kurdî*, b.1, ç.1, Çapxaney Kurdistan, Hewlêr, 2672 ku. - 1972 z.

- Dizeyî, Ebdulwahîd Mişîr, *Piragmatîk û Rewanbêjî*, ç.1, Nawendî Awêr bo çap û bilawkirdinewe, Hewlêr, 2015.

- Elî Carim û Mustefa Emîn: *El- Belaxe El- Wazîhe "El- Beyan Wel- Me'anî Wel- Bedî"*, dar Tîba, dune sene eltebi'.

- 'Elewî Yemînî, Îmam Yehya, *El- Turaz Lîesrar El- Belaxe we 'Ilûm Heqâiq El- Î'caz*, teh: 'Ebdulhemîd Hîndawî, cz.2, El- Mektebe El- 'Esrîye, Seyda, Beyrut- Lubnan, 1429 h.- 2008 m.

- Fezil Hesen'Ebas, *El- Belaxe Finunuha we Efnanuha "Îlim El- Beyan Wel- Bedî"*, t.10, Dar El- Furqan Lîneşir wetewzî', Ūman - Erden, 1426 h.- 2005 m.

- Gerdî, Ezîz, *Kêşnasî*, Çapxaney Narîn, Hewlêr, 2014.

----- , *Rewanbêjî "Rûnbêjî – Ciwankarî – Watanasî"*, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2002.

----- , *Rewanbêjî le Edebî Kurdî da "Ciwankarî"*, b.2, Çapxaney Şarewanî, Hewlêr, 1975.

----- , *Serwa*, ç.1, Dazgay Aras, Hewlêr, 1999.

- Gerdî, Muhsîn, *Beharî Rewanbêjî “Watanasî – Rûnbêjî – Ciwankarî”*, ç.1, Çapxaney Narîn, Hewlêr, 2013.
- Haşimî, Seyid Ehmed, *Cewahîr El- Belaxe fî El- Me'anî Wel- Beyan Wel- Bedî'*, t.3, Dar El- Keteb El- 'Îlmîye, Beyrut- Lubnan, 1427 h.- 2006 m.
- Helebceyî, Husên Mehmûd, *Pendî Gelan “5000 Pend”*, ç.2, Çapxane û pexşî Rênima, Silêmanî, 2014.
- Hemewî, Îbin Hece, *Xezanet El- Edeb we Xayet El- Erib*, teh: Kewkeb Dîyab, t.1, c.2, Dar Sadir, Beyrut- Lubnan, 1421 h. – 2001 m.
- Hemewî, Îbin Hece, *Xezanet El- Edeb we Xayet El- Erib*, teh: Kewkeb Dîyab, t.1, c.4, Dar Sadir, Beyrut- Lubnan, 1421 h. – 2001 m.
- Hûmayî, Celaledîn, *Finûn Belaxet we Sina'at Edebî*, ç.26, Neşir Huma, Tehran, 1386 het.
- 'Itîq, Ebdul'ezîz *'Îlim El- Bedî'*, Dar Elnehze El'erebîye, Beyrut- Lubnan, Dune Sene Elteb'.
- 'Itîq, Umer, *Mi'ecem El- Mustelehat 'Îlim El- Belaxe*, t.1, Dar Usame Lineşir wetewzîh, Ūman- Erden, 2016.
- Îbin El- Esîr, *Mesel El- Saîr fî Edeb El- Katib We- Şa'îr*, teh: Muhemed Mihyedîn, cz.1, El- Mektebe El- 'Esrîye, Seyda, Beyrut- Lubnan, 1431h.–2010 m.
- Îbin El- Esîr, *Mesel El- Saîr fî Edeb El- Katib We- Şa'îr*, teh: Muhemed Mihyedîn, cz.2, El- Mektebe El- 'Esrîye, Seyda, Beyrut- Lubnan, 1431 h. – 2010 m.
- Îbin Menzur, Cemaledîn Ebî Fezil, *Lîsan El- 'Ereb*, cz.1, Dar El- Hedîs, Qahîre - Mîsir, 1423 h. – 2003 m.
- Îbrahîmî, Muhemed Se'îd, *Geştê le 'Îlmî Belaxe “Me'anî, Bedî', 'Eruz, Qafye”*, Azerbaycanî xerbî, Mihabad, 1364 het.

- Îdrîs'Ebdulla, *Ciwankarî le Edebî kurdî da*, Dezgay çap û pexşî Serdem, Silêmanî, 2003.
- Îdrîs 'Ebdulla, *Ciwankarî Şî'irî Nwêy Kurdî*, ç.1, Çapxaney Hêvî, Hewlêr, 2012.
- , *Ciwankarî Şî'irî Klasîkî Kurdî*, ç.1, Çapxaney Hêvî, Hewlêr, 2012.
- , *Kowanekanî Rewanbêjî*, ç.1, Çapxaney Rojhellat, Hewlêr, 2013.
- , *Layene Rewanbêjîyekan le Şî'irî Klasîkî Kurdî da be Nimûney Hemdî û Hacî Qadirî Koyî*, Ekađîmyay Kurdî, Hewlêr, 2011.
- , *Edebî Millî û Folklorî Kurdî*, b.2, ç.1, Ekađîmyay Kurdî, Hewlêr, 2014.
- , *Şêwaz*, ç.1, Çapxaney Minare, Hewlêr, 2012.
- 'Îzedîn Mustefa Resul, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, ç.3, Dezgay Aras, Hewlêr, 2010.
- Kamil Ehmed Nejad, *Finûnî Edebî*, ç.4, Îtîşarat Payan, Tehran, 1382 het.
- Komellêk Mamosta, *Serincêk le derwazey Folklorî Kurdewe*, ç.2, Dezgay Aras, Hewlêr, 2009.
- Komellêk Mamostay Zanko, *Kurdolocî*, ç.4, Çapxaney Minare, Hewlêr, 2009.
- Mehmud Fezîlet, *Saxtar hay Bedî'*, ç.1, Întîşarat Yadewa Kîtab, Daniş Pijwe, Tehran, 1391 het.
- Metlub, Ehmed, *El- Belaxe El- 'Erebîye ‘‘El- Me'anî Wel- Beyan Wel- Bedî’’*, t.1, 1400 h.- 1980 m.

- , *Finun Belaxîye ‘El- Beyan – El- Bedî’*’, t.1, Dar Elbihus El- ‘Îlmîye, Kiweyt, 1395 h. – 1975 m.
- , *Mi’ecem El- Mustelehat El- Belaxîye wetetewiruha*, t.1, cz.2, Dar El- ‘Erebîye Lîlmewsu’at, Beyrut- Lubnan, 1427 h. – 2006 m.
- , *Mi’ecem El- Mustelehat El- Belaxîye wetetewiruha*, t.1, cz.3, Dar El- ‘Erebîye Lîlmewsu’at, Beyrut- Lubnan, 1427 h. – 2006 m.
- Muderrîs, Mela Ebdulkerîmî, *Bedî’ û ‘Eruzî Namî*, Çapxaney Dar Cahiz, Bexda, 1991.
- Muhemed Kerîm Şerîf û Ebdulla Xidir Mewlûd: *Meselekanî Kurdewarî*, ç.1, Çapxaney Minare, Hewlêr, 2005.
- Muhemedî, Muhemed Husên, *Me’anî Beyan we Bdî’*, ç.2, Întîşarat Zovar, Tehran, 1387 het.
- Muxtar ‘Etîye, *‘Îlim El- Bedî’ we delalat El- Î’tîraz fî Şî’ir El- Buhterî*, Dar El- Wefa, Eskenderîye- Mîsir, Dune Sene Eltebi’.
- Secadî, ‘Elaedîn, *Edebî Kurdî û Lêkolînewe le Edebî Kurdî*, Çapxaney Me’arif, Bexda, 2667 ku. – 1967 z.
- , *Mêjûy Edebî Kurdî*, ç.1, Bilawkirawey Kurdistan, Sine, 1391 het.
- , *Xoşxwanî ‘Guzarekarî- Rewankarî- Ciwankarî’*, Çapxaney Zankoy Selahedîn, Hewlêr, 1986.
- Sehîha Muslîm, j.1435.
- Sekakî, Ebî Ye’qub, *Mîftah El- ‘Ilûm*, teh: ‘Ebdulhemîd Hîndawî, t.2, Dar El- Keteb El- ‘Îlmîye, Beyrut – Lubnan, 2011.
- Şarezûrî, Elî Me’ruf, *Pendî Pêşînanî Kurdî*, ç.2, kitêbxaney Şêx Rezay Tallabanî, Silêmanî, 2010.

- Şemîsa, Sîrus, *Nîgahî Taze Be Bedî'*, ç.14, Întîşarat Fîrdews, Tehran 1383 het.
- Şukirye Resul, *Edebî Folklorî Kurdî*, Beşî dûyem, Çapxaney Zankoy Selahedîn, Hewlêr, 1984.
- , *Pendî Pêşînan û Qisey Nesteqî Kurdî*, wer: Dr.Şukirye Resul û Celal Teqî, Hewlêr, 1984.
- , *Edebî Kurdî û Hunerekanî Edeb*, Çapxaney Xwêndinî balla, Hewlêr, 1410 h.- 1989 z.
- Tebîbyan, Seyd Hemîd, *Beraber hay 'Ilûm Belaxet der Farsî û 'Erebî*, ç.2, Întîşarat Emîr Kebîr, Tehran, 1392 het.
- , *Ayîn Dirust der Daniş Belaxet we 'Eruz*, ç.2, Întîşarat Emîr Kebîr, Tehran, 1392 het.
- Teftazanî, Se'dedîn Mes'ud bin Umer, *El- Mitûl Şerh Telxîs Mîftah El- 'Ilûm*, teh: 'Ebdulhemîd Hîndawî, t.2, Dar El- keteb El- 'Îlmîye, Beyrut – Lubnan, 1428 h. – 2007 m.
- Xal, Şêx Muhemedî, *Pendî Pêşînan*, ç.5, Çapxaney Şivan, Silêmanî, 2014.
- Xetîb El- Qezwînî, Celaledîn Muhemed bin 'Ebdulrehman *El- Telxîs fî 'Ilûm El- Belaxe*, ş.: 'Ebdulrehman El- Berquqî, Dar El- kîtab El- 'Erebî, Beyrut – Lubnan, Dune Sene El- Tebî'.
- Xetîb El- Qezwînî, Celaledîn Muhemed bin 'Ebdulrehman, *El- Eyzah fî 'Ilûm El- Belaxe ‘‘El- Me'anî Wel- Beyan Wel- Bedî’’*, t.1, Dar El- keteb El- 'Îlmîye, Beyrut – Lubnan, 1424 h. – 2003 m.
- Xetîb El- Xelxalî, Şemsedîn Muhemed bin Muzefer, *Mîftah Telxîs El- Mîftah*, teh: Haşim Muhemed, t.1, El- Naşir El- Mektebe El- Ezherîye Lîturas, 2011.

- Yasîn Sabir Salh, *Însayklopîdyay Gîştî*, b.2, ç.2, Dezgay Serdem, Silêmanî, 2009.

B- Ferheng:

- Hejar, *Hembane Borîne*, Ferheng “Kurdî- Farsî”, ç.9, Întîşarat Siruş, Tehran, 1292 het.

C- Vekolînên Zanistî di Govaran da:

- Aras Muhemed Salih, *Şêx Muhemedî Xal Pêşengî Biwarî Çaksazî û Nwêkirdinewey bîrî Ayînî*, Govarî Raman, j.197, Hewlêr, 2013.

- Dizeyî, 'Elî Fetah, *Hunerekanî Belaxet le Mem û Zînî Ehmedî Xanî da*, Govarî Karwan, j.24, Hewlêr, 1984.

- Îdrîs'Ebdulla, *Hendê Hunerî Ciwankarî le Şî'irî Pîremêrd da*, Ekademî Kurdî- Kowarî Korî Zanyarî Kurdistan, j.6, Hewlêr, 2007.

- Muhemed Salh Mela Hesên, *Mamosta Xal û Diwa Çawpêkewtin*, Rovar, j.29, Silêmanî, 2004.

- Xal, Xalîd Muhemed, *Jiyannamey Şêx Muhemedî Xal û Bîrewerî*, Govarî Gelawêjî Nwê, j.29, Silêmanî, 2002.

D- Tezê Ekademî:

- Ebdulselar Salar 'Ebdulrehman, *Hunerî Rewanbêjî le Şî'irî Nalî da*, Tezê Master, Beşî Kurdî, Kolêjî Ziman, Zankoy Silêmanî, 1420 h.- 2000 z.

- Merîwan Husên Ferhan, *Ciwankarî le Şî'irî Wefayî da*, Tezê Master, Zankoy Silêmanî, Fakultî Zaniste Mirovayetîyekan, Sikûlî Ziman, Beşî Kurdî, 2015.